Mihemedê Mela Ahmed

# *Dîroka Partî li Sûryê*

Institut Kurde de Paris

**Çapa 2.**



EVRA VERLAG / Lêkolîn

Institut kurde de Paris

LIV.KL.227
23/12/2016
440 MEL DIR

Mihemedê Mela Ahmed

# *Dîroka Partî li Sûryê*

Qunaxa Yekê

1957 - 1965

***Çapa 2.***

Institut kurde de Paris

EVRA VERLAG / Lêkolîn

*Dîroka Partî li Sûryê* * Mihemedê Mela Ahmed
Qunaxa Yekê (1957 -1965)
Çapa 2. – Sebat /2004 - Berlîn
EVRA VERLAG - 22
Lêkolîn–3
©Mafê çapkirinê parastî ye.

*Edîtor:*
Zeynel Abidîn Han

*Redaksiyon*
EVRA VERLAG

*Amadekirina Bergê*
Zagros Baran

*Mîzanpaj*
Elmas Han

*Amedekirina Çapê*
Sezai Gürer

*Çapkirin- Weşan - Belavkirin:*

EVRA VERLAG
Druck & Vertrieb GmbH
Skalitzer Strasse 28
10999 Berlin/Deutschland
Tel : 00 49 30 - 616 525 73/74
Fax : 00 49 30 – 616 266 49
Mobil: 00 49 176 220 90 368

ISBN : 3-937716-21-1

evraverlag@hotmail.com
www.kovarakani.de

Institut kurde de Paris

Mihemedê Mela Ahmed

# *Dîroka Partî li Sûryê*

Qunaxa Yekê

1957 - 1965

*Çapa* 2.

Institut kurde de Paris

EVRA VERLAG / Lêkolîn

*Diyarî*

*Van çend rûpelan, ji xebata miletê*

*me yê Kurd, li Sûryê, diyarî wan dikim,*

*ewên ji bo mafên miletên xwe dixebitin.*

Institut kurde de Paris

## Naverok:


Diyarî.
Pêşgotin.

**Navbira yekê:**

- Avakirina Partî:
    1- Rewşa tevgera Kurdî, di dawiya salên çilan de.
    2- Rewşa Sûryê ya ramyarî, di salên pênciyan de.
    3- bizava Kurdî ya netewî, di salên pênciyan de.
    4- Avakirina rêxistinên ramyariyên Kurdî, li sûryê:

A- Li Cizîrê (parêzgeha Hisiça):
    1- Civata yekîtiya xortên dîmûkratên Kurd.
    2- Komgirêka Azadî.

B- Li parêzgeha Helebê.

C- Li Şamê:
    1- Çawa Partiya dîmûkrata Kurdistana Sûryê, hate avakirin.
    2- Fireh bûna saziya partî.
    3- Bizava partî ya siyasî.

A- Peywendiyên partî bi partiyên Sûryê re.
B- Peywendiyên partî bi desthilatên Sûryê re.
C- Peywendiyên Partî bi partiyên Kurdistanî re.

--------------------------------------

**Navbira didwan**

***Berçav kirina sedemên levnekirinê di hundirê Partî de.***

1- Partî di navbera sala 1958 an û Tebaxa 1960 î de.
2- Girtina endamên Partî di 12.8. 1960 î de:
        a- Pirsên dezgehê parastinê û dadegehê.


Institut kurde de Paris

b- Xuyakirina levnekirinê di nav girtiyan de.
c- Pelika xwevekişandinê ji partî.
d- Li ber dadegehê.

3- Rewşa partî di dema girtinê de:

I- Rewşa saziya partî, piştî girtina hevalan:
a- Li Heleb û Çiyayê Kurdan.
b- Li Cizîrê.

II- Helwesta hevalan ji levnekirina girtiyan.

III- Hilbijartin jibo perlemana Sûryê.

---

**Navbira sisyan:**

Hevrikî di hundirê serdariya partî de:

1- Bûyerên sala 1962 an:
a- Konfiransa yekemîn. Şibata,1962 an.
b- Levnekirina Hemîd û şêx û şûnemayên wê.
c-Komên: Qamislo. Dêrik. Burjiwaz û ya Hemîd.
d- Serjimara awarte.

2- Bûyerên sala 1963 an:
a- Konfiransa didwan. Çirya pêşîn, 1963 an.

3- Bûyerên sala 1964 an:
a- konfiransa sisyan. Destpêka Tebaxa 1964 an.

4- Peywendiyên partiya dîmûkrta Kurdistana Sûryê, bi partiya dîmûkrata Kurdistanî re, li Iraqê.

---

**Navbira çaran:**

- Parçebûna Partî.
- Bûyerên sala 1965 an:
a- Helwesta dijberan: Koma Dêrkê, Melan, Burjiwazan û Hemîd û ya Neyo û Selah.
b- Konfiransa, 5. Tebaxa 1965 an, ya Çepan.
c- Konfiransa çaran.

**Dawî.**

## Pêşgotin

Di pêveçûya xebata neteweyî ya miletan de, gelek şaşî û kûrtal û têkçûn, bi rex serketinên biçûk an mezin, peyda dibin. Û em, miletê Kurd, weke xeynî xwe ji miletan, cem me jî, peyda dibin. Û rêxistinên me, yên siyasî û ne siyasî, di wan de û bi wan re jî, ev levnekirin, an rikberî heye. Birastî dilan di êşînin, lê hene û çêbûne.

Gelo ma raste, dema yek dîroka xebata miletê xwe vekolê, çavê xwe ji wan miçkê, an ser wan re çenkê, an xwe ne bihîstiyê wan bikê.

Eva he jî, çîroka meye, bi miletê me re. Em gelekî bi levnekirin û hevrikiyên miletê xwe di êşin. Weke tu bêjî, ku em tenê di vê cîhanê de, ketne kûrtala wê de. Mirov bi êşa xwe di hesê, di îşê, bi ya xeynî xwe re, dimînê beşdariyeke wijdanî û mirovanî.Vêca pêhesandina miletê me bi astengên xwe û dîtina wî ji ne rastiyan re, dihêlê ku gelek tiştên baş, ne bînê û bêjê ku tevgera me tiştek ne daye vî miletî, ji bilî astengan û levnekirina di nav serdariyê de.

Diyare hinek ji wan, rola erênî ya partî (an ya tevgera rizgarîxwaza niştimaniya kûrd) ji bo pêkanîna armançên miletê Kurd, jibîrkirne. Naynin bîra xwe ku ew fêrî saziyê û yekîtiyê kirin. Hişte ew tê bighîjin ku tevgera rizgarîxwaza Kurd, xweha ya Erebe û piştegirê wê ye, xebat dijî kevneperest û kolîdaran dikir û xebat ji bo azadî û dîmûkratî û aştî û pêşveçûnê dikir. Û ew hîn kirin ku Kurd û Ereb birayên hevin, divê xebatê bi hevre mil bi mil, ji bo civateke pêşveçûyî û xurt bikin, da dîmûkratî û xêr û firehî ji hemûwan re pêkbê. Û ew fêrî gelek tiştên din jî kirin.

Kar gelekî zehmet dibê, heger yek bixwazê qunaxekê ji dîroka miletekî, an partiyekê, ji gelek tîjan, xwedî gelek asteng vekolê. Û ji vê gelekî zehmetir, ku yek vegerê bûyerên bi êş û bîranînên tehil, nemaze evên berî bîst an sih salan qewimîn, bide ber çavên hin kesan, baş pê ne hesehayîn an şaş bihîstîn. Nexweş dibê, heger yek helwestên jevcida, yên hevalên berê û hevrikiya

Institut kurde de Paris

wan, bide ber çavên xortên nû û bihêlê birînên kevin, nû vebin. Gelekî zehmete, qirêja hinekan deynî ber çavên gelekan.

Birastî min ne dixwest bi vî karî rabim, lewre min gelekî, di nivîsandina xwe de, xwe westand, ji bo ew qirêj neyê ber çavan. Min gelekî hewilda ku tiştên ne spehî û ne xweş, yên nav hevalan de bûyîn, ne nivîsim. Min xwe ji tiştên kirêt, dûr kir û ew ne gotin. Û tiştên bargoman, ên dihatan gotin, min ne gotin û tiştên bê bextî û fesadî der heqê hevalan de dihatin gotin, min ew dûr kirin.

Min hewilda sedemên serekî, yên hiştin partî bibê dû parçe, nemaze yên ramanî û ramyarî, bînim ber çavan. Min hewilda rastiya ku hemû heval dizanin, wê deynim ber çavan. Bûyerên naskirî ji hemû hevalan, min ew danîn ber çavan, tiştek ji cem xwe, min ne aniye.

Hin caran ez nerîna xwe, li ser hin bûyeran, dema ku ez bizanim evahe gereke û pêwîste, ez hin tiştan eşkere bikim, didim xuyakirin

Bi vî karê xwe, min xwe kir helwestekî xirab de, çinku ez dizanim, ezê bibim armanc ji gelek tîran re, lê bi vê razîbûm û min nav li xwe da, da ez hember van tiştan xwe ragrim û vî barê he, eşkerekirina rastiyeke dîrokî, di qûnaxeke xebatî de, berî 25-30 salan, an zêdetir, hatî kirin û winda bûyî, an weke mijekê li ber çavan mayî û xortên vê demê, ne bihîstîn, an jî, bi kêmahî, an bi meyldarî bihîstîn, eşkere bikim.

Armanca min ji vî karî, ronîkirina kar û xebata wê demê û danîna wê, bi rengekî rast û zelal, bê meyldarî, ber çavê milet da xebatker dersan û mefan jê bigrin û nekevin wan şaşiyan de û milet ji wan ser êşan bi parêzin. Digel vê jî, ez niha xwe di bînim di cihê pirsê de. Çinku di wê demê de, ez jî, weke yekî perpirsiyar di partî de, beşdarê wan bûyeran bûm. Û di dema wan levnekirin û hevrikiyan de, meyldarê alîkî bûm, bi hevalên xwe re, bar û berpirsiyariya wan bûyeran hildigrim. Niha ez pê dihesim ku di vî karê xwe de, di vê nivîsandinê de divê ez ne ew kesê berê bim, ne meyldarê aliyekî bim, da bikarim, rastiya bûyeran deynim ber çavan, da sûd û feyde jê bê wergirtin. Ev hewildana he gelekî ez tengezar kirim ta min karî kontirola xwe bikim, dest deynim ser xwe û bê meyldarî ji vî karî derkevim. Heger di nivîsandinê de,

Institut kurde de Paris

hinek ji xeynî wê, bê xuyakirin, birastî yê bê hemdê min bê. Di nerîna min de, danîna bûyeran li ber çavan û navkirina kesên beşdar û zelalkirina helwesta wan, ne bi wê watê ye, ku evahe meyldariye, dijî aliyê diye, na, evahe eşkerekirina rastiyekê ye.

Di Buhara 1986 an de, mamostayên hêja Ismaîl Omer û Salih Omer hatin cem min û ji min xwstin nivîsandina dîroka Partî di qunaxa yekemîn de. Min daxwaza wan, bi bihana zehmetiya vî karî, ne pijirand. Çinku zêdî sih salan ser bûyeran re çûyî û pêre jî, nebûna dîkomentên wê demê û nebûna wext bi min re, da bikarim vî karê mezin bibim serî. Lê wan birêzan, ji ya xwe ne hatin xwarê û dev ji min bernedan Cûn û hatin, kar ji min xwestin. Ji fihêtiya, binivîsandina wê ez razîbûm. Lê dîsa min xwesteka wan pêk ne anî, salekî paşxist. Di dawî de, ez neçar bûm, dest bi kar bikim, (nivîsandina dîroka xebata Partî di qûnaxa yekemîn de, ji sala 1957 an ta sala 1965 an). Lê karê minî rojane yê dirêj, ji bo jiyanê, dem ne dida min. Lewre ev xebata he, bi min re dirêj ket. Havîn û zivistan, alîkariya min ne kirin, da bikarim, hevalên berê, çi berpirsiyar an ne, bibînim û bi wan re rûpelên rojên kevin, bi qulibînim û bûyeran bînin bîra xwe, ev bûyerên li cem gelekan hatibûn jibîrkirin, an kêm û zêde li wan hatibûn kirin, ji nûka ve, yên di nav wan de rast, hilbijêrim.

Min gelekî hewilda, da hemû hevalên kevin, yên av bi wan germ dibû û yên têkilyên wan di bûyeran de heyîn bibînim. Lewre min karî hemû hevalên komîta navendî û yên damezrevanên Partiyê, yên sax û li Sûryê û gelek hevalên komîti yên xwarde bibînim û li ser rewş û astengên wê demê biştexilin. Hemûwan bi keyf xweşî, bê diltengî, alîkariya min di kirin, çinku wan dîtin ku ev karê he xizmeteke ji miletê me re ye, ji bo wê, xwe nedan alî, ji bilê (Hemze Niwêran) yek ji damezrevanên Partiyê û endamê komîtiya navendî, di demekê de. Ewî ne xwest alîkariya min bi tiştkî, di vî karî de bikê û tiştên di bîra wî de, ne gotin.

Ev dema dirêj, navbera çêbûna bûyeran û dema nivîsandina min, 25 – 30 sal, hiştiye gelek ji hevalan, wan bûyeran jibîr bikin. Û tu dîkoment û destnivîsên wê demê, li cem tu kesî, tune bûn. Hemû di dema rev û bazdanê de, dema Yekîtiya Sûrye û Misirê di hikmê serok Cemal Ebdilnasir de, bin erdan de rizîn, bertelef bûn. Ji bilî

Institut Kurde de Paris

raporek, li ser girtiyên sala 1960 î, hişte ew bûyer bitemamî ber çavên min ronî bibê.

Ji bo sazkirina vî karê xwe, min ew kir (4) çar navbir:

1- Navbira yekê: Damezrandina Partî û sedemên berçav û yên ne berçav, ji damezrandinê re.

2- Navbira didwan: Sedemên levnekirinê, di nav hevalên Partiyê de.

3- Navbira sisyan: hevrikiya di nav hevalên serdariya Partiyê de û cihgirtina wê di nav hemû hevalan de.

4- Navbira çaran: Parçebûna Partî û çawa bû dû bir.

Di dawiya vê gotinê de, divê ez sipasiya xwe ya mezin, ji bo hemû hevalan pêşkêş bikim. Çinku wan gelekî alîkariya min kirin. Birastî bê alîkariya wan, min ne dikarî vî karê, netewî û nîştimanî, bibim serî.

Û Divê êz sipasiya xwe ya mezin, ji bo herdû mamostan (Îsmaîl Omer û Salih Omer) re pêşkêş bikim, çinku wan valebûna vê demê, di pirtûkxana Kurdî de dîtin. Ji bo wê wan, ev karê he ji min xwestin û bixêra wan hate kirin, heger wan ji min ne xwestan û li min zor ne kiran, wekat min ev nivîsîna he ne dikir. Û sipasiya dawî, ji hemû kesên alîkariya min kirin di pêkanîna vî karî û çapkirina wî de.

***Mihemedê Mela Ahmed***
*Qamişlo. Adara 1991*

Institut kurde de Paris

## Pêşgotina çapa didwan

Di van salên dawî de, li ewrûpe, gelek dost û xortên xebatker, xem xwarên pirsa miletê xwe, li ser vê pirtukê, ji bo xwendina wê û haydarbûna wan, ji bûyerên wê qunaxa yekemîn ji dîroka partî li Sûryê, ji min dipirsîn, nemaze piştî bûyerên tevgera miletê me yên siyasî bûn gelek û ketin nav hev de û hin dilbijok, di nav wan de, hatin xuyakirin û hin tiştên ne rast, hatin gotin û belav kirin, da rolekê bidin hin kesan, an hin bûyeran û bi qunaxê ve girêdidin. Çinku ew bûyerên berê, ji xortên îro ve, ne diyarin û bûne weke mij, li ber çavên xebatkerên kevin û dîsa bûrîna zêdî deh salan, li ser çapa yekemîn re û pirtûk bi xwe jî, li van welatan nîne dihêlê ew rastî ne ber çav bê.

Ji bo vê, min dît, ku pêwîste careke dî, vê pirtûkê çap bikim û rastiyên wê qûnaxê, deynim ber çavê miletê me li ewrûpe, da şaşiyan nas bikê û serast bike.

Min sernavê pirtûkê, ji dêla ya erebiya dirêj, (Sefehat min tarîx hereket el teherur el wetenî el Kurdiye, fî sûrye, yanî, rûpelin ji dîroka tevgera azadîxwaza niştimanî ya Kurdî li sûrye) bi çend gotinên Kurdiyên kurt nivîsî û kir "Dîroka Partî Li Sûrye".

Û ez dixwazim bêjim jî, ku di sala 2001 an de, kombenda Kawa li Kurdistana başûr Hewlêr, ev pirtûka he, çap kir. Lê mixabin zêdî / 50 / pêncî şaşiyên çapê di pirtûkê de hate xuyakirin. Ew jî di nav bera gotinek û çend gotinan, an rêzek û çend rêzan de, ne hatin nivîsandin, hiştin hin tişt neyên zanîn, an bi şaşî bên zanîn. Gerek bû ev şaşiyên he, ne hatan kirin, eger hinek guhdarî li çapê bi hata kirin, ev şaşiyên he yê peyda ne biwan.

***Dortmund 2003 - Mihemed***

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# Navbira yekê

Institut kurde de Paris

# Damezrandina Partî

### *Rewşa Tevgera Kurdî, di dawiya salên çilan de*

Institut Kurde de Paris

Bi dawîhatina salên çilan, ji vê sedsalê- sedsala rizgarkirina miletan nîvê yekemîn jê, bi bûyerên xwe ên mezin û havilên wan ên giran dawî bû.

Dû cengên mezin, şîn û ziwa, hişk û ter, bi agirê xwe ê gurkirî şewitandin. Gelek ji cîhana kevin levket û serhev de herifî, ji bo cîhaneke nû pêşketî ava bikê. Qada dewletan fireh bû, hêjmara wan zêde bû û gelek împeratorî bin gor bûn û hin komar, nû hatin afirandin. Û hinek dewlet, miletên wan gelekî xebitîn ta roja azadiyê dîtin. Û hineke dî, bin lingên leşkerên dewletên serketî de perçiqîn û hêviyên wan di rojeke nû û azad de, di nav berjewendiyên dewletên mezin de, yên ne wekhev winda bûn û bûn qurbana împiryaliyê, piştî rêjîmên faşiyan û naziyan, hember hêzên dîmûkrat û pêşverû, bazdan û têkçûn.

Salên çilan dawî bûn û tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê ne giha armancên xwe, di azadî û serxwebûnê de.

Li Kurdistana bakur, miletê Kurd dimilmilî, hember van bûyerên mezin, ên di cîhanê de çêdibûn, lê hê ji derbên mezin, ewên di dirêjahiya dû sed salan de, ji Osmaniyan û faşistên Toraniyan ên peyhev lêdiketin, di nalî. Nemaze di van şoreşên dawî de, 1925, 1930, 1937 an de. Hê bêhnefişka miletê me ne rawesta bû, da bi karê bêhna xwe berdê û xwe bidê ser hev û bi awakî nû bifikirê, da bizanê çawa dest bi xebatê, di vê cîhana nû de bikê .

Li Kurdistana başûr, Kurd gihiştin baweriyê ku Ingilîzan, danîne ber çavên xwe, wê bi Imperetoriya xwe a mezin ve girêbidin, lewre wan jî şoreşên bav û kalan berdewam kirin. Lê timahî û dilbijokiya Ingilîzan, hişte serhildana Mela

Mistefayê Barzanî têkbiçê û xwe bavêjê hembêza Kurdistana rojhilat, li Iranê û pêşmergên xwe bikê bingihekî leşkerî xurt, ji bo parastina komara Mahabada Dîmûkrat, di dema gelê Kurd li başûr, bi rêxistinên xwe ve, hember dîktatoriya desthilatdarên Iraqê û bûyerên li ser qada Kurdistanê çêdibûn, rawestan, lê bi awakî, ku bikarin êşa van derban li ser xwe sivik bikin. Ji bo vê xwe dan hev û rêxistinên xwe kirin yek, da bi hêzeke xurt bikarin xwe bighînin armancên miletê xwe yên netewî û nîştimanî.

Li Kurdistana rojhilat, ya bin desthilatdariya Iranê de, xebata milet giha, piştî cenga cîhana didwan, ku Komara Mahabada dîmokrat, di 22. 1. 1946 an de avabikin. Weke berê jî me got, pêşmergên Mela Mistefayê Barzanî jêre bûn piştegir û hîmên parastina wê. Lê berjewendiyên dewletên mezin ên ne wekhev û dan û standinên wan, li ser hisabê miletên biçûk û bêhêz, nemaze dema bêhna pitrûla Iranê difna Sitalîn dagirt, hingê komara Mahabada dîmûkrat bû qurban û serekê wê Qazî Mihemad bi dar ve kirin. Bi vî awayî, hêviyên Kurdan li wê dê, bi rojên azad ve û bi navê wan jî, di nav yên miletên azad de, bê bilindkirin herifîn. Derb gelekî mezin bû û şûnemayên wê gelekî xirab bûn, bi êş bûn û ekamên wê ne erênî bûn, hiştin tevger jev bikevê û jêre demek bivê, da xwe bide ser hev û bihêz bibê.

Li Kurdistana rojavayê başûr, li Sûryê, Civata Xoybûnê, di xebata xwe de, li ser awayê berê, diçû û serdariya wê, ew kesên berê bûn û hineke nû (1) jî, piştî navê civata xwe di sala 1946 an de guhertin û kirin Partiya (Dîmûkrata Kurd), weke ya li Iranê û pişt re li Iraqê.

Lê hêviyên serdariya wê, di paşerojê de nema bûn, nemaze piştî dîtina wan ji encamên cenga cîhana didwan re, ewên gelekî ji Kurdan re xirab bûn, weke herfandina Komara Mahabada Dîmûkrat û darvekirina serokê wê û penaberya Mela Mistefayê Barzanî li Sovîyêtistanê. Ev serdariya he li mala xwe rûnişt û dev ji xebatê berda.

Institut kurde de Paris

Rêxistina wan, di vê demê de, weke berê bû, ew bûn û hêjmareke ne mezin ji kesên welatparêz, xwe li dora wan dabûn hev. Ew bê bingihekî gelêrî mezin, an komikên partîzanî, weke yên vê demê bûn. Heger yek ji serdariya wan, axak an dewlemendek nasbikra û bizaniya ew rast Kurde, ew kes dihat hisabkirin endamekî wan, bê ku guhbidin tiştên, di vê demê de, ji endaman tên xwestin.

### *2-Rewşa Ramyarî li Sûryê, di salên pênciyan de*

Ereb (herwiha Kurd jî) bi hêzên dîmûkrat û sosyalîst re, dijî naziyan û faşiyan, têkilî hevrika cenga cîhana didwan bûn, bi omîda rizgarkirina xwe, di warê ramyarî û civakî û çandî de. Lê afrandina Israîl di nîvê welatê Ereban de, bi alîkariya împiryaliyê û derebeg û burjiwaza ereb, ya rêberiya tevgera azadîxwaza Ereb, di çilan de dikir, hişte derbeke mezin li hêviyên tevgera netewî ya ereb bikevê. Di vê demê de ku pirsa Felestînê, li ser qada cîhanê levdiket û dihişt hestên netewî, yên li cem gelê ereb gurbibê û pêtên wê dijî kevneperestan û împiryaliyê bilind bibê. Lê pêre jî baweriya cemawerê ereb bi burjiwaza wan kêm dibû û çavên xwe li hin rêyan digerandin, ji bo xwe ji wan xilas bikin.

Bûyeran dan xuyakirin, ku ev serdariya he nikarê armancên wan, di azadiya ramyarî, civakî û çandî de bibe serî. Lewre Sûrye hember vê rewşa he, berê xwe da awayê qulbandina desthilatdariya welatê xwe, bi rêya hêzên leşkerî. Ji bo vê di 30 Adara 1949 an de, hikim hate guhertin û burjiwaza bicûk û ya navîn destê xwe danî ser hikim û xwestin pêveçûna ramyarî û civakî a berê serastbikin.

Rewşa dîmûkratiyê li Sûryê û xebata cemawerê milet û partiyên nîştiman û pêşverû dijî împiryaliyê, hiştibû dewletên împiryaliyê û ser serê wan Emerîke, li Sûryê zorbikin û dijî wê bixebitin da wê bi hevbendiya Bexda (sênto) ve girêbidin.

Dewletên hevbendên împiryaliyê, weke Tirkiye, Ûrdin û Iraq, ên li dora Sûryê, gelek li Sûryê tengdikirin, giha radekî Tirkiyê dû caran (Adara 1955 an û Eylûla 1957 an) leşkerên xwe anî ser sînorê Sûryê, da êrîşî wê bikê, eger nebê hevbendê peymana Bexda

(Sênto). Lê yekîtiya hêzên dîmûkrat û pêşverû û li dûr wan cemawerê milet û bi piştevaniya dewletên dost, weke Hevbendiya Sovîtistanê, hişte dewleta Sûryê serbikevê. Û piştî demeke kurt bi Misrê re yekîtiyekê bi navê (Komara Erebiya yekbûyî) damezrînê.

Ji alîkî dî ve, partiyên pêşverû (weke partiya Komonîst û ya Be'is El Erebî El Iştirakî û hin kesên serbixwe) di hundirê welêt de hevrikiyeke berfireh dijî kevneperestan dikirin, ji bo desthilatdarî nekeve di destê wan de.

Ev xebata he hişyariyek çînî, di nav cemawerê milet de belav dikir û ew dida serhev û eniyeke (berek) xurt dijî kevneperestan û împiryaliyê avadikir.

Ev tiştên he hemû, roleke wan mezin li ser Kurdan hebû û hiştin hişyarbûneke çînî û netewî û niştimanî, di nav wan de, xurt bibê. Û bi birayên xwe yên Ereb re dijî kevneperestan û împiryeliyê rawestin û xwîna xwe li ser erdê Sûryê û Felestînê bi wan re birijînin.

Bin siha vê rewşa xebatker, ya li Sûryê konvedayî, hinek rojnamên Sûryê û yên Libnanê weke rojnama (El Wijdan û El huriye) (1) li Bêrûtê û rojnama (El We'i El Erebî)(2) li Şamê, heryek bi awakî, berê xwe didan Kurdên li Tirkiyê û li Iraqê, da Kurdan bikşînin şerê desthilatên xwe bikin, ev desthilat ên beşdarên hevbendiya Emerîke û Ingilîzan, di Hevbendiya Sênto (Bexda) de.

Ev rojnamên he, bi nivîsandinên xwe, tanîn bîra Kurdan, şer û serhildanên wan. Tanîn bîra wan, şehîd û qehremanên azadiya wan, û kuştar û fermanên desthilatdarên Tirkan û Iraqiyan, bi wan kirîn û ji wan dixwestin bi şoreşê dijî wan kevneperestan rabin.

Ev nivîsarên he û ev daxwazên he, roleke wan a mezin, di dehfandina Kurdan bal xebata netewî ve hebû û di gûrkirna pêhesandina wan bi zordariya li ser wan û bi mafên wan yên hatin xwarin û miletê wan ê bindest hebû. Ji bo vê Kurd li rêxistinan digerehan, da xwe li dora wan bidin hev. Lewre berî Partî bê avakirin, me hinek rêxistin dîtin.

Holê ez dikarim sedemên damezrandina rêxistinên me ên ramyarî li Sûryê bidim ber çavan:

1-Pêhesandina Kurdan ku ew jî miletekin, lê bindestin û mafên wan ên netewî, ta niha, hatine xwarin, digel ku şoreş û serhildanên



Institut kurde de Paris

wan di direjahiya sed û pêncî salan de pêketî bûn û niha jî amadeyê xebat û şoreşê ne.

2-Rewşa xebata ramyarî û dîmukratî di wê demê de, ya li welêt konvedayî, kartekerê wê li ser Kurdan mezin bû, alîkarî kir, ku bi hêzên din re, beşdarê xebata siyasî bibin, an ji xwe re, partiyan avabikin.

### *Bizava netewî di salên Pênciyan de*

Bi herfandina Komara Mahabad a Dîmûkrat, di 16. 12. 1946 an de, hêviyên serdariya tevgera netewî ya Kurd li Sûryê herifîn. Çinku ew di baweriya (Sîvir) eke didwan de bû, lê mixabin cenga cîhana didwan dawî bû û tiştek ji Kurdan re pêknehat lewre qudûmên wê sist bûn û şikestin û çalekiyên xwe rawestandin û li mala xwe rûnişt.

Gelek bûyerên bi êş li ser Kurdistanê re, ji cenga cîhana yekemîn ve bûrîn. Kurd di wan de xusirîn, çinku tevgera wan û mafên wan ên netewî di nav giftûgoyên dewletên mezin de, ji bo berjewendiyên wan, yên di herêma rojhilata navîn de, winda bûn. Çinku li ser hisabê mafê Kurdan bûn û li ser welatê wan bûn. Holê Kurd ne gihan tu sûdî.

Di encama vê de, hişyarbûneke netewî xurt, di nav Kurdan de belav bû. Komek ji xortên netewî dîtin çawa kolîdar, ji bo berjewendiyên xwe pêkbînê, bi çarenivîsa miletan, bê hayê wan, dileyizê. Û çawa bi miletan dikenê, dema berjewendiyên wî û yên wan miletan levdikevin. Ev koma bicûk ji bo xebatê, xweda pêş, lê mixabin nekarî berdewam bikê, çinku mercên wê demê ne pêre bûn û ew kêmjimar û lawaz bûn, nekarî sûrha desthilatdariya derebeg û burjiwaza Kurd neqeb bikê. Lewre rawesta ta salên pênciyan ji sedsala bîstan, dema xort bi xurtî daketin meydana xebatê û civat û partiyên siyasî, dûr ji desthilata siyasetvanên kevin û ji ya serokên eşîran, damezrandin.

Ev tevgera ha li Kurdan nû bû, çinku di rastiya xwede pişta xwe bi çîna cotkar û karkeran û rewşenbîran girêdida. Ew ji wan bû û ji wan re bû, armancên azadiya siyasî û civakî û çandî dixwest.

Ji alîkî dîve, hebûna bazareke bazirganî û daxistina mekînan (nemaze yên çinînê û cotkirnê) di nav çandiniya erdên fireh de û xuyakirna çîna burjiwaz û ya karkeran di civata Kurdên Sûryê de, hişte zû gavan bal sermiyan ve bavêjin, nemaze bal sermiyanê çandiniyê ve, piştî awayê çandinya kedê ya berê, ya derebegî hate guhertin. Ev tiştên he hiştin hevrikiyeke çînî xurt, di civatê de belû bibê û di rûyê derebeg û serokên eşîran de rawestin.

Xebata rojên bên, yê vê nerînê û ramanê hilgirê. Û bi vî awayî, tevgera siyasî, pêveçûya xwe berdewam kir û serdariya tevgera siyasiya Kurd a kevin, li paşxwe hişt û tu cih ji wê re, di serdariyê de nema.

*4- Avakirina rêxistinên ramyariyên Kurdî li Sûryê*

Havila xebata netewî û bûyerên germ û giran, yê dehên salan, ewên di bîra Kurdên sûryê de mayîn, bi rex rewşa netew î ya li ser qada Kurdî kontirolkirî, dihişt hestên netewî li cem Kurdan gurbibin û roleke xwe ya mezin, di dehfandina wan de bal avakirina rêxistinên ramyarî ve bileyizê. Û bi wan re jî, nîrên babetî yên wê demê li Sûryê, weke xebata hêzên niştimanî û pêşverû, dijî kolîdaran û peyayên wan, di hundir û derveyê welêt de, ji bo parastina Sûryê ji desthilatdariya wan û ji hevbendiyên wan, weke ya Bexda (sênto). Lewre hestên netewî yên Kurdan dilivîn û dihiştin ew amade bin, ji bo beşdarê tevgereke netewî Kurdî bibin, piştî ku beşdarê ya Erebî bûyîn û bi birayên xwe yên Ereb re xebitî bûn.

Vêca dema nîr û bendên xweyîtî û babetî pêkhatin, rêxistinên me jî hatin damezrandin û me dît çawa cemawerê milet bi xurtî berê xwe da wan û ew hembêz kirin û li ber wan de da.

Lê çawa ev rêxistinên he hatin avakirin ? .

Vêca, ka em bibînin, ev rêxistinên he li Cizîrê (parêzgeha Hisiça) û li parêzgeha Helebê û li Şamê (paytexta sûryê) çawa hatin damezrandin:

### *1- Li Cizîrê (parêzgeha Hisiça)*

Li Cizîrê, çend rêxistin peyda bûne. Gora kevnîtiya dema wan, emê wan bi nav bikin:

### *A-Civata Yekîtiya Xortên Dîmûkratên Kurd*

Me got bi sedema têkçûna serhildana Mela Mistefayê Barzanî, di sala 1943-1945 an de û herfandina komara Mahabad a dîmûkrat di sala 1946 an de, lepta ramyarî ya tevgera Kurdî li Sûryê rawesta û serdariya wê li mala xwe rûnişt û dev ji xebatê berda.

Di wê demê de, dawiya salên çilan û destpêka salên pênciyan, xebat li Sûriyê gurbibû, partiyên ramyarî bi germî, di nav rêzên cemawerê milet de dixebitîn, ew bi aliyê xwe ve dikişandin.

Li Cizîrê (parêzgeha Hisiça) û li Çiyayê Kurdan (parêzgeha Helebê) û li Şamê (paytexta Sûryê), ev partiyên Sûryê, weke partiya komonîst û partiya qewmîsûrî û partiya Îxwan el muslimîn û partiya el be'is el erebî el îştirakî, bi germî li nav Kurdan digerehan û xortên wan û zilamên wan bi aliyê xwe ve dikişandin û ew dikirin endamên partiyên xwe. Lê di nav van partiyan de, Partiya Komonîsta Sûrî, gavên fireh di nav komela Kurdan de avêtin û gelek ji xortan bûn endam, di rêxistinên wê de. Çinku keyfa Kurdan jê re dihat û dilê wan bi armancên wê yên çînî û navnetewî xweş bû, nemaze bi gotinên wan yên ku dibêjin: Doza mafên hemû miletan dikin û dixebitin ta wan bistînin.

### *Damezrandina Civata Yekîtiya Xortên Dîmokratên Kurd*

Hember bizav û xebata van partiyan, di nav komela Kurdî de û kişandina wan ji xortan re û endamîtiya wan di nav partiyên wan de, hişte xortên Kurd belav bibin, her hinek di alîkî de herin, pey van partiyan bikevin, nemaze partiya komonîst. Lê ji alîkî dî ve, hinek xort hebûn, dilê wan dişewitî, dema ev tiştên ha didîtin, ji xwe dipirsîn, ma gelo raste ew jî bibin endamên wan

partiyan, an ji xwe re, di rêxistineke netewî Kurdî de bixebitin, da armancên xwe yên netewî bi destê xwe xin.

Ev keftelefta hemûwan, di encama serketina xebata burjiwaza erebî ya dijî Ferensa kolîdar, ya ji welat di 17. 4. 1946 an de derket û welatiyên Sûryê gihan azadiya xwe. Vêca vê burjiwazê, desthilatiya welat, kir di destê xwe de û hemû samanên wê kirin bin xizmeta berjewendiya xwe de û keda çîna cotkar û karkeran dixwar. Hinek ji derebeg û burjiwaza Kurd jî, xwe kir beşdarê burjiwaza ereb, di xwarinê de. Lewre tu dem bi burjiwaza Kurd re nebû, da di pirsa miletê xwe de biramê, an mafên wî bixwazê, ew jî li partiyên wan digereha, da cihê bilind, ji xwe re, di nav wan de bibînê.

Rewş ev bû, dema komek ji xortan dîtin, ku xortên wan di nav partiyên ereban de belav dibin, tû navdar û serokên Kurdan hember vê rewşê xwe nalebtînin. Vêca hinek ji xwendekarên dibistanên Qamişlo, dîtin ku divê xebatekê bikin, da bikarin mafên miletê xwe yên netewî, bikin di destê wî de. Ji bo vê gereke civateke siyasî ji xwe re damezrînin û cemawerê milet li dorê bidin hev û berê wî bidin xebatê.

Bi vî awayî, yekemîn rêxistina ramyarî, di nav Kurdên Sûryê de, ji cemawerên milet hate ava kirin.

Van xortan, di meha Tebaxa 1952 an de, di nav hev de dest bi şêwrê kirin, da nerînên hev, ji bo damezrandina vê rêxistinê nasbikin. Li vêdê hinek ji xortên ku bibûn endamên partiyên din (nemaze yên komonîst) di rû yê vê daxwazê de rawestan û xwestin wan ji himet bêxin û jev belav bikin û belkî bikarin wan bikin hevalên xwe. Ji bo vê, çend caran bi wan re civîn, lê nekarîn ramana wan pûç bikin. Xort demeke kurt rawestan, lê dûre berê xwe danê.

Mihemedê Mela Ahmed, ji hevalê xwe Ebdilezîzê Eliyê Ebdê xwest dest bi xebatê bikin, bê ku rawestin û hêviya gotina hin hevalan (ewên tu hêvî di wan de ne yî).

Van herduwan, di peyîza sala 1952 an de, dest bi karê xwe di nav hevalan de kirin û doza xwe belav kirin. Û ji wan xwestin bi wan re, di civata wan de, (Civata Yekîtiya Xortên Dîmûkratên Kurd) bibin endam. Wan belavok, bi destê xwe dinivîsin û naveroka wan bi ruhekî netewî dihat dagirtin û bi kerbûnê dihate

kopî kirin û li hevalan belav dikirin. Dema xortan, xwendekarên dibistanan ev belavok didîtin, ser wan de dihatin. Bi vî rengî gelek li wan kom bûn û di çend mehan de, hêjmareke baş çê bûn. Milet bi wan heseha û berê xwe da wan û navê Civatê belav bû.

Ji bo Civat, di destpêka xwe de, ne terpilê û nesekinê û bikarê cemawer li dora xwe bidê hev û beramber pirsên hevalan û xelkê, ku kîne yên ku vî karî dikin ? û peywendiyên wan bi kê re ne? Van her dû, damezrevanên wê (Mihemedê Mela Ahmed û Ebdilezîzê Eliyê Ebdê) di bersiva xwe de, ji hevalan re digotin, ku ev Civata he peywendiyên wê bi Partiya Kurdistana Iraqê re ne, (çinku Partiya Iraqê nav û dengekî netewî mezin, li cem milet hebû û bi çavê bilindahî û rêz lê dihate nerîn). Û digotin ku belavok ji wê dê tên. Wan ev gotina he digotin, ji bo devê xelkê li ser xwe bigrin û da xwe ji rexne û piropegendên wan xilaskin. Çinku ew, xort bûn, bê serpêhatiyên siyasî û civakî bûn û beramber nerîn û ramanên milet, yê didît ku xebat her û her didestê (serokên Xoybûnê de ye) û ji cem beg û axan dest pê dikê. Vêca ev gotina ha digotin, da wan razîbikin û bikarin hember piropegenda partiya komonîst, ya dijî wan dikir, rawestin. Çinku van gotinên qirêj ser wan digotin, weke kesin nijadperestin, paşverûne, zilamên dezgehên parastinê û kolîdaran ne. Lê bi rastî, ev piropegenda dijî wan, hişte milet hemû bi damezrandina vê civata ramyarî ya Kurdî bihesê.

Vêca, milet bi hebûna Civatê heseha, gelekan dipirsîn û lê digerehan, da bibin endamên wê. Çend meh neçûn hêjmara hevalên wan giha, çend sedan. Ev xurêna milet li ser wan de rastiyek dida xuyakirin, ku milet birçiyê karekî neteweyî bû, hêviya rêxistineke siyasî bû. Yanî milet dixwest bixebitê, da xwe ji vê bingoriyê xilaskê, lê tu kes ne didît. Dema civat dît, berê xwe bixurtî dayê û ew hembêz kir.

Piştî heval pir bûn û kar zêde bû û lebit fireh bû, dû hevalên din, Samiyê Mela Ehmed Namî û Derwêşê Mela Silêman, di buhara sala 1953 an de li herduyên berê zêde bûn, yanî serdariya Civatê bûn çar kes. Ev her çar, bi hev re, hatin hisabkirin, weke damezrevanên vê Civatê.

Van herçaran berê xwe dan milet, mil bi mil, şev û roj di nav milet de digerehan û heval pir dikirin.

institut kurde de Paris

Civata Yekîtiya Xortên Dîmûkratên Kurd, dengê wê belav dibû, saziya wê fireh dibû, nemaze di rojhilatê Qamişlo de, ta Endîwerê, li ser ava mezin.

Di sala 1956 an de hin hevalên din, weke Ebdilayê Mela Elî, Ebdirehmanê Şirnexî, Ehmedê Seyid Hemo û Ekrem Mihemed bûn endamên serdariya wê.

Di belavokên wê de, ser dîroka miletê Kurd û li ser navdarên Kurdan û li ser şoreşên miletê Kurd dihat nivîsandin û holê jî, li ser rewşa siyasî dinivîsandin. Gelekî guh didan xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî û belavkirina wî.

Civatê helwesteke dostanî, ji partiya komonîst digirt, çinku meyldarîk di dilên wan de, ji partiya çînî û navnetewî re hebû Û çinku berê, gelek ji endamên Civatê, an mirovên wan, endam bûn, an dostên partiya komonîst bûn. Digel vê helwesta dostanî û meyldariyê, partiya komonîst êrîşeke xurt berdida wan û gotinên gelekî qirêj bi wan ve dikir, digel ku komonîstan ew nas dikirin û di rastiya xwe de ji wan gotinên qirêj dûr bûn. Bi vê re jî, dema hilbijartin, ji bo endamîtiya perlemana Sûryê, di sala 1954 an de çêbû, serdariya Civatê, piştevaniya nûnerê partiya wan Cegerxwîn û Birahîm Bekrî kir û dengên xwe dane wan. Digel ku, di wê demê de, êrîşa Cegerxwîn li ser wan gelekî xurt bû û navê nijadperestan li hevalên Civatê dikir.

Civatê rêzaneke siyasî û saziyeke hundirî hebû. Lê mixabin, dema hikûmetê, di sala 1960 î de êrîşî Partî kir, hemû winda bûn, şewitîn, an bin erdê de rizîn. Hemû dîkomentên tevgera miletê me yên siyasî, çi kevin an nû, winda bûn û yên Civatê jî, di nav wan de çûn.

Bi sedema tunebûna dîkomentan, em neçar dibin vegerin li nik hevalên wê Civatê û ji wan bipirsin, ka rêzana wan çi têde hebû û çibûn bendên wê. Ji me re dibêjin, ku di nav bendên rêzana wan de, ev hebûn:

1-Em dixebitin ji bo azadkirin û yekirina Kurdistanê.
2-Em dixebitin ji bo xwe ji desthilatdariya kolîdar û kevneperestan xilsbikin.
3-Em dixebitin ji bo Dîmûkratiyê, da em bighin mafên xwe yên netewî.



Institut kurde de Paris

4- Daxwaza xwendina zimanê Kurdî di dibistanên Kurdan de dikin.

5- Daxwaza civat û yaneyên çandî û civakî dikin.

6- Piştevaniya mafên jinan dikin.

Ji bo xebat bi rengekî rast herê serî, her 3–5 heval di komikekê de saz dikirin, piştî sond dixwarin. Her çendekî hevalên komikê digihan hev û belavokên xwe, an hin nivîsandinên torevanî dixwendin.

Civata Yekîtiya Xortên Dîmûkratên Kurd, berdewamê xebatê bû, ta meha Şibata sala 1958 an, dema bi Partiya Dîmûkrata Kurdistana Sûryê re bû yek

## 2- *Komgirêka Azadî (4)*

Me dît, dema qada xebata Kurdî ji rêxstinên ramyarî vale bû, gelek ji Kurdan, berê xwe dan Partiya komonîst û bûn endamên wê. Çinku di hizra wan de, ev partiya he, a çînî û navnetewî, yê hêvî û armancên wan ên netewî pêkbînê, lewre bûn endamên wê û yên ne bûn endam, bûn dost û piştevan jê re.(5)

Bi vî rengî, beza Kurdan bal partiya komonîst ve, di salên çilan û destpêka salên pênciyan de, bibû cihê têbîniyê. Di nerîna min de sedema beza Kurdan bal Partiya komonîst ve, vedigerê bal:

1-Birîndarbûna sermeznatiya Kurdan a netewî, bi sedema: Tekçûna serhildana Mela Mistefayê Barzanî, di salên 1943 - 1945 an de li Kurdistana Iraqê û penaberiya wî li Soviyêtistanê sala 1947 an û herfandina komara Mahabada Dîmokrat, li Kurdistana Iranê, di meha Kanûna yekê de, ji sala 1946 an û darvekirina serokê wê Qazî Mihemed. Ev bûyerên ha hemû, bûn sedemên birîndarkirina hestên neteweyî yên Kurdan û hiştin di canê wan de gur bibin.

2- Pêşdeçûna civata Kurdî bi gavên fireh bal peydabûna sermiyan û hevrikiya çînî.

3- Cihgirtina Partiya Komonîst di civata Sûryê de, nemaze di civata Kurdan de û xebata wê ji bo pirsên çînî û ên navnetewî û ji bo mafên hemû miletên bindest û rola (Hevgirtina Sovyêt) di piştevaniya mafên miletan de.

Institut kurde de Paris

Lê ev beza Kurdan bal Partiya Komonîst ve, berdewam ne kir, çinku me dît, di nav van kesên Kurd û berpirsiyarên Partiya komonîst de, li devera Cizîrê, levnekirineke fireh peyda bû. Me gelek tişt ji Cegerxwîn û Mihemed Fexrî bihîstin, ku di sala 1955 an de, Partiya Komonîst rojnama xwe bizimanê Erebî û Ermenî çap dikir. Van endamên Kurd xwestin rojname bi zimanê Kurdî jî bê çapkirin, lê berpirsiyarên komonîst bi vê pêşniyarê razî ne bûn, bi hinceta ku tû kes nîne bi zimanê Kurdî binivîsê û tu mekînên nivîsandinê bi tîpên Kurdî cem wan nînin. Van endamên Kurd xwe dan ber hemû tiştan û gotin emê mekîna nivîsandinê bikirin û emê bi zimanê Kurdî binivîsin. Lê dîsa berpisiyarên Komonîst razî ne bûn. Li vê dê levnekirin di nav wan de peyda bû, giha ku gelekan weke Mihemed Fexrî xwe ji partiya wan û endamîtiya wê vekişandin û dev ji partiya wan berdan. Evên ha, xwe dan hev, hêjmara wan hinekî zêde bû û di Buhara 1958 an de, Partiya Azadî damezrandin û jêre rêzaneke siyasî nivîsîn.

Vêca Komgirêka Azadî (weke serdariya Partiya me, nav lê dikir) ji van kesên berê komonîst bûn û dev ji wê berdan, hate damezrandin (3) .

Di nerîna min de, evên ha, yê tu partî ava ne kiran û tu çalekiyên xwe zêde ne dikiran, eger ne dîtibwan ku Civata Yekîtiya Xortên Dîmûkratên Kurd û Partiya Dîmûkrata Kurdistana Sûrye bûn yek û li Cizîrê dest danîn ser komela Kurdî û tu rol ji xeynî wan re nema. Lewre me dît ew dilezînin, xwe didinhev û rêzanek ji xwe re dinivîsin û navek li xwe dikin û ji bo yekîtiyê, di sala 1958 an de, bi serdariya Partî re, dan û standin kirin. Di dan û standinê de, çend cih di komîtiya navendiya Partiyê de ji xwe re xwestin. Lê serdarya Partiyê bi vê razî ne bû, tu cih ne da wan û ji wan xwest, saziya xwe jevbêxin û yek yek bên bibin endamên Partiyê. Evên ha levketin û bûn dû bir. Hinek ji wan, weke Mela Şêxmûsê Qerqatî û Mela Şêxmûsê Şêxê û hineke dî, bi gotina partiyê razî ne bûn lê Cegerxwîn û Mihemed Fexrî û hineke dî, pê razî bûn. Û di havîna 1958 an de, dev ji hevalên xwe berdan û bûn bi Partiyê re. Cegerxwîn bû endamê komîteya navendî û Mihemed Fexrî bû endamê komîta devera Cizîrê. Lê birê wan ê didwan nekarî xwe ber

çalekiyên Partî bigrê. Û dema çalekiyên siyasî li sûryê hatin qedexekirin, ew jevketin û winda bûn.

### *B- Li Parêzgeha Helebê*

Reşîd Hemo û Şewket Henan dibêjin, ku ji salên çilan ve, hestên netewî, xort didehfandan ku li civat û partiyan bigerin, ji bo bibin endamên wan. Reşîd didomîne, ku: "Ew û Mihem ed Elî Xoce, di sala 1949 an de hatin Cizîrê û li Civata Xoybûnê gerehan, da ew û hevalên xwe bibin endamên wê û pêre bixebitin. Ji bo vê çûn gundê Maşoqê û Ebdilrehmanê Eliyê Ûnis axa dîtin û li ser Civata Xoybûnê jê pirsîn. Ji wan re daxuyakirin ku civat ne maye. Vegerehan cem Dr. Ehmed Nafiz li Qamişlo û dûre çûn mala Haco axa li Tirbispîyê. Di dawî de vegerehan mala xwe, bê ku bighin tiştekî". Lê ev xortên ha ne hedinîn, xwe gihandin hin kesên netewî, weke Osman Sebrî, Cegerxwîn û Dr. Nûrî Dêrsimî. Lê bi vê jî razî ne bûn, ji xwe re û di nav xwe de, civateke çandî, veşartî ava kirin, ji bo belavkirina hestên netewî û çanda Kurdî di nav Kurdan de. Ji endamên wê Reşîd Hemo, Şewket Henan, Mihemed Elî Xoce û Qadir Birahîm. Lê di sala 1951 ê de, dezgehê parastinê (esayiş) endamên wê naskirin û girtin û ew kirin dzîndana Mezê de, li Şamê. Piştî ji zîndanê derketin berê xwe dan partiya komonîst û bûn endamên wê.

Reşîd dibêjê, piştî gelek xort bûn endamên partiya komonîst, hinek levnekirin bi xortên Kurd re, di hundirê partiya komonîst de, hate xuya kirin. Çinku xortên Kurd xwestin rojname û belavokên wan bi zimanê Kurdî jî, weke yên erebî û ermenî, bên nivîsandin û çap kirin. Lê berpirsiyarên wan bi vê daxwazê razî ne bûn û hin endam, weke Reşîd (8), ji partiya xwe dûr kirin. Di vê rewşê de, ev xortên ha, amadeyî xebatê di hundirê partiyeke Kurdî de bûn, eger peyda bibê.

### *C – Li Şamê: Partî*

Me berê zanî ku gelek ji serokên xoybûnê li Şamê rudiniştin, lewre çalekiya tevgera netewî, li wê dê, ji zû de hebû. Û me dît

peywendiyên serokên Taxa Kurdan (9) û kesên wê, bi Civata xoybûnê re bûn. Û holê jî, me dît xortên wê, Yana Henano (di sala 1938 an de) damezrandin û gelekan xwe li dorê dan hev. Û me dît Osman Sebrî jî di wê salê de, civatek bi navê (Yekîtiya Xortan) ava kir. Dûre civata wî û Yana Henano, bûn yek û navê (Yana Kurdistanê) li xwe kirin. Nêzîkî 400 çarsed endam hebûn. Armancên wê belavkirina hestên netewî û hînkirina xwendin û nivîsandin bi zimanê Kurdî bû. Lê mixabin cenga cîhana didwan devê wê girt, weke çawa ya Amûdê jî girt.

Ramana avakirina Partî, ji bajarê Şamê û ji Osman Sebrî bi xwe derket.

Me berê got, ku sedemên babetî û xweyîtî, Kurdên Sûryê amadekirbûn, ji bo beşdarê xebateke neteweyî giştî bibin, da bighê armancên xwe yên netewî û nîştimanî li Sûryê. Ji van sedeman, bi rex yên xweyîtî, rewşa xebatê û dîmûkratiyê, ya di pênciyan de, li sûryê hebû û hinek sedemên din jî, Kurd lebitandin û dehfandin bal wê ve. Weke rewşa ragihandinî û rola rojnamegeriyê di gurkirina pirsa Kurdî, di salên 1955- 1956- 1957 an de, ya ku hişt mirov gomanbikê ku pirsa Kurd î gelekî nîzîkî armancên xwe bû ye (gora gotina Reşîd Hemo). Eva he hişt ew bal damezrandina Partî ve herin.

### *1 - Çawa Partiya dîmûkrata Kurdistana Sûryê hate avakirin*

Ji bo em bizanin çawa Partiya dîmûkrata Kurdistana sûryê hate avakirin, emê vegerin cem damezrevanên wê. Û bi wan re, zêdî sih salan vegerin paş û hewlbidin û em di sala 1988 an de, bûyerên kevin bînin bîra wan.

Emê di destpêkê de, kesên beşdarên avakirna wê bi nav bi kin û dûre, rola her yekî ji wan, di wê avakirnê de, bidin xuyakirin.

Di nerîna min de, damezrevanên wê, gora kevinbûna wan: Osman Sebrî, Hemîdê Hacî Derwêş, Hemze Niwêran, Şêx Mihemed Isa Mela Mehmûd, Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed û Şewket Henan bûn.

Em tên cem Osman Sebrî û jê dipirsin, ka çawa Partî hate damezrandin? û kîne damezrevanên wê û çawa damezrandin çê

bû? û nîrên dora wê çawe bûn? Mixabin em wî dibînin ku yên tên bîra wî, gelekî kêmin. Hinek ji vê dê, hinek ji dera he, hemû levketî. Mirov nikarê xwe bi wan nûçeyan ve girêbidê. Çinku ji bîra wî çûne, bi sedema dema dirêj û ew di 85 heştî û pênc saliya xwe de ye, (xwedê temenê wî dirêj bikê û tendirustiyeke baş bidyê). Û em jê dipirsin kanîn bîranînên wî, yên, dema em, di sala 1961 ê de, bi hev re, di zîndana Kelha Şamê de bûn, dinivîsîn? Dibêjê, ku dawî ne kirin, li cem sala 1930 î rawesta, ji ber hin sedemên xweyîtî, bi wî ve girêdayî ne.

Em diçin cem Hemîdê Hacî Derwêş û jê dipirsin ka çi nûçe, li ser avakirina partî, li cem hene? (weke em dizanin, Osman Sebrî, li Şamê, alîkariya kesên Kurdên biyanî dikir, weke xwendekaran, an yên ku dihatan ji bo qedandina hin karan, li cem hikumetê û ev xizmeta ha ji xwere kiribû kar). Bi vî awayî, wî û Hemîd û hin xortên din, xwendekarên xwendegihên Şamê, hevdû nas kirin.

Hemîd dibêjê: Di nîvê yekemîn ji salên pênciyan de, bi hinek mirovên xwe re, li bajarê Şamê dixwend. Di nav wî û Osman de peywendiyên xurt hebûn. Evahe hişt Osman, di sala 1955 an de, pêşniyarê wî bikê, ku civateke çandî avabikin. Û avakirin. Endamên wê Osman û Hemîd û apê wî Mihemed Salihê Hacî Derwêş û pismamê wî Mecîdê Hacî Derwêş û hevalekî wanê dî, Xidirê Ferhanê Iso bûn (10). (Hemîd navê civata vejandina çanda Kurdî lê dikê. Lê Mecîd navê "Encûmen" lê dikê). Ji armancên wê hînkirina Kurdan li ser xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bû. Bi wê re jî, dikir ku çanda Kurdî di nav Kurdan de belav bibê. Lewre hinek ji pirtûkên toreya Kurdî çapkirin, weke Elfabêya Kurdî, Bahoz û Derdên me, yên Osman Sebrî û pirtûka rûpelin ji tora Kurdî, ya Rewşen Bedirxan û el red ela el kosmopolîtiye, ya Ebdilrehman Zabîhî. Hemîd di domînê: ku ev çalekiyên çandî ne bi keyfa hinekan bûn, weke komonîstan, lewre ji hevalên xwe, Mecîdê Hacî Derwêş û Ferhanê Iso, xwestin xwe ji vê civatê bikşînin û apê wî Mihemed Salih jî, bi gotina Rewşen Bedirxan kir (ewa bi Osman re, nelev) xwe ji civatê kişand. Û holê di civatê de, tu kes ji bilî wî û Osman di sala 1956 an de nema. Hemîd didomîne: Piştî demekê Osman pêşniyarî min kir, ku bihev re partiyeke siyasî ava bikin, ez

razî bûm. Osman dest bi nivîsandina rêzaneke siyasî, bi zimanê Kurdî kir.

Beşdariya min di nivîsandina pirogramê de, hindik bû. Çin ku di wê demê de, ez, hê ne şehrezayê wî karî bûm. Me navê (Rêzan) lê kir. Di wî karî de, Dr. Nûredîn Zaza û Celal Talebanî (yê li Şamê penaber bû) alîkariya Osman kirin (11). Û holê herduwan, di sala 1956 an de, bingihê avakirna Partî li Sûryê danîn.

Piştî vê, Hemîd Rêzan şanî gundiyê xwe Hemze Niwêran ê (komonîst) kir. Ew jî razî bû, bibê hevalê wan. Lê jê xwestin, xwe ji Partiya komonîst dûr bikê. Ewî jî, ew kir. Holê bûn sê kes. Osman Sebrî, ji bo hevalan zêde bikê, çalekiyên xwe fireh kirin û xwe gihand Reşîdê Hemo li Helebê, yê ku dostanî, ji berê de, di nav wan de heyî (weke Reşîd dibêjê) û beşdariya wî di vî karî de, jê xwest. Ji bo wê Reşîd hate şamê. Osman Rêzan şanî kir, lê Reşîd (gora gotina wî) bi timamiya wê razî nebû. Lê levkirin ku yeke dî binivîsin. Lê ew jî wergerandina Rêzanê, ya erebî bû, (weke Osman û Hemîd dibêjin) Û tê de benda (Azadkirin û yekirina Kurdistanê) hati bû nivîsandin.

Dema Reşîd vegereha Helebê, hevalên xwe: Mihemed Elî Xoce, Xelîl Mihemed û Şewket Henan dîtin û ji wan re, tiştê bi Osman re kirî got. Hevalên wî, ji bilî Şewket, yên ku komonîst bûn, bi karê wî razî bûn. Seb vê hatina Şewket bal Partî ve, ji ya wan, derengtir ket (weke Şewket dibêjê) (12).

Bi vî awayî, evên he hemû bûn damezrevanên Partiya dîmûqrata Kurdistana Sûryê û hemû jî, bûn endamên komîtiya navendî. û levkirin ku, bi rengê fermî, civîna wan ya yekemîn ya di roja 14. 6. 1957 an de, bikin roja damezrandina Partî li Sûryê. Ji bo roja damezrandinê, ne Osman û ne Hemîd deng ne kirin û ne gotin ku me sala berê, partî avakir ye. Çinku mebesta wan (Osman û Hemîd) hebûna partiyekê bû, da bixebitê û armancên milet pêk bînê. Û vaye partî pêk hat û armanca wan jî ew bû û navkirina roja avakirnê, yê nebê sedema levnekirinê.

Lê hê endamekî dî jî heye, ew jî Şêx Mihemed Isa Mela Mehmûde. Dema li ser wî, min ji Osman, Hemîd, Şewket û Reşîd pirsî, hemuwan gotin, hebûna wî di komîtiya navendî de, sala 1957 an, nayê bîra wan û gotin, ew di nav endamên komîtiya navendî

de, tenê di sala 1958 an de dîtine. Lê Şêx di bêjê, ku peywendiyên wî bi Osman re (xwediyê raman û gav a yekemîn, ji bo avakirna Partî) ji salên çilan ve heye. Û herduwan li ser rewşa milet û tevgera wî, ji hingê ve diştexilîn. Û di dema dest bi avakirna Partî kirin, ew li bajarê Qahîrê nexweş bû. Û didomînê, lê ji sala 1957 an ve, ez bi wan re bûm. Û gelek caran min Osman birye Helebê, ji bo bi Reşîd û hevalên wî re bicivê.

Reşîd dibêje: Ew di sala 1957 an de, bi Hemze Niwêran û Şêx re, ji bo xebatê hate qamişlo (13) û cihê wan mala şêx bû.

Vêca em bipirsin: Gelo ma diruste, yekî weke Reşîd, ji bo çalekiyên siyasî, ji Helebê bê qamişlo û li mala yekî nenas razê û ji wê dê çalekiyên siyasî bikê, bê ku bizanê ev kesê he kiye ? gelo hevale, an doste, an çi tebaye? Evahe di demekê de qewim ye, ku tu hevalên partiya wan, ne li Qamişlo û ne jî li hemû Cizîrê, zêdî jimara tiliyên destekî nebûn, ew jî li dora bajarê Dirbêsiyê bûn.

Ez bi xwe, baş tê bîramin, dema me, serdariya Civata yekîtiya xortên dîmûkratên Kurd, di Kanûna didwan de, ji sala 1958 an, bi Hemze Niwêran û Se`ido yê Ibo re dan û standin ji bo yekîtiyê dikir, Şêx Mihemed Isa hevalê wan yê sisyan bû li mala xwe bendî wan bû û bi wan re, li ser wê diştexilî. Çinku min, di wê demê de, ew didît. Ji bilî van jî, ewî hin tişt ji min re gotin, weke hinek çalekiyên wan û hin bûyer, di salên 1957 an de, an 1958 an de çêbûyîn, hemû hevalên wan pê nedizanîn, weke bîrnama dayîn kongira hevkariya miletên Asye û Efrika, ya li bajarê Qahîrê, di sala 1957 an de hatî li darxistinan. An weke peywendiyên Partî bi (el mekteb el sanî) re. Û ji bilî vê jî, hevalekî kevin, ji min re got ku şêx û Hemze, di sala 1957 an de, xwe gihandinê, ji bo wî, ji xwere, li qamislo, bikin heval.

Vêca ez dibêjim, ku jibîrkirin, an hin tiştên din, hiştiye neyê bîra van kesan, ku şêx hevalê wan yê kevin bû. Ji van têbîniyên min dan xuya kirin, ez dibêjim, wekate ku Şêx jî hevalekî wan, di damezrandina Partiya dîmûkrata Kurdistana sûryê bû.

Piştî avakirna Partî, birêz Celal Talebanî, yê sala 1957 an li sûryê penaber bû, xwest hêzên siyasiyên Kurd li Sûryê bighînê hev, lewre çû Cizîrê koma began dît û hinek ji serdariya Civata xortan jî

dît, ji bo ew û partî bibin yek. Ev yekîtiya he, di destpêka sala 1958 an de, kar jêre hate kirin.

Di vê demê de (gora gotina Hemîdê Hacî Derwêş) (14) serdariya Partî ji Dr. Nûredîn Zaza xwest bi wan re bixebitê lê wî xwest, ku berê wê, Partî bi began re bibe yek, nûka yê bi wan re bibê heval. Lêwre ma dûr ji Partî ta havîna sala 1958 an (15), dema ew û Cegerxwîn bûn endam di Partî de. Ew bû serokê Partî, (û Osman Sebrî sekretêr) û Cegerxwîn bû endamê komîtiya navendî. Lê eva he çêbû, piştî Civata Xortan û hinek ji hizba Azadî bûn bi partî re û partî di nav Kurdan de, li Sûryê û derve yî wê jî, bû binav û deng.

Serdariya Partî di sala 1957 an de, dest bi çalekiyan kir û bîrnamek di destpêka meha kanûna yekê de, ji sala 1957 an, da kongira Hevkariya miletên Asya û Afrîke, li Qahîrê (gora gotina Reşîd Hemo û Şêx Mihemed Isa). Ev bîrnama he (ya pirsa Kurdî û rewşa Kurdan li hemû Kurdistanê şirov dikir û ji kongirê dixwest piştevaniya mafê Kurdan di azadiyê û serxwebûnê de bikê), Ebdilrihman Zebîhî bi xwe re bir Qahîrê û li wê dê, bi alîkariya xortên Kurdan (weke Mehmûd Mêrdînî, dostê Şêx), ew bîrname, wergerand çend zimanan û dan endamên kongirê.

Lê berî bîrnamê rêkin, Reşîdê Hemo û Celal Talebanî, çûn cem Dr. Nûrî Dêrsimî. Çinku wan bihîst bû, ku Dr. Dêrsimî û hevalên wî, (koma Rê ol û yên rojnama Wijdan û Huriye, di nav Kurdan de, belav dikirin) weke Rewşen Bedirxan û Hesen Hişyar û hin kesên din, dixwazin ew jî, bîrnamekê bidin kongira Qahîre. Vêca serdariya Partî û birêz Celal xwestin Kurd yek bîrnamê bidin kongirê, ne didwan. Ji bo vê çûn cem Dr. Dêrsimî. Lê mixabin Dr. Dêrsimî razînebû û ji ya xwe ne hat xwar. Ne ya xwe ji holê kişand û ne jî, bi wan re kir yek. Û li ser ya xwe ma, ku yê wê bidê kongirê. Û bi xeyd ji cem hev çûn, piştî wî (yanî Dr. Dêrsimî) û Celal Talebani şerê hevkirin. Çinku Dr. Dêrsimî nav civatan de digot, ku ew nûnerê Partiya kudistana Iraqêye. Celal jî endamê komîtiya navendî ya wê bû, lewre bi gotina Dr. Dêrsimî razînedibû û şerê wî kir.

*2- Fireh bûna saziya Partî, di nav milet de*

Serdariya Partî berê xwe da cemawerê milet, ji bo wî di xebatê de bike heval û wî di Partî de sazbikê. Gava yekemîn ya serdariyê bal (Civata yekîtiya xortên dîmûkratên Kurd) ve bû. Di encama dan û standin di meha Kanûna yekê de (çileyê paşîn) ji sala 1958 an, Civata xortan bû hevalê Partî. Û holê di gelek cihan de, hevalên pir, ji partî re peyda bûn û navê wê di nav xelkê de belav bû. Dûre serdarî berê xwe da komgirêka Azadî (ya ji kesên, ji partiya komonîst dûrketîn, hatibû avakirin) û dan û standin bi wê re kir. Lê hevalên wê pileyên bilind ji xwe re, di saziya partî de xwestin. Lê serdariya partî bi daxwaza wan razînebû. Çinku ew dîtin komikeke, gereke xwe jevbikê û yek û yek bên bibin endamên partî. Hember vê, weke berê jî me got ew levketin û bûn dû bir. Yekê xwe sipart partî, bû endam, ya dî ma dûr ji partî.

Dûre, serdariyê berê xwe da burjiwaza Kurdî (serdariya Xoybûn a kevin), ji bo bi wan re yekîtiyê bikê. Reşîd dibêjê: Me berê xwe da van, çinku gelekan yekîtiya milet, ji me dixwestin, ku divê hêzên milet hemû bibin yek. Weke daxwaza Celal Talebanî, nûnerê partiya Iraqê li Sûryê û Ebdirehman Zebîhî ji partiya Iranê, yekîtî dixwestin. Bi vê re jî, di sala 1957 an, Celal Talebanî, çûbû Yekîtiya Soviyêtsatnê û Mela Mistefayê Barzanî dîtibû û jê re li ser avakirina Partî li Sûryê gotibû. Wî jî gelek keyfa xwe anîbû, lê yekîtiya milet xwest bû. Yanî yekîtiya hêzên siyasiyên milet. Lewre me berê xwe da burjiwaza Kurdî (yanî Beg) (16) .

Hevdîtina yekemîn, bi began re, weke Şêx dibêjê, li Heleb ê, di meha Eylûla 1958 an de bû. Yên ji aliyê Partî, di wê civînê de amade bibûn, weke Reşîd dibêjê: Dr. Nûredîn Zaza, Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce û Xelîl Mihemed. Û ji aliyê Began ve, Qedrî Begê Cemîl Paşa, Ekrem begê Cemîl Paşa, Cemîlê Haco axa û Arif Beg Ebas. Reşîd dibêjê: di vê civînê de, li ser van bendan levkirin:

1-Azadkirin û rizgarkirina Kurdistanê.

2-Şerê împiryaliyê.

3-Li Sûryê de, ji bo dîmûkratiyê, bixebitin.

Û levkirin ku Hesen Haco axa, bi nav, bibê serokê Partî. Û levkirin ku komîtiyeke navendî nû damezrînin (endamên wê, bên

Institut kurde de Paris

binavkirin, ne bi hilbijartin). Şêx jî dibêjê: Di vê civînê de, li ser damezrandina destekek ji 5 pênc kesan, ji herdû aliyan levkirin, ji Dr. Zaza, Reşîd Hemo û yekî dî, navê wî nayê bîra wî (Reşîd wî binavê Xelîl Mihemed dikê), ev ji aliyê Partî bûn. Û ji began, Cemîlê Haco û Arif beg Ebas. Karê vê destekê, amadekirin ji bo kongira piştî sê mehan bicivê û hingê yê endamên komîtiya navendî binavbikê (17). Lê Osman û Hemîd û Şewket dibêjin tu civînên bi vî texlîtî, nayê bîra wan û wan tu civîn bi began re nekirne. Lê şêx didomîne, di vê civîna 1958 an de, levkirin kû çalekiyên partî yên siyasî û xebatê rawestînin, ta xwe ji kongirê xilaskin (18) Şewket dibêjê û şêx jî wekat dikê, ku dema bihîstin bi rawestandina çalekiyên partî û beg jî yê bikevin komîtiya navendî de, bi van biryaran razînebûn (19). Û Şêx didomîne, dema Osman bi van biryaran bihîst, xwe gihand min û di guhê min de got, ku partî ket di destê began de û yê herê, weke çawa yên berê jî çûyîn.

Lewre min xwe gihand endamên komîtiya me û ji wan civînek, bê began, xwest. Û li ser biryarên bi began re em ştexilîn. Em gihan ku guftûgo ya me bi began re, yê ser binyata, ku yê tenê bibin, komîtiyeke şêwirdar, ji komîtiya navendî re û partî, yê xebata xwe berdewam bikê û tu rawestin ji çalekiyên wê re, yê ne bê. Dema beg bi vê helwesta nû ya serdariya partî hesehan, gelek xeyidîn û êrîşeke xort berdan serdariyê û ew bi ezîtiyê bargoman kirin. Û gotin ku ew rê nadê tû kesan ji bo xizmeta miletê xwe bikin. Û raman û gomanên xirab belavkirin. Weke çima bêhtirê endamên komîtiya navendî ji Helebê ne û bêhtirê endamên partî ji Cizîrê ne? Heval bendên xwe dehfandin ji bo êrîşî serdariya partî, di calde û çayxane û civatan de bikin. Û dostên xwe yên di partî de, weke Mecîdê Haco û Mihemed Fexrî endamên komîtiya devera Cizîrê, dehfandin ji bo helwestê bi wan re bigrin (20) Cemîlê Haco bi xwe, ji min re got, ku wî xwe gihand hin kesan, di partî de, ji bo bi wan re bigrin, da bibin endamên serdariya partî, ne bibin komîtiyeke şêwirdar. Serdariyê, hember vê helwesta wan a xirab, ew kirin hember berpirsiyariyê de û ji wan re got, yê yeke xirab bi wan de bê, eger ew dest ji vî ewayê xwe bernedin.

Di vê demê de, Dr. Zaza hate Qamişlo û ew dîtin. Lê nekarî wan razîbikê. Û di dawî de levnekirin. Wan dixwest kar di

Institut kurde de Paris

Destê wan de bê, ne komîtiya şêwirdarên serdariya partî bin. Lê serdariyê bi vê daxwaza wan nekir. Êrîşa wan rawesta, dema şevên tarî li ser Sûryê de hatin û desthilatan destên xwe dirêjî partiya komonîstan kirin û endamên wan girtin û dor jî hate li ser Partî.

Reşîd dibêjê: ku wan civîneke dî, di havîna 1959 an de, bi began re kirin. Çinku berê, di civîna Eylûla 1958 an de gotibûn, ku piştî sê mehan yê bicivin, lê çinku nîrên wê demê nexweş bûn, nekarîn wê civînê bikin, niha ew civîn kirin. Û bi wan re, li ser hilbijartina ji bo (el Itihad el qewmî) partiya dewletê, ştexilîn. Lê dîsa levnekirin. Serdariya partî didît ku Ithad el qewmî, nikarê tiştekî ji Kurdan re bikê, an mafên wan bide wan. Ji bo vê, ne gereke beşdarê hilbijartina wê bibin. Lê began dîtin, ku divê em beşdarê hilbijartina wê bibin ji bo xwe nîzîkî hikûmetê bikin. Û divê em çalekiyên partî rawestînin û belavok û rojnama partî dernexin û divê Dr. Zaza ji sûryê derkevê û herê ewrûpe, li wêdê çalekiyên siyasî bikê. Û Reşîd jî herê Cizîrê, li wêdê xwe veşêrê û çalekiyan bikê. Lê serdariyê êrîşî vê ramana wan ya revok kir. Û Dr. Zaza ew bargoman kirin, ku ew revokin, ne yê xebatê ne Ew gora berjewendiyên xwe ne û dixwazin vê, bi partiyê jî bikin, weke çawa bi partiyên berê kirîn, ew naxwazin partî gelêrî be û di xebatê de xurt be û berdewamê wê be, ta bikarê mafên miletê xwe bidest bêxe. Ji civînê rabûn û her alîk di rêya xwe de çû. Êrîş di nav wan de xurt bû, weke berê me got (21).

Dema hilbijartina Itîhad el qewmî çêbû, Partî beşdarê wê ne bû, lê hinek ji malbatên began beşdarê hilbijartinê bûn.

Ev bûn çalekiyên sazî yên Partî, dema berê xwe da milet û xwest wî di nav saziyên xwe de, bidehev.

**3-Bizava ramyarî ya Partî**

Em dikarin lebta Partî ya ramyarî, di van peywendiyan de, bidin xuyakirin:

a- Peywendiyên partî bi partiyên siyasiyên Sûryê re.

b- Peywendiyên Partî bi desthilatên Sûryê re.

c- Peywendiyên partî bi Partiyên Kurdistanî **re.**

d- Em dikarin lebta Partî ya siyasî û peywendiyên wê bi partiyên Sûryê re, bi vî awayî bidin xuyakirin:

Di sala 1957an de Partî hate damezrandin û ji vê demê dest bi calekiyên siyasî û sazîkir. Çalekiyên sazî, me di destpêkê de dan xuyakirin. Lê yên ramyarî, nemaze peywendiyên wê bi partiyên Sûryê re, tu dem pê re nebû, ji bo wan bikê, an fireh bikê. Çinku Partî, hê ji bo kar, xwe pêktanî û hê salek ser damezrandina wê re neçûyî, guhertinek giring di welat de çêbû. Dewleta Sûryê û Misirê di 22. 2. 1958 an de, bûn yek dewlet, bi navê komara Erebiya Yekbûyî û di 1958 an de hebûna partiyan hate qedexekirin. Û di destpêka sala 1959 an de, endamên partiya komonîst hatin girtin. Û goman ew bû, ku dora Partî jî yê bê. Partiyên Sûryê, ji bilî ya komonîst saziyên xwe jevxistin. Lê ya komonîst, komîtiya navendîya wê, biryar bi 13 sêzdeh bandan stand, ku: "Partî (ya komonîst), ji bo berjewendiyên niştimanî, ji dêlî yekîtiyê, piştevaniya fidraliyê bi Misrê re dikê" (22). Û wan xwestin "encûmenek ji herdû hikûmetan bê damezrandin, ji bo lêgerînek li ser hemû aliyên hevgirtinê bikê, da ser bingehekî xurt û babetî rabê û nîrên babetî yên her welatî deynê ber çavan û bikê, di nav wan de, levkirin û hevbeş hebê" (23). Xalid Begdaş, sekretêrê giştî yê partiya komonîst, wan sêzdeh bendan di bersiva xwe de, ji rojnama (Sefîr) re dûcarîkir û rojnama (nidal el şe`ib) a komonîst, hêjmara 429 an, kanûna yekê 1988 an, ew weşanad Xalid Begdaş got, ku: "em tu şertan deynanin, lê em rêya rast, ji bo berdewam kirina yekîtiyê, didin xuyakirin. Û serpêhatiyên jiyanê, rastiya helwest û pêşniyarên me dan xuyakirin. Çi yekîtî di nav bera dû herêmên erebî de, an bêhtir çêbê, eger bixwazin berdewam bibê, divê ji bingehê wê bê: xebat dijî kolîdar û Impiryaliyê û ji bo dîmûkratiyê û pirensîpên wê birêz bigrin û dostanî bi hêzên azadî û aştîxwazên cîhanê re û di pêşiya wan de welatê şoreşa sosyalîsta mezin bikin û di dawî de, nîrên babetî yên her herêmê, bikin berçavan de ". Ev bûn kakilê her sêzdeh bendên partiya me, ewên ji bo yekîtiya Sûryê û Misrê, pêşniyar kiribû " .

Û holê partiya komonîst, hevgirtina Sûryê û Misrê, ji dêlî yekîtiyê dixwest. Û bi vî awayî, xwe kir dijberê desthilatdariya serok Cemal Ebdilnasir. Lewre Xalid Begdaş, nûnerê perlemana

Sûryê, emadeyê civîna wê nebû û dîkomenta yekîtiyê muhir nekir. Çinku ew berî 4 çar mehan ji Sûryê derket bû.

Piştî çend mehan, hikumetê endamên partiya komonîst girtin û ew gelek êşandin.

Holê hember van bûyerên giran, tu dem bi serdariya Partî re ne bû, ji bo bizaveke siyasî, an dan û standinê, bi partiyên Sûryê re bikê. Ji bilî partiya komonîst, ya piştî çendekî di zîndanan de gihanhev, (ev partiya komonîst, ya ji destpeke de, êrîşeke xurt berda Partiya me û ew bi gotinên qirêj bargoman kir, weke gotina ku ew şovin û kevneperestin û bi Impiryaliyê ve girêdayî ne û dezgehê parastinê, Partiya me damezrandiye). Çinku Partî, ew ji hevalên wê yên Kurd şeland û hişt di nav milet de bê hêz bimînê. Bi rastî partiya komonîst, dema şerê Partiya me dikir, li berxwe dida, ber saziya xwe dida, ya di nav Kurdan de qels dibû. Çinku Partiya me gelek hevalên wê yên Kurd jê birin, digel ku hinek man bi wê re. Bi vê helwesta wan re jî, serdariya Partiya me û gelek ji hevalan, di hestên xwe de bi komonîstan re bûn, çinku berê gelek ji wan komonîst bûn, an dostên wan bûn, sebvê bersiva komonîstan ne didan û bêhna xwe li wan fireh dikirin, ta bûn heval di dijberiya desthilatdariya Ebdilnasir û serdestiya mebahisan li ser serê xelkê û azadiya wan de û bûn heval di girtegihên dewletê de.

### *b- Peywendiyên Partî bi desthilatên Sûryê re*

Peywendiyek teng, ji bo demeke kurt, bi dezgehê parastinê re (el mekteb el sanî) peyda bû, lê zû hate qutkirin. Çinku dezgehê parastinê, dît tu sûd jê tune ye. Ev peywediya he, hinekan, weke partiya komonîst û hinek ji Kurdan, jê re dihol û zirne lêdan û piropegendekî fireh, ser damezrandina Partî çêkirin, ku Partî ser destê serokê dezgehê parastinê Ebdilhemîd Serac hatiye damezrandin. Ta niha jî şûnemayên wan gotinan dimînin. Gelo ya rast çi ye?

Me got ku Sûrye ji destpêka salên pênciyan ve, cihê pilanên dewletên Impiryaliyê bû, da wê bikşînin feleka xwe û wê bikin hevalbendê xwe, di pirosêsa Tiromen û ya Izinhawir û di Hevbenda Bexda (sênto) de. Lê hêzên nîştimanî û yên dimûkrat û

yên pêşverû û li pey wan miletê Sûryê, dijî wan rabûn ta têkçûn. Digel ku dewletên dora Sûryê, weke Tirkiye û Iraq û Urdin, hevbendiya Impiryaliyê dikirin, ji bo li Sûryê bişidînin, da bibê hevalê wan. Ta giha radekî Tirkan dû caran di meha Adara 1955 an de û di peyîza sala 1957 an de, leşkerê xwe anî ser sînorê sûryê, ji bo êrîşî wê bikê, eger nebê hevbendê Emerîke û tirkiye û Iraqê. Lewre hêzên nîştimanî û dîmûkrat û pêşverû, yên welêt, (di nav wan de Kurd jî), dijî wan pilanan rawestan. Ev Kurdên ha, biçûk û mezinên wan, xwe kirin di nav rêzên leşkerên gelêrî de û ser sînorê bakurê Sûryê, hember leskerê Tirkan rawestan (û xortên wan di nav hêzên leşketran de bûn) û hemû amade bûn, xwîna xwe ji bona welat birijînin.

Ji alîkî dî ve, desthilatên Sûryê û dezgehê parastinê, bi rêyên xwe, bizava xwe, dijî dijminan dikirin. Diyar bû, ji nav wan bizavan, yên dijî Iraqa Nûrî Se`id û Tirkiya Ednan Menderîs, xwe nîzîkî Kurdên wan welatan bikin, da ew Kurd astengan û piroblêman, ji hikûmetên wan welatan re (evên dijî Sûryê), peyda bikin.

Ji bo vê pilanê, di dawiya sala 1957 an de, dezgehê parastinê, gotin gihand serdariya Partî, ku dixwazê wan bibînê, eger serdariya Partî razîbê. Ji bo vê daxwazê, komîtiya navendî civînkir, (weke Reşîd, Şêx û Şewket dibêjin) û biryar standin bidîtina serokê mekteb el xas, Ebdilhemîd Serac. Ji bo vê dîtinê Reşîd Hemo hilbijartin. Di destpêka sala 1958 an de, Reşîd xwe gihand yekî ji wan. Dûre Ebdilhemîd Serac dît. Weke Reşîd dibêjê, daxwazên wan ev bûn:

1- Hinek dem, di radyo ya Sûryê de, ji bo zimanê Kurdî.
2- Rê bidin Kurdan ji bo yaneyên Kurdî vekin.
3- Rê bidin çanda Kurdî, bi her nifşên wê, bête belavkirin.
4- Newekhevî û zordarî, li ser Kurdan hilînin.

Ev daxwazên he, hember xwestekên desthilatên Sûryê, yên ji Partî ya me xwestin, ku divê, di nav Kurdên iraqê û tirkiyê de bixebitê, ji bo wan li hikûmatên wan rakê, ta dev ji Sûryê berdin.

Endamên Partiyê çûn û hatin û hinek belavok birin wan welatan. Lê evahe dom nekir, çinku guhertin di heremê de çêbû, hişte ev levkirina he, bê sûd bimînê û biherifê.

Dezgehê parastinê dît, ku Partiya me, bi vê hincetê, belavokên xwe dinav Kurdan de belavdikê. Lewre ji serdarya Partî xwest, tu belavokan çapnekê û belav nekê. Ev peywendiya he çend mehan domkir.

### *c- Peywendiyên Partî, bi Partiyên Kurdistanî re*

Me dît, dema Partî li Sûryê hate damezrandin, hinek ji Kurdên Iraqê û yên Iranê li Sûryê bûn û peywendî bi wan re hebû. Ev peywendiyên he bi partiya iraqê re, xurtir û firehtir bûn, nemaze piştî 14. Tîrmeha 1958 an. Dan û standin û hevdîtin hebûn û şûnemayên wan gelek bûn. Emê ser wê di rûpelên bên de, biştexilin.

Institut kurde de Paris

# *Navbira didwan*

*Berçavkirina sedemên levnekirinê, di hundirê Partî de*

Institut kurde de Paris

### *1- Partî, di navbera sala 1958 an û Tebaxa 1960 î de*

Ji destpêka sala 1958 an, dema Civata Xortan, bû bi Partî re, Partî berê xwe da cemawerê milet, da wî di rêxistinên xwe de sazbikê. Lewre salên 1958 an û 1959 an, bûn salên firehkirina saziya Partî, di nav milet de, bi awakî mezin, ta radekî, ku tu gundên Kurdan li Cizîrê û Çiyayê Kurdan nebûn bê ku endamên Partî di wan de hebin. Milet birefan dibûn endam, ta axên Kurdan, hêvîdikirin bibin dostên wê. Holê, bingihê Partî di nav hemû Kurdan de, li Cizîrê, Çiyayê Kurdan, kopanî û Helebê û Şamê, bifirehî belav bû. Ev rewşa he, hişte partiya komonîst şerê wê bi xurtî bikê û ew kir kevneperest û şûv û peyayê dezgehê parastinê. Çinku Partî cihê wê di nav milet de girt. Man bi vî awayî, ta hevalên herdûwan, di rikberiya desthilata Ebdilnasir de û di girtegehên wî de, ji sala 1960 î ve gihanhev (24). Dûre li Cizîrê, çend caran, serdariya herdûwan hevdîtin.

Partî bixwe bibû, rêxistinek ji her nifşan. Çep û rast, pêşverû û paşverû têde hebûn. Ramanên şovînî û dîmûkrat û şoreşî jî, têde hebûn. Partî ser bingihê netewî avabû. Lê dixwest xwe bi rûçikî pêşverû geş bide xuyakirin, lê ma di nav rikberiyê de, bi şovan û keysdaran û revokan re, ta parçebûna sala 1965 an.

Partî xelk danhev, hemû bihev re anîn, bê ku ramanên wan û îdiolojiya wan, ya dijber, bike yek. Lê yek bû, di armancên netewî tenê de, ewên mafên miletê Kurd dixwestin, ta girtina sala 1960 î. Hingê lawaziya binyata wê, ya ne wekhev belû bû. Derzeke kûr lê ket û hêdî hêdî bal parçebûnê ve çû.

Ebdilhemîd Serac, zilam ê xurt, ê serok Cemal Ebdilnasir li sûryê, yekemîn derb li Partî da û endamên wê di 12.8.1960 î de girtin û ramanên wan hejand û hişte levbikevê.

Partî di avahiya xwe de, levketî bû, ne bi endazyarî hatibû avakirin. Serdariya wê, dixwest xwe bidê xuyakirin ku ew pêşverû ye. Lê xebata wê, di wê demê de, lidora burjiwazan bû, ev berjiwaza dixwest serdariya Partî bikê di destê xwe de, ji bo nerîna

xwe, di kar û ramanan de bibe serî. Dûre eva he, baş hate xuyakirin. Vêca kiye ev serdarî:

- Osman Sebrî: Ji bo baweriyên xwe yên netewî, xebatkerekî xurt bû. Di demekê de, peywendiyên wî bi partiya komonîst û aştîxwazan re hebû.

- Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce, Şewket Henan, Xelîl Mihemed û Hemze Niwêran: hemû di demekê de, endamên komonîst bûn.

- Doktor Nûredîn Zaza: Pila doktora di sosyalocî de, ji Siwisre wergirtibû. Jiyaneke dirêj li ewrupe qedand. Bi awakî zanistî diştexilî û bi Markisî şirûv dikir.

- Hemîdê Hacî Derwêş: Xortek, ji bo ramanên netewî û markisî germ bû, di siyasetê û di ramanên siyasî û îdîolocî de, kêm serpêhatî bû.

- Cegerxwîn: Çend mehan tenê ma di Partî de û dema dinya tarî bû, Ew û Mihemed Elî Xoce û Xelîl Mihemed, çûn Kurdistana Iraqê.

- Şêx Mihemed Isa Mela Mehmûd: Ew tenê, di serdariyê de olperest bû. Xwedî ramanên olî û siyasî bê hişkî bû.

Serdariyê xwe bi markisiyetê ve girêdida, ji bilî şêx, yê dijî nerînên wan ne disekinî. Çinku wî, berjewendiyên partî û yên milet, bi wê ve didît.

Bi vî rengê he, min serdarî naskir.

Lê gelo, ma raste serdarî Markisî bû ? . Divê em li kar û xebata wan binêrin, da bikarin bersivê bidin. Lê ew jî nayê xuyakirin, bê mirov li hemû çalekiyên wan, ji destpêkê ta dawî binêrê, hingê yê bête xuyakirin, ka her yek ji wan çibû.

Di destpêkê de ezê bêjim, ku hê salak ser xebata Mihemed Elî Xoce û Xelîl Mihemed û çend meh ser ya Cegerxwîn re neçûyî, van ji tirsa zordarî û eşkencên hêza parastinê (mebahis) li Sûryê, xwe avêtin hembêza partî li Îraqê. Ji bo vê, em tistekî li ser wan, di pêveçûya xebata Partî de, nabêjin.

Bi vî awayî, me serdariya Partî naskir, lê kîne hevalên wan yên din ?.

Hevalên wan yên din (di komikan û şaxan û deveran de û xeynî wan jî) neteweyî bûn, nîzîkî şovîniyê bûn. Lê van hin û hinû,

bi ramanên siyasî yên nûjen girtin. Xwe ji bin siha serdariya serokên eşîran dûrkirin. Lê dîndar bûn, weke çawa miletê me hemû dîndare. Lê gelo çi ne, yê vê serdariyê û hevalên xwar de, bi heve girêdidin? Ew jî di bingihê xwe de, xebat ji bo mafên netewî yên Kurdan li Sûryê û hemû Kurdistanê bû û ji bo dîmûkratiyê, weke armanceke serekî. Yanî netewî û nîştimanî jev nayên cida kirin. Em hê bipirsin, gelo çiqas, duruşmên hildigirtan, bi demê re bûn, serwext bûn? Ev duruşmên he, ne ketibûn di guft û goyan de. Çinku hevalên xwar yên bin serdariyê re, ne zêde rewşen bîr bûn, ta bikarin nerîneke zanistî, siyasî kûr, li ser wan, bi awakî rast bigrin. Û serdarî jî bi erkê xwe, ji bo bilindkirina zanebûna wan ranebû (25). Di nerîna min de, serdarî ne serwextê deme xwe bû, guhertin û bûyerên di Kurdistanê û deverê de, baş tê negihişt bû. Hê bin siha mija hestên netewî de bû û bin siha nerîna xebata şoreşî, ji bo Kurdistanê û fidakariya bê sînor de bû. Derba yekemîn hat, dema hinekan xwestin began di serdariya Partî de sazbikin. Hingê levnekirin, di Partiyê de, hate xuyakirin. Hingê milet xwe naskir û cihê xwe di xebatê de jî naskir. Ji vê dê, hevrikî di hundirê Partî de destpêkir.

Bi gotineke dî, hê çend meh, ji sala 1958 an, ser çalekiyan re neçûbû, ji bo cemawerê milet di saziya Partî de bidinhev, began (serdariya Xoybûna kevin), ne razîbûna xwe, ji vî awayê xebatê, dan xuyakirin. Û hevalbendên wan, di hundi rê Partî de û derve yê wê jî, bûn dijberên serdariyê.

Holê burjiwaza Kurd, bi nerînên xwe yên revok, ji derveyê saziya Partî, bûn dijberên serdariyê û hevalbendên xwe di hundirê Partî de, lebitandin. Lewre evên he bûn cihê gomanê. Bi van re jî, hinek meyldarî bi aliyê wan ve, ji çend serdaran, weke Dr. û Reşîd û Hemze hate xuyakirin. Lê pişt re, endamên serdariyê hemû, bihevre, xebat berdewam kirin û dijî nerînên burjiwaza Kurd, yên revok û yên bi berjewendiyên wan ve girêdayî, rawestan. Lê sîsikê wan di şaxa Dêrkê de şîn bû. Ev şaxa he, her û her asteng û problêm ji komîtiya deverê re û ji ya navendî re peyda dikir, ta komîtiya navendî neçar bû, biryar di 14. Tîrmeha 1960 î de, bi jev-xistina wê şaxê girt. Di wê demê, bi xwe de jî, komîtiyeke nû ji

Ehmedê Mela Birahîm û Ebdilqadir Gurî damezrand, ji bo saziyeke nû, bê wan kesanên berê, avabikin.

Lê mixabin piştî mehekê, di 12.8.1960 î de, desthilatan êrîş berdan Partî. Hinek ji serdariyê û gelek endam, di nav wan de, komîtiya Dêrkê jî girtin. Lewre komîtiya nû, ya şaxa Dêrkê, wext pêre nebû, da bikarê çalekiyên xwe yên nû bibe serî.

Berê me got, ku sûrye qada hevrikiyeke fireh, di nav bera hevalbendên Hevbendiya Bexda (Sênto) û hêzên nîştiman û dîmûkrat û pêşverû yên Sûryê de bû. Ev hêzên he di wê hevrikiyê de serketin. Hinek ji wan, sûrye dehfandin bal yekîtiyekê di 22. 2.1958 an de bi Misrê re.

Di vê rewşa gurkirî de, çi di hundirê sûryê, an di nav dewletên deverê de, Komara erebiya yekbûyî (ya ji Misir û Sûrye hate avakirin) bi çavên hêviyê li Iraqê, weke dewleta sisyan, di komarê de, dinerî. Ji bo vê, serdariya komarê biçavekî taybet, li Kurdan dinerî. Çinku biryara Kurdên Iraqê gelekî giring bû, di pêkanîna wê yekîtiya de. Vêca giringîk didan Kurdên sûrye jî, (me ser peywendiyên desthilatên Sûryê û Partiya me berê axavtin kirye). Kurdên başûr rola wan di çavên desthilatên komara erebiya yekbûyî de, dima giring digel hevrikiya mezin, a di nav desthilatên iraqê, Ebdilkerîm Qasim (yê yekîtî bi Misrê re nedixwest) û Ebdilselam Arif de (yê bi yekîtiya Misrê re bû) heyî. Lê Ebdilkerîm Qasim zora wan bir, nemaze dema serheng Ebdilwehab Şewaf, di meha Adara 1959 an de hewilda, ji Mûsilê serhildanê dijî Ebdilkerîm Qasim bikê, lê hevalbendên Ebdilkerîm Qasim, di nav wan de Kurd, Şewaf kuştin û hewildana wî, di cih wê de herifî û têkçû. Li vê dê, rewş hate guhertin û belkî, hêviya yekîtiyê jî ne ma. Lewre helwest ji Kurdên sûrye jî, hate guhertin.

Desthilatên sûryê li serdariya Partî û kadroyên wê tengkir. Berê jî dû endamên komîtiya navendî, Hemze Niwêran û Şewket Henan, bi bargomaniya komonîstî, di sala 1959 an de, dema komonîst girtin, ew ji girtin û kirin girtegiha Mez ê de, li Şamê û bêhtirê şeş mahan, man girtî. Di wê demê de mebahisan Reşîd Hemo jî, xwestin bal xwe û gelek pirs jê kirin û jê xwestin ji mala xwe dûrnekevê (sê mehan ma bi wî awayî). Berê vê komîtiya navendî, biryar standibû, ji bo endamên wê, xwe amadebikin, ji

Institut kurde de Paris

bazdan û veşartinê re. Û biryar da bû bi veşartina Hemîdê Hacî Derwêş li Cizîrê û Reşîdê Hemo li Helebê û Çiyaye Kurdan û Osman Sebrî li Şamê. Di vê dema teng de, Mihemed Elî Xoce û Xelîl Mihemed û Cegerxwîn, di meha nîsan û gulan 1959 an de, ji tirsa hovîtiya mebahisan, xwestin ji sûryê dûr bikevin û herin Kurdistana Iraqê. Di van deman de, hikûmetê xwest hilbijartinê, ji bo, el Itîhad el qewmî çêkê. Weke berê jî me got, serdariya Partî bi began re civînkir û li ser beşdariya wê hilbijartinê levnekirin û jev dûrketin.

Û holê Partî, bi awakî eşkere, xwe kir rikberê desthilatdariya serok Cemal Ebdilnasir û bi rex komonîstan rawesta.

Lê çima Partî ev helwesta he girt ?

Partî dijî yekîtiya sûrye û misrê, weke komonîstan, nesekinî. Lê biryara hikûmetê, bi jevxistina partiya xwe, nebir serî. Xwe didît, partiyeke Kurdiye û nîştimaniye. Hinek armancên wê bi netewa Kurdî ve ne û hineke dî bi rewşa sûrye, ya ramyarî ve ne. Mafên netewî yên miletê Kurd li Sûryê dixwazê û dîmûkartî û pêşverûtî ji sûrye re dixwazê. Çinku ev tiştên he li sûryê, ji Kurdan re û ji xeynî wan re jî nînin. Tenê zordarî li ser Kurdan heye û mafên wan yên netewî winda ne û dîktatorî liser welêt belav bûye, ne azadî û ne dîmûkratî nînin, lewre ev helwesta he girt.

Lê digel vê helwestê, pirsek di nav hin hevalan de digereha, ew jî, ji hevalên komîtiya devera Helebê bû. Ji bîroya siyasî pirsîn: Heger Partî netewiye û dijberê desthilatane, çima hevalên wê nayên girtin ?

Diyar bû, ev pirsa he, ji komonîstan hatibû.

Vêca ez dibêjim, belkî weke vê gotinê, hiştibê serdariya Partî, ewa me berê, li ser wê got, ku xwe dida xuyakirin ku şoreşgêre, markisiye, lewre helwesteke hişk dijî desthilatiya Ebdilnasir girt.

## Girtina hevalên Partî, di 12. Tebaxa 1960 î de

Partî di xebata xwe de, ji bo sazkirina cemawerê milet, gavên fireh avêtin. Cemawerên milet hemû bibûn endam an dost. Her nifş û telaş û çînên milet di rêxistinên wê de hebûn. Eva he hiştibû, yê neteweperest û yê niştiman û yê kevneperest û pêşverû bihevre

bin. Ev hevaltî ji bo demeke kurt çêdibû, lê ne ji bo herdemî. Lewre yasa hevrikiya dijîtî, rola xwe, di vî rengê yekîtiya berçav, yekîtiya îdiolocên dijî hev leyist û levketin. Ez dibêjim, demek dirêj nebû, di navbera damezrandin û firehbûna saziya Partî, ji alîkî û girtina serdariya Partî û gelek hevalan, ji aliyê dî ve, da serdarî bikarê, nerînên hevalan yên siyasî û ramanên wan nîzîkî hevbikê û ew cidahiya heyî, di nav wan de, tengbikê (26).

Lewre girtin bû fersendek, ji bo peqandina girêka jehirday î û belavkirina levnekirina di nav wan de heyî û bû sedemê parçebûna partî û pijlandina yekîtiya wê, ya terorîzma mebahisan û peyketina zilamên wan, ji hevalên serdariyê û yên din re, nekarî bû Partî jevbêxê.

*Hevpeyv û pirs, li cem (mebahisan)*

Piştî hevdîtin û pirsên karmendên (pirsdarên) dezgehê parastinê û yê dadewerê tenha yê leşkerî, li Helebê, ji girtiyên Cizîrê û Helebê û Çiyayê Kurdan û kopanî û Samê dawî bûn, berê 32 sih û dû kesan, dan dadegeha leşkerî li bajarê Şamê.

Hate xuyakirin ku saziya Partî li Helebê û Çiyayê Kurdan hemû û gelekî kêm li Cizîrê, ji dezgehê parastinê hate nasîn û mekînên nivîsandinê û çapê hatin girtin.

Mebahisan, xwendekarek ji Kopanî, endamê Partî, ji xwe re dîtibûn û kiribûn zilamê xwe û bi rêya wî gelek tişt zanîn Alîkariya wan, roja înê 12. 8. 1960 î, di girtina hevalan de kir. Û bi girtiyan re jî, çû girtegihê û gotinên di nav girtiyan de dihat kirin, ji karmendên mebahisan re dibirin. Ev karê wî yê qirêj û awayên êşandinan, hiştin heval jevbikevin û berxudana wan qels û sist bibê, an nemînê û her tiştî bêjin.

Piştî dû endamên komîtiya devera Helebê, Ehmed Henan û Hesen Osman, ji berxudanê ketin û hertişt gotin û navên hemû hevalan dan, dora Reşîd Hemo, endamê bûroya siyasî hat. Ew berpirsiyarê saziya hundirê Partî bû û yê peywendiyan bû û yê çapê û mekînên wê jî, bû.

Vêca, ji bo mebahis hertiştî li ser Partî bizanê, Reşîd û herd û hevalên din, ji xwe re kirin armanc.

Reşîd dinav koma kesên di destpêkê de hatin girtin bû. (ez jî yek ji wan bûm). Cihê girtina wan, bû xefik ji bo girtina hevalên Helebê. Mebahisan Reşîd gelek êşandin û tiştek ne got. Lê mebahisan herdû hevalên jevketî, Ehmed Henan û Hesen Osman, hemberî wî xistin û hertişt pêşya wî gotin, ew jî neçar bû, weke wan, hemûtistan, weke navên hevalên xwe û cihê mekînên nivîsandinê û xeynî wan jî, ji mebahisanre bêjê.

Lê dektor Nûredîn Zaza serokê Partî û Osman Sebrî, sekreterê Partî, piştî sê rojan, li Şamê hatin girtin û anîn Helebê. Behra van ji êşandinê ne weke ya Reşîd û xeynî wî bû. Çinku tistên bi rêxistina Partî ve girêdayî, Reşîd ji van re gotibû tiştek ji bilî yên siyasî nema bû. Lewre sê roj dan wan, ji bo rapora xwe binivîsin.

Hevalên din, yên deveran û şaxan û komikan, piştî, wan jî, lêdana xwe dixwarin, ew didan rûyên hev û ji wan jî, gotin û erêniya wan bi endamîtiya Partî dikişandin. Û dema xwe hişk dikirin û tiştek ne digotin, hevalên wan yên jevketî didan rûyê wan, ew jî jev diketin, tiştên li cem wan heyî digotin. Holê mebahisan gelek awa bi kar anîn, ji bo bighin daxwazên xwe û gihanê jî.

Dûre pelkên (ekta) 32 sih û dû kesan rêkirin dadegeha leşkerî li Şamê, cinku leşkerek (Mihemed Elî Heso) û polîsek (Horo) di nav girtiyan de bûn.

**B - Levnekirina girtiyan**

Piştî mebahisan li Helebê, pirsên xwe bi girtiyan re dawîkirin, girtî guhestin dadegeha leşkerî li Helebê. Levnekirin di nav serdariyê de, di dawiya meha Tebaxê de, li cem dadwerê tenha ye leşkerî li Helebê, serê xwe hilda.

Yên girtî, 32 sih û dû kes bûn, ji gelek cihan bûn. 7 heft ji Dêrkê (el Malikiye), 4 çare ji Qamişlo, 6 şeş ji Kopanî, 13 sêzdeh ji Helebê, 2 dido ji Şamê.

Dr. Nûredîn Zaza serokê Partî, yekemîn kes bû, ket oda dadewer de. Piştî demekê derket, bi dengekî nizim, ji hevalan re (ez yek ji wan bûm) got, ne bêjin ku armanca me "Azadkirin û yekirina Kurdistanê ye "weke çawa di pirograma me ya siyasî de heyî. Osman Sebrî, lê vegerand û got: na, ez nabêjim nîne, êzê bêjim di

pirogramê me de heye (27) Ji vê dê, çirûska agirê levnekirinê, di nav girtiyan de, pêket. Û fireh bû û kûr bû, nemaze piştî hin tiştên din jî, di nav wan de derketin û girtî kirin dû bir:

1- Reşîd Hemo, Mihemedê Mela Ehmed, Mela Mihemedê Neyo, Seydo Ersilan, Kemal Cemîl Seydo û Mihemed Elî Heso, bi Osman Sebrî re bûn.

2- Birê didwan, 25 bîst û pênç kes, bi serokatiya Dr. Zaza bûn.

Ev levnekirna he, giha guhê serdariyê û hevalan derveyî zîndanê. Hemûwan piştevaniya helwesta Osman û hevalên wî kirin. Û ya Dr. û hevalên wî dîtin şaşe. Bi vê re jî, giha guhê serdariya Partî li Iraqê. Wan jî piştevaniya helwesta Osman kirin û ser singa rojnama xwe nivîsandin, " Azadî ji Osman Sebrî û hevalên wî re ". Û navê Dr. Zaza, digel ku ew serokê partî bû, ne anîn serlêvan. Dadegehê bargomanên mezin bi girtiyan ve kir. Lê digel vê jî, biryara, dadegeha parastina dewletê ya leşkeriya bilind, sivik bû, nav bera sê mehan û 18 hijdeh mehan zîndan kirin bû (28) .

Piştî dadewerê tenha yê leşkerî li Helebê, pirsên xwe bi girtiyan re dawî kir û giha ku azadkirin û yekirina Kurdistanê, ji armancên Partiyê ne û Kurdistan bi sê seriyan dikeve sûryê de, (weke Osman jêre gotî), kaxezên (ekta) van 32 girtiyan, bi wan re, di 6. 9. 1960 î de, guhezte cem (nayib el am) ê leşkerî li Şamê. Vî jî ew bargomankirin bi gelek bendan, weke:

1-Dixebitin ji bo parçekî ji Sûryê veqetînin.

2-Nijdperestî gurdikin.

3-Endamin di partiyeke bê erêniya dewletê û hin tiştên din jî û di dawî de, mirn, an demek dirêj, ji wan re xwest.

Vîjî (nayib el am) ekta van bargomanan rêkir bal dadegeh a parastina dewletê, ya leşkerîya bilind, li Şamê.

Ji dema gihan Şamê, ta 12. 11. 1960 î de, dema ew dan dadegehê, levnekirin di nav herdû biran de, zêde bû û jev dûr ketin.

Ji bo durişma (azadkirin û yekirina Kurdistanê) herdû alî gihan, bê goftûgo li ser çêbê, ku serdarî kete şaşiyekê de, dema ev durişma he di rêzana xwe de nivîsand û herdû aliyan dîtin ev duruşma he divê bê guhertin. Sebvê, hêdî herdû aliyan, li ser wê deng ne kirin.

### C- Pelika xwevekişandin ji Partî

Piştî girtî hatin girtegiha Mezê li Şamê û bendî dadekirina xwe bûn, gotinek hate belavkirin, ew jî, belkî, dezgehê parastinê (el mebahis) ji dêlî wan bibê ber dadegehê, pelika xwevekişandinê ji Partî, ji wan bixwazê (29). Weke çawa bi endamên partiya komonîst re dikir.

Heger berî vê gotinê, hinek xweşî, di nav girtiyan de mabû ew jî çû. Derza heyî, firehtir û kûrtir bû, rikberî di nav herdû aliyan de xurtir bû, bazdan û xwegirtin û berxudana xebatker, baş bi vê re, hate xuyakirin.

Husên Sîracedîn, parêzerê (bervedêr) Dr. Zaza û Mecîdê Haco, ji Helebê bi wan re hate Şamê. Ji bo bergiriya wan, ber dadegehê bikê. Vî zilamî, li Şamê, xwe gihand serokê giştî yê dezgehê parastinê û pêşniyarî wî kir, ku pelika xwe vekişandinê ji Partî, ji girtiyan bistîninin, şûna wan bibin ber dadegehê. Evî jî (yanî serokê dezgehê parastinê) soz da, ku vê pêşniyarê bighînê serokê wan, şalyarê hundirê welêt, Ebdilhemîd Serac.

Dema ev parêzerê he hate girtegiha Mezê, Dr. û Reşîd dîtin, ev gotina he ji wan re got. Van jî, ji havalên xwe re gotin Vêca agir kete pêsîra wan. Osman û Reşîd, cih de, ji Mecîd û Dr. xwestin wî parêzerî, zilamê parastinê, ji xwe dûrbikin û nekin parêzerê xwe. Lê van evahe nekirin. Vêca goman ew bû, ku zilamên mebahisan, navbera katjimarekê û ya dî de, bên û wê pelikê ji girtiyan bixwazin.

Girtî bûn weke ser agir, nerehetîk di canên wan de livî û ew hejandin, ne zanîn çi bikin. Dana wê pelikê, ji endamekî partîzanî ne raste, gunehekî mezine. Saziya partî dike bin lingê xwe de, yanî ji xebatê bazdidê.

Ji bo girtî bighin biryarekî, dan û standin di nav wan de çêbû.

Hebûna sê endamên bîroya siyasî, ji serdariya Partî, Dr. Zaza seroke Partî û Osman Sebrî sekretêrê wê û Reşîd Hemo endamê bîroya siyasî, dikarin wê biryarê bigrin. Girtî hemû wan berê xwe dan wan, hêviya gotina wan bûn. Weke çawa derveyê zîndanê serdariya wan dikirin, gereke li vê dê jî bikin.

Osman û Reşîd erêniya xwe dan xuyakirin, lê Dr. eva he ne kir û got: "serdarî li vê dê nîne, ji dema em hatin girtin, em neman serdar, serdarî derveyê zîndanê ye, yê bixwazê pelikê muhr bikê, bila bikê û yê nexwazê, bila muhir nekê". Heval li vê dê man şaş. Çi bikin? Hember vê helwestê, Osman pêşniyarek kir, ew jî: Heger serdarî nekarê bixwe, wê biryarê bigrê, bila dû endamên komîtiya deveran, lixwe, hersiyan, zêde bikê, da bighin wê biryarê". Lê Dr. bi vê jî nekir û got her yek azaye, çi helwestê digrê bila bigrê.

Hember vê, Osman Sebrî, Reşîd Hemo, Mihemedê mela Ehmed, Seydo Ersilan,kemal Cemîl Seydo, Mela Mihemed Neyo û Mihemed Elî Heso bihev re biryar standin, ku pelika xwevekişnadinê ji partî nedin û wê muhir nekin û tu kes ji wan karekî bitena xwe nekê û bimînin bihevre. Ev helwesta he, yên din, kir di tengahiyeke nexweş de. Lewre Dr. pêşniyarek nû kir, ew jî: komîtiyek ji hemû girtiyan damezrînin, biryara dan, an nedana pelika xwevekişndinê, di destê wê de bê. Ew komîtî ji van kesan bê: Yek ji Dêrkê, ew jî Newafê Nayifê Mistefa paşa, serokê eşîra Koçeran. Û yê didwan ji Qamişlo, ewjî Mecîdê Haco. Û yê sisyan ji Kopanî, ew jî Mistefa Birahîm. Û yê çaran ji Helebê, ew jî Şewket Henan. Yê pêncan ji çiyayê Kurdan (bi nav ne kir). Û hersê endamên bîroya siyasî Dr. Zaza û Osman û Reşîd, komîtîk şêwirdar ji vê komîtiya nû re bin. Osman û hevalên xwe dijî vê komîtiyê bi xurtî rabûn. Û gotin em partîzanî ne, xwe nakin bin destê hinek ne ji partî. Û xwestin endamên bîroya siyasî bi vî karî rabin, weke çawa derve yî zîdanê bikaran radibûn û dû endam ji komîtiya deveran, lixwe zêdebikin. Çinku wan dîtin, ne raste, endamek ji partî, fermanan ji kesekî ne ji partî bistînê, weke van kesan, yên guh nadin berpirsiyariya partîzanî. Çinku ew ne endamin di partî de. Em binêrin ka ev kîne: Newafê Nayifê Mistefa paşa, ew û hevalên xwe, li Dêrkê, dema serdariya partî şaxa wan jevxist, ew ji Partî dûrket. Mistefa Birahîm, hevalên Helebê dibêjin, ku ew nebiwe endamê partî. Şewket Henan, rawestaye, gora biryareke Partî. Meçîdê Haco, ew tenê endamê partî bû, lê ew jî eşkere dixwazê pelika xwevekişandinê bidê. Hember vê pêşniyara Dr., Osman jî pêşniyarek dî kir, ew jî: ku heryek aza ye, yê bi xwazê bidê, yê ne

xwazê bila ne dê. Lê hemûwan, yên bi wîre û yên aliyê dî jî, bi vê razî nebûn.

Holê, bihevre ne gihan biryarekê. Osman û hevalên xwe di dîtin, ku kesên dora Dr., nemaze Mecîdê Haco û Şewket Henan, wî didehfînin bal vê helwestê, ji bo xwe ji biryara dadegehê ya giran xilaskin. Dr. bi xwe jî, dixwest bi rê ya wan xwe xilaskê, lewre ew helwest girtin.

Holê mixabin me dît, ev gotina dana pelika xwevekişandinê ji Partî, bû bûyerek dilêş, bû sedemê parçebûna hevalan û hişte endamên partîzanî ji yên nepartîzani, bên xuyakirin.

**D- Ber dadegehê**

Piştî astenga, pelika xwevekişandinê ji partî, dilê wan êşand, ew jev dûrkirin, derzekî kûr di nav wan de peyda bû û ew kirin dû bir, giha radekî hinek ji wan, ji herdû aliyan, bi hevre ne diştexilîn.

Lê desthilatan guh ne dan birina pelikê ji girtiyan. Di 12. 11. 1960 î de ew dan dadegehê. Dema dadewer dest bi karê xwe kir, Dr. jê xwest, bê ji hevalên xwe re bêjê, parêzerek ji xwe re bigrê, Mecîdê Haco û Newafê Nayifê Pasê jî, parêzerek ji xwe re xwestin. Ev kirna wan, hişte hevalên din, di xwe de bi ramin, gelo rewşa wan, bê parêzer, bi van bargomanên giran re, yê çibê. Gelo ev awayê he, raste bê kirin? Dema yê xebatker, şoreşgêr di tengîkî de bê, yê zû destê xwe dirêjî parêzer bikê? Hevalên din bixwe hesehan, ku hemû, ne ji nifşekî ne, ne ji çînekî ne, hevaltiya wan di gomanê de ye, nerîna wan, li ser hevaltiya Partî ne yeke. Her yek ji wan li dinyekê dijî.

Kesê yekemîn yê dadewer pirs jê kir Dr. Nûredîn Zaza serokê Partî bû. Dadewer, serokê dadegeha parastina dewletê ya leşkerî ya bilind, jê pirsî: Gelo, ji armancên Partiye, veqetandina parçekî ji Sûryê? Dr. di bersiva xwe de, got na. Dîsa jê pirsî: gelo, Partî dixebitê ji bo nijadperestiyê di nav Kurdan de belavbikê û dijminatiya ereban bikê? Dr. got na. Dîsa jê pirsî gelo tu (yanî Dr.) piştevaniya dewleteke Kurdistanî dikî? Dr. got, eva he ramaneke dûre. Lê parêzerê wî (Husên Siracedîn gotina Dr. Zaza timamkir) ku, ev ramana he xewne. Dr. jî got belê, xewne. Dr. berdewam kir,

ku ew piştevaniya dewleteke Kurdistanî li Tirkiye de dikê, (Dûre xuyakir, ku Dr. ev gotina he, li cem dadewerê tenha yê leşkerî li Helebê jî gotibû û ji hevalên xwe re ne gotibû, ku min ev gotina he gotiye) dîsa dadewer jê pirsî, gelo Partî, partiyeke siyasiye? di bersiva xwe de got: na, Partî civateke, ji bo mafen çandî û civakî tenê dixebitê, tu armancên siyasî naxwazê. Dadewer jê pirsî, gelo ev rêzana he û armancên wê (destê xwe bal rêzana Partî ve kir, ewa li ser masê pêşiya wî bû), ya civateke çandiye? Dîsa Dr. got belê, ya civateke çandiye, ne ya partiyeke siyasiye.

Piştî ji dadegehê vegerehan, hevalên wî jê pirsîn, çima te got ku dewleta Kurdistanê xewne? Li wan vegerand ku: ez ne don kîşotim, ta ez di xewnan de bijîm.

Berê wê, Osman ji Mecîdê Haco re gotibû, bêje Dr.(çinku Osman û Dr. bihevre ne diştexilîn): heger ew li dadegehê bêjê, Partî civateke çandiye, emê wî, li wê dê derewker derxin. Mebesta Osman ew bû, ku Dr. wê gotinê ne bêjê, lê got.

Hember vê gotinê, Osman û hevalên xwe, bi sedema gotina Dr. ku Partî civateke çandiye, wan levkirin ku ne bêjin wata gotina Partî çiye, tenê bêjin em ji Partî ne. Ji bo levnekirina xwe ji dadegehê re, nedin xuyakirin. Dema dora Reşîd Hemo hat, wî jî, ji dadewere got ku Partî civateke çandiye. Û dema dadewer jê pirsî, tu piştevaniya dewleta Kurdistanê dikî, an na? got na (weke Dr. gotî). Di vegerê de, hevalên wî jê pirsîn çima te got Partî civateke çandiye û tu piştevaniya dewleta Kurdistanê nakî? got min nexwast, ji dadegehê re bidim xuyakirin ku em nelevin, lê ez şaş bûm. Lê Dr. digot, na, helwesta min raste. Dema dora Osman hat, got ew piştevaniya dewleta Kurdistanê dikê, dilê wî bixebata Kurdan, di Kurdistanê ve ye û ji armancên Partî li Sûryê, Kurdan di yekîtiyekê de bidehev û daxwaza mafên wan yên civakî û çandî dikê. Û berê vê jî, gotibû ku Kurdistan bi sê seriyan dikeve Sûryê de, li Cizîrê û kopanî û Çiyayê Kurdan. Û dema jê pirsîn çi wata gotina Partiye, Partîyeke siyasiye, an civateke çandiye? got ez nizanim, hûn bi çi wateyî ji xwe re şirûv dikin bikin. Û got heryek bixwazê ji Sûryê cida bibê ew xayine.

Girtî hemû, ji dektor ta yê dawî, li ser ne wekhevyê û nebûna dîmûkratiyê, di têkilyê desthilatan bì Kurdan re, di gotin. Serokê

dadegehê ji wan dipirsî ser nemûnên ne wekheviyê, ji bo li wan teng bikê. Lê dema wan gelek nemûne tanîn, ew aciz dibû û denge xwe li wan bilind dikir. Serokê dadegehê ji Dr. Xwest raporek bi bûyerên ne wekheviyê û zordariyê, jê re binivîsê.

Serokê dadegehê ji hevalên din, ser karên saziyê û peywendiyên partîzanî dipirsî.

Di wê demê de, parezerek ne nas, hate cem Osman û jê xwest, bê pere, bibê parêzerê wî û hemû girtiyan û di dadegehê de bergiriya wan bikê. Di nav gotinên xwe de, da xuyakirin ku ew ji cem desthilatan hatiye. Ev desthilat dibêjin ku xilasbûna te li cem me giringe û divê tu ji zîndanê derkevî, lê dibînin ku ev dewleta he ser binyatê yek netewe rabû ye (yanî netewa Kurd nîne). Û desthilat dibînin ku xwestina we ji mafan re, ne gunehekî mezine (cerîmete). Lê Osman bigotina wî razî ne bû û ew ne kir parêzerê xwe (31) .

Yanî desthilatan ji Osman û hevalên wî û hemû girtiyan, di xwestin bêjin, ku Kurd li Sûryê ne neteweki serbixwe ye, lê ew kêm netewe ye. Da cara didwan serbikevin. Vê carê bi rêya Osman û hevalên wî, piştî serketina wan ya yekemîn, dem a karîn bihêlin Dr. bêjê ku Partî civateke çandiye, ne partiyeke siyasiye.

Dûre emê bibînin, piştî salekê, çawa ev gotina netewe, an kêm netewe û Partî siyasiye, an civateke çandiye, çi roleke mezin di levnekirina hevalan de û di gurkirina rikberiyê, di nav wan de bileyizê û dibê sedemê parçebûna Partî, di sala 1965 an de.

Yanî levnekirina girtegehê, hat derveyê wê jî û heval hemû ketin bin siha wê de û bû sedemê parçebûnê.

Di hundirê girtegihê de, di nav wan de kûrbû, ta radekî, her aliyek ji xwe re diramand, ku yê bi kîj endamî re, dema ji zîndanê derkevin bixebitê. Hevalên Dr. welê ji xwe re digotin, yê kî bi wan re bimînê û yê kî bavêjin derveyê saziyê Evahe jî, ji gotina Dr. Zaza hat, dema ji Osman re got: kû "roleke te hebû û çû". Û "bila neyê bîra te, piştî îro, tu bibî endamê komîtiya navendî". û "cihê wî di Partî de, nema heye". Lewre hevalên wî lîste bi navê hevalên xwe û yên wan ji Partî bavêjin, dinivîsîn. Hinek ji wan didîtin, ku ev cemawerê gelek, ji Partî re, ne gereke, hêjmarek hindik bese . Û divê bi began re bixebitin û armancên Partî gereke tenê yên çandî û

civakî bin. Lê Osman û hevalên wî, digotin ku ew û serdariya Partî, derveyî zîndanê, bihevre ne, yek bendin, dijî helwesta Dr. û hevalên wî ne.

Di vê demê de, dema girtî ber dadegehê bûn, desthilatan li Qahîrê, tozikeke (destûr) herdemî ji herdû herêman re dinivîsîn, vêca Dr. Tilgirafek, di destpeka sala 1961 ê de, binavê xwe nivîsî û ji wan re rêkir û ji wan xwest ku li Kurdên herêma jorîn (yanî Sûryê) weke miletekî binêrin û mafên wan yên netewî jî, di tozikê de binivîsin. Lê bersiva desthilatan, lêdan û eşkince, ji girtiyan re bû (32).

Dr. Zaza, bîrnamek, gora daxwaza serokê dadegehê, li ser bûyerên zordariya desthilatan û newekheviya dan û standina wan bi Kurdan re, bi alîkariya hevalên girtî, nivîsand û da wî. Li jêr, reşa nivîsandia wê bîrnamê ye:

Birêz serokê dadegeha parastina dewletê, ya leşkeriya bilind.

Gora daxwaza we, di rûnistina berê de, ya di 31. 12. 1960 î de, ji bo dadewerkirina me, di dadegeha we ya birêz de, ez daxuyaniyek pêşkêşî we dikim, têde wan bûyeran, yên siyaseta nijadperestî, li ser Kurdên herêma bakur, ji komara erebiya yekbûyî, bikar tênanîn, didim xuyakirin. Hêvîdarim ku bibe rêyek, ji bo têgihiştina we ji rewşa gelê Kurd, di herêma bakur de û bibe hincet ji me re, ku me hemûwan, ev rêya tevayî girtî, ji bo bighin mafên xwe yên miletî û mirovanî.

Ez dixwazim we agahdar bikim, ku di vê rewşa ez niha têde nikarim bidim xuyakirin, ji bilî sernavên hin bûyerên tên bîra min û ta niha berdewamin.

Ezbenî, digel ku bûyerên cidayetî û nijadperest, di gelek waran de û bi gelek awayan tên bikaranîn, lê berî bûyeran ber çavê we rêxim, ez di xwazim bidim xuyakirin sedemê serekî yê dihêlê ew bûyer bên kirin. Ew sedem jî eve:

Di herêma bakur, ji komara erebiya yekbûyî de, rastiya hebûneke berçav û babetî, ji gelê Kurd re heye, ewê ji kevnare de ta niha, li ser erdê xweye, bi rex birayên xwe yên ereb, di komara erebiya yekbûyî de dijî. Ew mileteke, ziman û adat û kevneşopên wî, yên taybet hene û ew parastin û dilê wî bi wan ve ye. Û li ser zimanê xwe û adatên xwe dixeyidê. Û binyata wan, çi stran an

helbest an mûzîk parastin. Ev ziman di sipehîtiya xwe de û dewlemendiya xwe de, ji xeynî xwe, ji zimanên cîranan, ne kêmtire. Û milet ji kevnare de, ta niha, ma pê girtî û xweşiya wî parast.

Kurd bûn misilman lê zimanê xwe winda ne kirin û welê jî, adat û kevneşopên xwe jî.

Û niha, em di vê demê de, ji jiyana mirovantiyê, ya bixurtî dixebitê ji bo hevkarî û têgihiştinheva miletan, da pêşveçûnek geştir ji bo mirovan pêkbê û aştî û rûmeta miletan, di cihê layiq de deynê û bilind bibê.

Weke min got, ku zimanê miletê Kurd û kevneşopên wî, di rojekê ji rojan de, ne bûne jêderên cidatî û levnekirinê, di nav ereb û Kurdan de. Û hemû kongir û konsoyên civakî, çi yên dewletan, an yên gelêrî, taybetmendiyên miletan, kirne mafne rast û gerek, ji wan re. Lewre ji erkên dewletan û gelên pêşketî, ne tenê, piştevaniya wan bikin û wan biparêsin, lê wan, pêşde bibin. Li serserê van civatan û kongiran: Civata giştî ya miletên yekbûyî, ewa di peymana xwe de, kuştina çanda miletekî kirye, weke gunehekî mezin (curmeke) bi tole û weke çawa di van kongiran de hatiye gotin (kongira Bandong û kongira hevgirtina miletên Asye û Efrîke li Qahîre û bêhtirên kongirên serok Cemal Ebdilnasir, di wan de amade dibe). Van mafan wekat dikê û dixwazê xewstekên wan û hebûna wan bên rêzgirtin. Û ez dibêjim, ku piştî serok ji seredana Sûdanê vegereha, daxuyaniya herdû serokan digot ku: "Her siyasetek, bi sedema reng an nijad an bawerî, miletan bike bindest û kole û ji rometa mirovan kêmbikê, em wê pirotisto dikin"

Min got hebûna Kurdan ya babetî û berçav, di herêma bakur de û hebûna wan peymanan û daxuyaniyan, yên derketin û der dikevin, ji konsoyan û kongirên dewletan û gelan, ewên komara erabiya yekbûyî endamê wane û aliyek ji wane, dihêlin mafên Kurdan, yên welatiyên komara erebiya yekbûyî, di ziman û xeynî wî de, mafne rast bin. Divê çav ji wan neyê girtin, an pirotistokirin. Vêca ev hebûna he, ji alîkî û çavgirtin û pirotistokirina mafan, ji ser miletê Kurd, ji aliyê desthilatan û meş liser siyaseta windakirina van mafan û bişavtina Kurdan û windakirina wan, dinav ereban de, bi her awayî, ji alîkî dî ve, dihêlê siyasteke nijadperestî bê afrandin. Ev siyaseta he binyata hemû cidatî û ne wekhevî ya heyî

ewa ezê hinek ji bûyerên wan berçavbikim. Ezê sê xalan bi dim berçavên we, hêvîdarim ku hûn wan, bi giringî bigrin:

Di van nîrên dîrokîyên pêşketî de, mafên miletan, ne tenê mane biryar û daxuyanî, di rûpelan de tên nivîsandin û di ektan de tên parastin, lê belê, di gelek welatan de, yên gelek netewe û gel, di wan de heyîn, bikar tên anîn, weke: "Yogûslavye, Siwîsre, Belçîke û Kenede, Iraq, Efganistan, Hind, Endinûsye, Yekîtiya Sovyatî û Çîn. Van welatan, ji vê wekheviya di nav gelên xwe de bi karanîn û hiştîna hemû mafên wan bi destê wan bikevê, gelek sûd û feydên siyasî û rewanî û abûrî û civakî û çandî girtin. Bi vî awayî astengên nav xwe de, bê nexweşî û sergêjî çare kirin.

2- Hebûna siyaseta nijadperestî, ne tenê di hêlê biratiya ereb û Kurd, jev bikevê xirab bibê, lê dihêlê tovên gomanan û ne baweriyê, di navbera gelê ereb û Kurd de, şîn bibê. Evên bi biratî û xweşî, di dirêjahiya dema tarîstana qirêj, ya Osmaniyan û Firensizan, bihevre jîn. Vêca siyaseta nijadperestî, ne tenê ziyanan biKurdan dikê, lê belê, tu sûd û feyde nagihînê ereban jî û bêhtir, bêhude, ziyanê bi berjewendiya welat dikê û astengan di hundirê welêt de di afirînê. û dijî vê, dema dest ji vê siyasetê bikşînin û mafên Kurdan, ewên demek dirêj, ji wan mayîn bê behir, bidin wan, van astengan ji kokê qutdikin û biratiya ereb û Kurdan biheve bixurtî girêdidin û jev nayên vekirin û welat bi rengê hevkarî û dîmûqrat didê xuyakirin.

3- Bi sedema jîndariya zimanê Kurdî, di nav dewletan de belav bû ye, çinku zimaneke jîndare gelêriye, gelek pêlweşînên cîhanî weke ya Qahîre, Iraqê, Iranê û yekîtiya Soviyatî, gotinên wê, tora wê, mûzîka wê diweşînin. Û di gelek xwendegehan û zanîngehan de, di gelek welatan de tê xwendin: Opsala- Siwêd, Yerîvan, Mosko, London, lînîngirad, Parîs, Iraq, Iran. Digel vê jî, gelê Kurd li herêma bakur, ji wî, bê behrin û nikarin wî bikarbînin û hestên xwe û tiştên di dilê xwe de, bi wî verêşin. Çinku hene, yên kotekî û terorîstî, dijî wî bikarbînin. Lewre evahe dihêlê miletê Kurd, ji bo zimanê xwe bikarbînê, her awayan bikê.

Vêca bûyerên te xwestin evin:

A-1-Pirotistokirina hebûna gelê Kurd li herêma bakur, rê di de karmendên dewletê, gotinên nexweş, weke şiyû`î, şi`ûbî, Kurdî, yehûdî, xayîn, bêjin Kurdan, bê tu kes devê wan bigrê. Û ev gotinên he gihan rojnaman jî. Hêvîdikin rojnamên ji Libnnanê, di sala 1958 an de dihatin û yên Sûryê û Misrê jî bixwînin.

2- Li bajarê Dêrkê, serokekî polîsan (musa`id) heye, navê wî (bavê Hesen), xelkê li bazarê (sûkê) radiwestînê û ji wan dipirsê: tu Kurdî an filehî?. Eger got ez Kurdim, pêşiya xelkê lêdidê û gotinên kirêt dibêjiyê. Û belkî wi bikê girtegihê de, Ez hêvî dikin hûn ji girtiyan: Ehmedê Mela Birahîm û Ebdilqadir Gurî bipirsin.

3- Di deverên Kurdan de, hikûmet navê cihan, ji Kurdî diguherê bal erebî ve, digel ku gelek nav ne erebî, di vê herêmê de hene, weke: Dûma, Zebedanî, Bilûdan û Heresta.

4- Di dayirên nasnamê de, kesê Kurd têtê kirêt kirin, dema navê zarokên xwe dike Kurdî.

5- Mudîrê nahiya Dirbêsiyê, welatî Ebdilhemîd Derwêş kire girtegehe de, bi sedema kum û kolozê Kurdan, da serê xwe. Hûn di karin ji xelkê Dirbêsiyê li ser zordariyên wî, di sala 1958 an de bipirsin.

6- Di encama nivîsandina rojnama El Telî`e, ya li herêma bakur de çapdibê, sernavê "Biratiya ereb û kûrdan", ew rojname hate qedexekirin û xwediyê wê, di ber wê nivîsandinê de, bû gunehkar.

B- Qedexekirina mafên ziman û çanda Kurdî, dibe sedemê girtina kesan û pirtûkan:

1- Di sala 1955 an de, pirtûka Elfebê ya Osman Sebrî, hikûmetê destdanî ser û li Osman venegerand.

2- Hikûmetê destdanî ser dîwana helbestevanê Kurd Cegerxwîn û birin û lê venegerand. Û di sala 1958 an de, pirtûka wî Metelokên Kurdan, ji çapxanê birin û lê venegerand.

3- Di sala 1957 an de, dezgehê parastinê (el mekteb el sanî) welatî Ebdilmecîd Haco girt, çinku pirtûkeke Kurdî li cem wî girtin û birin Dêrezorê û dûre Şamê û li wê dê berdan.

4- Welatî Hemze Niwêran û hin kesên din, mebahisan ew girtin, çinku hinekan bêbextî li wan kirin û gotin ku pirtûkên Kurdî li cem wan hene.

5- Di sala 1958 an de, çend welatî: Dr. Nafiz, Silêman Haco, Birahîm Metînî, Yûsif Mîrza, Ebdilhemîd Şêxmûs, Cemîl Birahîm, daxwaznamek ji bo yaneke çandî, bi navê yana Cemal Ebdilnasir avabikin, dan desthilatan. Lê daxwaznama wan nehate pijirandin. Digel ku di wê demê de, yeka Siryanan û didwên Ermenan hebûn, ji bilî xwendegehên seretayî û orte yên wan heyîn.

6- Di sala 1957 an de, sercanekî (reqîb) dezgehê parastinê, di çayxanekê de, qawanên geremafonê, yên sitranên kurmancî şikandin, digel ku gelek qawanên stranên tirkî û ermenî jî hebûn, lê yên Kurdî tenê şikandin.

C- Nijadperestî dihêlê Kurd ji mafên xwe yên welatî bêbehir bimînin.

1- Di başûrê Cizîrê de, navbera Hisiça û Tilkoçer, erdên dewletê, binavê el Red heye. Hikûmetê ew erd li cotkarên ereban tenê belavkir û neda yên Kurd. Digel ev erebên he, tu caran xwe bi cotkirnê mijûl nakin, erdên xwe, ji bo cotkirnê, bi behir, didin dewlemendên bajaran û xwe bi şivantiya pezên xwe mijûl dikin.

2- Erdên ku ereb û Kurd, li ser wan nelevin, karmendên dewletê, meyldarîkî eşkere, di rapor û dîkomentan de, ji ereban re dikin. Em vê di nav eşîra Şemer û Cibûrên ereb û Mêrsînan û Ebasan yên Kurd de, dibînin.

3- Navê bêhtirê Kurdan di defterên dayira nasnamê de nînin, ji bo wê, ji xwendin û xizmeta welêt di leşkeryê de û ji hilbijartinan û ji yasa serastkirina erdan (el Islah ez zira`î) bê behrin. Lewre dixwazin navê wan di defterên dayra nasnamê de bête nivîsandin, lê daxwaza wan pêknayê û astengan ji wan re dertînin û yê kesên ereb cihde pêktê.

4- Gelek xwendekar ji xwendegehan derxistin û nehiştin serbikevin, digel ku ew di xwendina xwe de jîrbûn. Hêvîdikim ji xelkên qamişlo weke Samî Mela Ehmed Namî bipirsin.

5- Ji devera Cizîrê re, 14 nûner ji berlemanê re tên hilbijartin , 2 dido Kurd û yek fileh û yek çaçanî û 10 deh ereb, digel ku bêhtirê xelkên wê Kurdin. Û bi vê re jî, mirov dibînê, ku eşîra Şemer 3 sê nûnerên wê hene, digel ku hêjmara wan li Sûryê ne zêdî 4 çarhezar kesin û kesê bajarê qamislo tenê, zêdî 30 sih hezarî ne. Gelo ma ne ji mafê Kurdane, bipirsin çima ev newekhevî heye.

Institut kurde de Paris

Nijadperestî dihelê hinek berpisiyar bi hin karan rabin, Kurd gelekî bi wan tên êşandin û pê dihesin ku ne cihê baweriyê ne, weke:

1-Di van her dû salên dawî de, gelek karmendên Kurd, nemaze mamostayên xwendegehan, ji kar hatin derxistin, bê tu sedem, ji bilî ku ew Kurdin û yên ne hatin derxistin, ji deverê hatin dûrkirin, digel ku karmendên ereb, yên di deverê de kardikin, pêwîstê wergerandinê bal zimanê Kurdî ve dibin. Û bi vêre jî, di vê dawiyê de, tu Kurd di instûtan de, weke ya mamostayan û di destekên hikûmetê de, ji bo xwendina derveyê welêt û di xwendegeh û kolîja polîsan de, ji bilî çend kesan, ser tilyên destekî tên hêjmartin, bê tu sedemên yaseyî hebin.

2-Di buhara sala 1958 an de, zilamekî Kurd, jina şêxekî Şemeran, Ebdilrihman Medlûl revand. Çekdarên vê eşîrê, bi tifing û metirliyozan li her dû wan gerehan. Lê di gundên Kurdan de karên xirab û kirêt kirin, muxtar û hin navdarên gund, bi şelîtan ve girêdidan û di bîran de, da dihelandin û dûre ew dinav axê de digevizandin, pêre lêdan û eskence jî hebû, ta serokê polîsên Dêrkê, ew zilam û pîrek dîtin. Vê eşîrê bizoraxwe herdû (pîrek û zilam) ji hikûmetê standin û bi keçeke biçûk re, şeş salî, ji mêrê wê, kuştin.

Hinek Kurd ji wan gundan û ji derên din jî, tilgiraf bi nerazîbûna xwe ji van xirabiyan, rêkirin Hisiça û Şamê. Evahe kirin, bisedema zordarî û xirabiya ereban a bi Kurdan kiribûn, ne ji bo jinik û mêrik bû. Çinku Kurd hê eşîrin, tiştên namûsê û adet, li cem wan cihê xwe girtine, lê ew tilgraf ji bo xirabiyên ereban bû. Digel vê jî hikûmetê xwediyên tilgrafan girtin û gunehkar kirin û ew dan ber dadegeha parastina dewletê li Qamişlo, bi hinceta ew xirabî û nijadperestiyê gurdikin. Dûre 14 zilam ji Şemeran girtin û çendekî li cem xwe hiştin û berdan, weke tiştek çê ne bûyî.

Berî ez van bûyeran dawî bikin, ez dixwazim dû bûyeran, bi min ve girêdayîne bêjim:

1- Di meha eylûla 1958 an de, min xwest ez herim derveyî welêt ji bo karê jiyana xw, çinku ez cihgirê karxanên dermanan bûm. Ez çûm balefirgihê û hertiştên min amadekirî bûn lê mixabin nehiştin ez herim karê xwe bibim serî û pasa min ji min standin. Dema vegereham, min daxwaznamek nivîsî û da şalyarê hundirê

welêt, lê wan ez rêkirim bal (mekteb el xas), van jî ez vegerandim bal şalyarê hundirê welêt û holê çend caran, ta dawî min xwast şalyar bibînim, lê evahe jî, çênebû, dawî ez tê gihiştim ku tu sûd tê nîne, min dest jê kişand. Ta niha ew daxwazname li cem mine.

2- Di meha Nîsana 1960 î de, min xwest herim germava Şêx Isa, ji bo xwe ji nexweşiya romatîzimê xilaskim. Min daxwaznamek da yê karmnd. Dema ez vegeraham, yê karmend, Mihemed el Medenî, got kû berpirsiyarên kar razînebûne bi çûna te. Û li ser daxwaznama min nivîsandin, qedexeye. Û niha, dema zilamên parastinê, hatin mala min û têde gerehan, ew pelik bi xwe re birin. Ez weke welatiyek azadim û ji mafê mine bigerim, niha dipirsim, gelo ji bilî Kurdîtiya min, sedemên nehiştina gera min, çine ?

Evahe û dehên weke wê, eşkere an veşartî, mafên welatî li Kurdan qedexe dikin û xirabiyê dighînin biratiya Kurd û ereban û hevkariya miletan û dihêlin girêkên bisîkolocî û hestên biyanî li cem Kurdan peyda bibin. Hêvîdarim ku sînorek ji wan re bête danîn. Û nerîneke babetî, birastiya hebûna wan ve, weke miletek Kurd, bê nerin. Û li wan weke welatiyên komara erebiya yekbûyî, lê Kurd, binêrin. Û bawerî li cem berpirsiyaran çêbê, ku rêya çarekirna daxwazên milete Kurd, di herêma bakur de, ne girtin û zîndan û êşandine, lê nerîneke nû, ji vê rewşa mere, a em têde ne û çareke rast ji daxwazên Kurdan re, yên normal û babetî ne, divê. Û dadeg-eha we ya bilind, yê roleke xwe erênî, di piştevaniya sitembaran û bê behran de bileyizê û yê rastiya tehil, ber çav bikê û yê sedemên paqij û pak, yên vî karê me yê bargoman, ber çav bikê.

Nûredîn Zaza

Ev nivîsara jor, weke çawa di reşa bîrnama Dr. Zaza de, ji bo serokê dadegeha parastina dewletê ya leşkeriya bilind, li Şamê hatiye, min nivîsiye.

Nêrîna min

------------------:

Holê girtina hevalan, gelekî li ser Partî giran hat, da xuya-kirin, sistiya binyata wê, ya hîmê xwe li ser dijîtî avakiribû û dema

derb xwar, cihde hejeha û herifî. Û da xuyakirin ku hestên netewî, ne besin, ji bo avakirina partiyeke siyasî û dilsozî ne bese, ji bo wê biparêzê. Hebûna gelek çîn û îdiolocên ne wekhev, di Partî de, hişte çend caran, di çend nîran de, dema berjewendiyên wan bûn dijîhev, levbikevin:

1- Bi burjiwaza Kurdî re (beg), serokên kevnar, di sala 1958 û 1959 an de levketin. Hingê me dît hinek ji serdariya Partî, ya me got kû çepe, bi wan re girt û xwest serdariya Partî bi destê wan xê. Evahe ne wate wê ye, ku yên din, ji çepîtiya wan, ne xwestin wê bikin. Pêla dixwest biwan re karbikê xurt bû, yên karîn xwe di rûyê wê de bigrin kêm bûn. Lê ev burjiwaza he, zû pelika xwe da xuyakirin, nemaze dema dinya bû tarî û girtin çêbû, xwe da alî. Weke çawa herdemî dikir. Çinku wê zanî bû, ku dora Partî yê bê. Bi vê re ji, di nav hevalan de pêlek hate xuyakirin, ku ramanên burjiwazan hildigirt. Eva he nîşan bû, ku yê hevrikiyek mezin di Partî de destpêbikê. Û dûre hate kirin. Çinku hin der hebûn, hevalên burjiwazan têde peyda dibûn, dixwestin wan ji xwe re bikin serok, weke Mecîdê Haco û Mihemed Fexrî, di komîtiya devera cizîrê de, nemaze Mecîd (33), yê dikir ku hevalên şaxa Cerahê, cihê eşîra wî, piştevaniya helwesta began bikin. Û holê jî di şaxa Dêrkê de, hevbendên wan peydabûn. Ji bo van ramanan û dûre helwesta wan, ew ji Partî hatin dûrkirin.

2-Di zîndanê de, rê ne bû, ku yek bikarê helwesta xwe veşêrê, hemû neçarbûn helwesta xwe bidin xuyakirin. Di nerîna min de, serdarî di helwesta xwe de, revok bû. Çinkû:

- Saziya Partî, nemaze li Helebê û Çiyayê Kurdan, serdestê wê belû bû.

- Di helwesta xwe ya siyasî de: serdarî, an hinek ji wan, ber rêzana xwe ya siyasî de, nedan, devjêberdan û jê bazdan. Rêzanek, berî, kêmî dû salan, serdariyê bixwe, ew nivîsî. Çima jê bazda? çi hate guhertin?

Gelo nîrên babetî û xweyîtî, di vê dema kurt de, navbera salekî û salekî de, hatin guhertin, ta bibê sedemê dest ji rêzanê berdin.

An serdarî ne serwext bû, ne têgihiştî bû, ta bikarê armancên Partiya xwe, bi zanebûn deynê. Reşîdê Hemo dibêjê: Rewşa dîmûkrat, di sala 1957an de û berî wê, li Sûryê û rola dezgehê

ragihandinê li ser pirsa Kurdî, hişte bi wê rêzanê bigrin. Lê di dawiya sala 1958 an de, dema xwestin bi began re yekîtiyê bikin, wan dîsa ew rêzan xwendin û pê razîbûn, tu jê ne guhertin, digel wan bi çavên xwe didîtin, ewrên reş tarî, di aliyê wan de dihatin, lê disa ne guhertin.

Berê, li cem wan, Kurdistan hebû, dema hatin ber dadegeh ê, Kurdistan windabû. Berê, Partî siyasî bû, ber dadegehê bû civateke çandî. Çima ? çi çêbûye? Gelo evahe, li cem wan, ne kêm bîniyeke siyasiye ? Gelo ne di naskirina armancên qunaxê de, nezaniye ?. Birastî ez li cem wan, ji bilî, dû rûyî, ya burjiwazan nabînim. Ev ramanên wan yên jevcida, ew kişandin hevrikiyeke xurt bihevre û welê jî bi desthilatan re, ji bo bidin xuyakirin, kîjan ji armancan, li cem her yekî ji wan başe Hingê dema gotin li ser pelika xwevekişandinê ji Partî û li ser Partî, siyasiye an civateke çandiye, ramanên wan yên jev cida belû bûn (34). Lê hizra hebûna Kurdan li Sûryê, ma sax silamet, tu kesî xwe nîzîk wê nekir. Lê desthilatan dan xuyakirin, ku ew naxazin tu kes bi netewa Kurdî li Sûryê bang bikê.

Şûnemayên van hizran, dûre, emê bibînin, ka, di Partî de, yê çi bikin ? !!!.

### 3- Rewşa Partî di dema girtinê de.

Rewşa girtiyan me naskir, lê gelo, ya hevalên derveyî girtegihê, çawa bû ? Ji bo vê, divê em :

1- Rewşa saziyê, piştî girtinê bizanin.
2- Helwesta serdariyê û hemû hevalan, ji girtiyan bizanin.
3- Peywendiyên Partî li Sûryê, bi Partî li Iraqê bizanin.

Lewre emê her mijarekî bi tena wê, vekolin.

#### 1- Rewşa saziyê, di hundirê Partî de, piştî girtinê.

Ji bo em rewşa saziya Partî nasbikin, emê wê li:

A- Heleb û Çiyayê Kurdan.
B- li Cizîrê, vekolin.

**A-Li Helebê û Çiyayê Kurdan**

Girtina hevalan ji Helebê destpêkir. Hevalên Partî hemû, li Helebê û Çiyayê Kurdan, ji dezgehê parastinê hatin naskirin. Û navê endamên komîtiya devera Helebê û Çiyayê Kurdan hate naskirin û welê jî, navê endamên komîtiyên şaxan jî û hemû hevalên din jî, hatin naskirin. Zêdî 120 sed û bîst endamê Partî hatin girtin.

Di roja yekemîna girtinê de, roja înê, 12.8.1960 î de (35), serokê dezgehê parastinê (el mebahis) li Helebê, ji Reşîd Hemo (endamê mekteba siyasî) sê tişt xwestin:

Lîstek bi navê hevalan.

Belavokên Partî.

Mekînên nivîsandinê û çapê.

Hember wê, soz dayê wî bibê Şamê û berpirsiyaran bibînê, da ser xwestekên Kurdan biştexilê. Reşîd bi xwestekên wî razî ne bû. Lê raporek nivîsand, têde sedemên avakirina Partî û armancên wê û navê damezrevanên wê, da xuyakirin. Lê berpirsiyarên parastinê guhnedan rapora wî, jê xwestin her sê bendên wan pêkbînê. Wî jî bi ya wan nekir. Ji bo vê, lêdan, gelekî ew êşandin. Lê wî tiştek ne got. Li vê dê, berpirsiyarên parastinê, bi awakî dî hatin Reşîd, ewjî, wan karî bû, bi êşandineke mezin, ji (Ehmed Henan), endamê komîtiya devera Helebê, gelek tiştan bizanin, weke navên hevalên komîtiya devera Helebê û şaxên wê û hemû hevalan û cihê mekînên destnivîsê û yên çapê jî. Û holê, hevalê wî jî (Hesen Osman) piştî eşkencekî zêde, weke wî kir. Berpirsiyarên parastinê ev tiştên he ji Reşîd re gotin, lê wî evahe ji wan nepejirand û tiştek ne got. Vêca van, Reşîd û herdû hevalên komîtiya deverê dan rûyê hev.Van herdûwan her tişt ber çavên Reşîd eşkere kirin, Reşîd jî neçar bû, bêjê raste. Vêca gelek heval hatin girtin û mekînên nivîsandinê û çapê jî hatin girtin. û gotin ku wan yek rêkirne Cizîrê li cem Mecîdê Haco ye. Mecîd û mekîne jî girtin.

Ev awayê dezgehê parastinê, rû bi rû kirina endamê sist, bi yê xurt re, roleke mezin di sistkirina berxudan û jevketina wan de leyist, ta dezgehê parastinê giha tiştên dixwest.

**B - Li Cizîrê.**

Li Cizîrê (parêzgeha Hisiça) ji saziya Partî, kêm hate naskirin, bi sedema: Ku hevalên wê, bi girtina hevalan li Helebê, zû hesehan, xwe dan alî. Kesên giropa yekemîn, yên hatin girtin, di roja înê 12. 8. 1960 î de, ji komîtiya devera Cizîrê, Mihemedê Mela Ehmed û Ehmedê Mela Ibrahîm, bi Reşîd Hemo re, di mala Hesen Osman de, (ji bo korseke çandî li wê dê bûn). Dûre Mecîdê Haco jî hate girtin, lê Mihemed Fexrî û Se`do yê Iybo, zû xwe veşartin. Û endamê dî, Ibrahîmê Mela Mihemedê Nesredîn, navê wî ma veşartî, çinku hevalên hatin girtin navê wî eşkere nekirin.

Ji şaxa karkerên Qamislo, Mela Mihemedê Niyo, li Helebê, bi Mihemedê Mela Ehmed û Ehmedê Mela Ibrahîm û hevalên wan re hate girtin. Lê bi sedema levkirina Mihemedê Mela Ehmed û Mela Mihemedê Neyo, vî ne got ez endamê komîtiya karkerên şaxa qamislo me, got ez endamekim bi tena xwe me, bi Mihemedê Mela Ehmed ve girêdayî me. Bi vî awayî tu endam ji vê şaxê nehatin girtin. Lê dûre Samiyê Mela Ehmed Namî, endamê şaxa xwendekaran hate girtin. Û dûre nîzîkî bîst xwendekaran hatin girtin. Lê desthiltan, piştî pelika xwevekişandinê ji Partî, ji wan wergirtin, ew berdan. Lê hêjmara mezin ji girtiyên Cizîrê, ji şaxa Dêrkê bû, ew jî bisedema herdû hevalên wan, yên li Helebê hatîn girtin, navê hevalên xwe eşkerekirin.

Hevalên din, yên şaxên Cizîrê, digel ku ew pirbûn, man parastî û ne hatin girtin. Hêjmarek ji hevalan bazdan. Lê piştî demeke kurt, hate xuyakiririn kîne yên dezgehê parastinê wan dixwazin, lewre yên din xwe eşkerekirin û nema bazdan. Yên man bazdayî, ji komîtiya devera Cizîrê, Mihemed Fexrî û Se`do yê Iybo. Û ji şaxa qamişlo Xalid

Meşayix û Ebdila yê Mela Elî. Bi wan re endamê komîtiya navendî Hemîdê Hacî Derwêş (36) . Lê endamên din, yên komîtiya navendî, Şêx Mihemed Isa Mela Mehmûd, ew ji destpêka damezrandina Partî, di nav hevalên komîtiya navenedî de, bi sedema şêxîtiya wî û Olperestiya wî, rewşeke taybet hebû, xwe nîzîkî hevalên din nedikir, bi wan re nedicivî, lewre ji berçavên

dezgehê parastinê, mabû dûr. Lê divê dema teng û xirab de, xwe da pêş, ji bo behra xwe, ji barê xebata giran hilgirê. Û welê jî endamê dî, yê komîtiya navendî, Hemze Niwêran, xwe da pêş, piştî ku hatibû rawestandin, bi sedema girtina wî, di sala 1959 an de, bi gomana komonîstiyê. Di vê demê de, ev hersê tenê, ji endamên komîtiya navendî mabûn.

Hemîdê Hacî Derwêş dibêjê û şêx jî gotina wî wekat dikê: ku wî ji hevalên xwe, şêx û Hemze xwest, di wê demê de û ji bo demeke kurt, bila şêx bibê sekretêrê Partî. (yanî ta meha şibata 1962 an, şêx sekretêrê Partî bû). Hemîd gotina xwe didomîne, ku wan levkirin, dû kesan li komîtiya xwe zêde bikin weke cihgiran, ta kongir li darxin. Û ji bo vê jî, wan Se`do yê Iybo û Mela EbdilFerîd, anîn navxwe. Û bihevre xebitîn ta konfiransa meha şibata 1962 an, dema komîtiyeke navendî nû, ji Partî re hate hilbijartin.

Lê hevalên komikan, hember zordariya karê dezgehê parastinê bi milet re û berdewama gera wan, bi şev û roj, li hevalên bazdayî û girtina wan ser malan de, di destpekê de veciniqîn, bizdehan. Hinekan nema diwêrîn berdewama xebatê bikin. Lê piştî çendekî, ew tirs çû, nema milet ji hatina mebahisan ditirseha. Hevalên bazdayî li cem xwe vedişartin û xwedî dikirin. Çinku zanîn evahe rikberiyeke di nav miletek sitembare, mafê xwe yê netewî dixwazê û zordarek mafî wî winda dikê û nadiyê. Lewre milet hemû, bû piştevanê Partî û hevalên bazdayî, di cihên germ û nerm de xwedî dikir. Digel ku dezgehê parastinê gelek awa bikar anîn, weke girtina hin kesan ji malbata hevalên bazdayî, ji bo xwe bispêrin dezgehê parastinê, weke çawa bi serê bavê Hemîdê Hacî Derwêş û bavê Xalid Meşayîx kirîn, ew gelekî êşandin. Lê baweriya van, bi mafê miletê wan, ji zordariya mebahisan xurtir bû, lewre guhnedan zora wan û xebata xwe berdewam kirin.

Di vê dema teng û nexweş de, pîreka Kurd, cihê zilaman girt, nemaze di bajaran de û xebateke pir hêja kir. Ew bi şev û roj di nav hevalan de digereha, namaze di nav hevalên bazdayî de, nûçe û nameyên wan, di nav wan de, dibirin û tanîn û di nav hevalan de digerandin.

Holê, di wê demê de, me dît Partî yek bû, xurt bû, hember zora desthilatan xwe ragirt û ne herifî.

Helwesta hevalên derveyî zîndanê, ji levnekirina girtiyan.

Nûçeyên levnekirina girtiyan, bi rêya girtiyên, ji bo demekê hatin berdan, ta dadegehkirina wan bê kirin, gihan hevalên derveyî zîndanê. Van hevalan, ji serdariyê re, derveyî zîndanê levnekirina girtiyan şirûv kirin û sedemên wê dan xuyakirin. Ji wan re levnekirina wan ser benda " Azadkirin û yekirina Kurdistanê " û li ser " pelika xwevekişandinê ji Partî " û helwesta her alîkî dan xuyakirin. Serdariya Partî piştevaniya helwesta Osman û hevalên wî, di van tiştan de kir. Lê dît, hebûna wê bendê di rêzanê de, ne di cihê xwe de ye, gereke bête guhertin.

Holê ev helwesta serdariyê, di nav hevalan de, hate belav kirin. Sebvê me dît Osman û hevalên wî, zû vegerehan cihên xwe yên berê, di saziya Partî de, lê yên Dr. Hatin rawestandin û tol der heqê hinekan de, hate girtin.

Lê dema hinek ji kesên Dêrkê, heval bendên Dr., ji zîndanê derketin, êrîşekî xurt berdan Osman û hevalên wî û ew bargomankirin û gotinên qirêj li ser wan gotin.

Bi vî awayî binikeke dijberan li Dêrkê peydabû. Wan (hinek ji kesên Dêrkê) di zîndanê de, bi sistî piştevaniya helwesta Osman dikirin û derveyê wê jî, xwestin bi alîkî negrin, bê lay rawestin, lê dijberî xurt bû, neçarbûn bi aliyê Dr. Bigrin û bin serokatiya Kin'anê Egîd de bixebitin. Bi vêre jî, li wê dê hinek meyldarên serdariyê hebûn û li qamislo jî (37), çend kes meyldarên Dr. hebûn.

Li Dêrkê, dijberî, ji zû de, di nav burjiwaza bazirganî, ya nû avadibû, weke Ehmedê Mela Ibrahîm û Ebdilqadirê Gurî û xeynî wan jî û dixwest xwe ji bin serdestiya serokên eşîran û navdarên wêdê, derêxê. Lewre bi serdariya Partî re, dijî wan rawestan. Û serdariya Partî jî, pişta xwe bi wan girêdida û bi aliyê wan digirt. Lê dema dijberî domkir, nekarîn di helwesta xwe de bimînin. Hin û hinû sist bûn û, nemaze, dema di zîndanê de, hinek ji serdariya Partî, weke Dr. û Reşîd û Mecîdê Haco dijî biryara jevxistina şaxa rêxistina Dêrkê rawestan. Di dawî de bûn hevalên dijberên serdariyê.

Peywendiyên Partiya me, bi Partî re li Iraqê hebûn. Ji wan re, helwesta xwe ji Dr. gotin. Wan jî Piştevaniya helwesta Osman kirin

Institut kurde de Paris

û di singa rojnama xwe de: " Azadî ji Osman Sebrî û hevalên wî re" nivîsandin û navê Dr. ne anîn holê, digel ku, di wê demê de, ew serokê Partî bû. Û dema hemû ji zîndanê derketin, me dît Osman û hevalên wî Mihemedê Mela Ehmed, Mela mihemedê Neyo, Mihemed Elî Heso, Kemal Cemîl Seydo û Seydo Ersilan, cihde vegerehan xebatê, ji bilî Reşîdê Hemo yê serdarî hin têbînî li ser helwesta wî, dema dedegehê û xeynî wê jî, girt û şeş meh ew ji xebatê rawestand. Lê Dr. Nûredîn Zaza û hevalên wî, tol di heqê hemûwan de hate girtin.

Encûmenek ji endamên komîtiya navendî: Xalid Meşayîx, Kemal Ebdê û Bilal Hesen, di maha Adara 1962 an de, çûn cem Dr., da hin pirsan li ser levnekirina wan, di zîndanê de û xeynî wê jî, jê bipirsin. Lê evêhe yanî Dr., guhneda wan û karê wan û bi pozbilindî û bi xûngermî, berda wan. Û dûre bi dijberan re girt û dijî serdariyê rawesta. Lewre di meha Hizêrana 1962 an de, serdariyê biryara derxistina wî ji Partî girt. Lê hevbendê Dr., Mecîdê Heco, berpirsiyarê komîtiya devera Cizîrê, serdariyê raporek, li ser girtina wî, jê xwest. Lê wî di pestpêkê de neda, weke tu bêjî, wî çavnêriya rewşa Partî û Dr. dikir, (38). (gora Xalid Meşayix dibêjê), dûre rapora xwe nivîsand û da serdariyê.

Kesên Dêrkê, di encama van bûyeran de, ji saziya Partî dûr ketin û yên mabûn heval, rapor ji wan nehat xwestin, ew jî, ji saziyê man dûr.

### 3- Hilbijartin ji bo perlemana Sûryê

Di 28 Eylûla 1961 ê de, Sûrye ji komara erebiya yekbûyî veqeteha. Cidakeran xwestin hilbijartinê ji bo perlemaneke nû, di 1. 12. 1961 î de lidarxin. Lewre serdariya Partî biryara beşdariya hilbijartinê girt. Ji bo wê, şêx Mihemed Isa û Hemîdê Hacî Derwêş, xwe pêşkêşî wê kirin. Lê hate xuyakirin kû Hemîd di temenê xwe de biçûke. Lewre serdariyê dît ku Dr. Zaza jê re başe (39). Ebdilferîd dibêjê: Endamên komîtiya navendî çûn cem Dr. Zaza û jê xwestin xwe ji ber Partî ve pêşkêşî hilbijartina endamîtiya perlemana Sûryê bike. Lê ew razî ne bû. Van lê zorkirin. Di dawî de **razî bû.**

Şêx û Dr. xwe pêşkêşî hilbijartinê kirin û civata Sûryê û ya Cizîrê, di rengê rewşa kevin, ya hilbijartinan de bû. Yanî di xizmeta derebeg û burjiwazan de bû. Van, her çend serok eşîran û dewlemandan, bi hevre lîstek ji navên pêşkêşkeran çêdikirin û bi hevre dadiketin meydana hilbijartinê. Û gora sîstema eşîrtî û bendîtî, navên kesên eşîrê, di destê serokê eşîrê de bû. Bi keyfa xwe bû, aza bû, wan bifroşê pêşkêşkerekî dewlemend, an wan bidê yekî dostê xwe, ji wan. Bi vî awayî hilbijartin diçû serî. Lê van pêşkêşkerên nû, nedizanîn, çi guhertineke bingihî, di civata Kurdan de çêbû ye. Lewre wan guhnedan pêşkêşkerên Partî Şêx û Dr. û razînebûn biwan re, bikevin lîsteyekê de. Çinku goman dikirin ku ew bê hêzin, tenê ne. Tenê di nav wan de, malbata Haco Axa, dizanîn Partî ci guhertin di civata Kurdan de kirye û çiqas bihêze. Lê digel vê jî, wê xwest roleke xwe bi Partî re bileyzê. Ji bo vê, ji serdariya Partî xwest pêşkêşkerê xwe, yê serekî, şêx Mihemed Isa ji hilbijartinê bikşînê, ji bo yekî ereb, ji lîstekî dî, cihê wî bigrê û Dr. bi tena xwe ji Partîre bimînê. Lê serdariya Partî bi vê razînebû. Eva he bû sedemê şerekî xurt di navbera Partî û malbata Haco axa de.

Dr. Zaza piştevaniya xwesteka malbata Haco Axa kir û xwest şêx Mihemed Isa xwe bikşînê û ew tenê bimînê û xwe acizkir û li serdariyê şidand û got ku yê xwe ji pêşkêşkirinê bikşînê, eger şêx xwe jê nekşînê. Lê serdarî jê re da xuyakirin ku divê bigotina wan bikê, an xwe jê bikşînê. Hingê sist bû û ji daxwaza xwe vegereha û bi şêx Mihemed Isa re daket meydana hilbijartinê.

Pêşkêşkerekî dî, Kurd hebû, ew jî Fuadê Qadrî begê Cemîl paşa bû, digotin ku ew yê komonîstan bû, ma bû tenê, vêca navê wî jî kirin di lîsta xwe de. Yanî bûn sê pêşkêşker di lîsteyekê de û pelika navê xwe, ji bo piropegendê, bi rengê zer, çap kirin.

Lê berî hilbijartin, di 1.12.1961 ê de destpêbikê, desthilatan kotekiya xwe dijî Partî dan xuyakirin. Ji Hemîdê Hacî Derwêş xwestin ji gundê xwe dûr ne kevê, ta hilbijartin dawî bibê. Û ji Dr. Zaza û şêx xwestin xwe ji pêşkêşkirina hilbijartinê vekişînin. Lê van bigotina wan nekirin. Xwestin Dr., bigirtina birayê wî yê mezin Dr. Ehmed Nafiz bitirsînin, eger xwe ji hilbijartinê venekişînê. Lê wî guhneda wan, lewre ew di katjimêra 12 an de, di nîvê şeva 29 .11.

1961 ê de girtin û kirin girtegihê de. Û şêx jî di roja dî, 30. 11. 1961 ê, di nîvro de girtin. Lê bi vêre jî xwe ji hilbijartinê ne kişandin .

Li ser pêveçûya dengdanê, bipirs û netirs. Di qeza qamişlo de û li hemû gundên Kurdan û bajaran de, weke Qamislo, Amûde, Dirbêsiyê, Tirbispî dengdan ji bo şêx û Dr. giha % 85 ta % 100 bû û di sindûqên dengdana gundan de, hejmarek zêde hindik, ji xeynî wan re hebû.

Ev rewşa he, guhertina dengdanê di civata Kurdan, dijî derebeg û burjiwazan, hişte yên biyanî veciniqin, behitî bimînin. Ji encama hilbijartinê gelekî tirsehan. Berê, ew hîn bibûn, ku hevbendî di navbera serok eşîrên Kurdan û şêxên ereban û dewlemedên bajêr çêdikirin. Milet bê çare dima, lewre dida pey wan û ew dihilbjartin. Lê vê carê, ne welê çêbû. Hêjmareke zêde kêm ji milet, da dû wan û ew hilbijartin. Bawerî cem wan çêbû, ku dema milet hişyar bibê, zanê berjewendiyên wî bikî ve girêdayî ne. Lewre ew ne hilbijartin, herdûkên Partî hilbijartin. Carên berê, serokên civata kevin, şêxên ereban, axên Kurdan dewlemendên bajar û gundan, seranser diçûn tirimbêlên bicûk û mezin kirê dikirin, ji bo dengdêran bughêzin bal sindûqên dengdanê. Vê carê jî welê kirin, kesên gundan, li tirimbêlên wan siwar dibûn çinku Partî tu tirimbêl kirê nekir û dema ev kesên li tirimbêlan siwar, dighan nîzîkî sindûqa dengdanê, didan ber qîran, bijî Dr. Zaza û şêx Mihemed Isa. Xwediyên tirimbêlan, hevbendên aliyê dî, di man behitî, şaş û matmayî di man !!!! çi li vî welatî çêbû ye ? Gelek ji dengdêran, ji gundan, peya, bi lingên xwe dihatin cihê sindûqên dengdanê, ji bo şêx û Dr. hilbijêrin.

Dema desthilatan evahe dîtin, polîsên wan, Dr. û şêx û şûngirên wan yên li ber sindûqan girtin. Û sindûqên dengdanê, bizor, ji xwe re birin û bi pelikên zilamên xwe dagirtin (40). Digel ku, berî dengdanê, Dr. Zaza çûbû, cem şalyarê hundirê welêt û serokê leşkerên Sûryê, herdûwan jêre wekat kirin ku hilbijartin yê dîmûkratî bê, yê têkilî, ji tu aliyan, tê ne bê. Lê mixabin dema dîtin ku hevalbendên wan têkçûn, destê xwe dirêjî wê kirin. Şûngirên Dr. û şêx li ber sindûqan girtin û ji sindûqan dûr dikirin û pelika zer ya navê Dr. û şêx li ser wê, bikotekî ji xelkê distandin û ya hevbendên xwe didan wan. Û di dawî de herdû jî girtin û sindoq ji

Institut kurde de Paris

xwe re birin û bi pelikên hevalên xwe dagirtin, ta hiştin hevalên wan serbikevin. Hê herdû pêşkêşdar û şûngirên wan di zîndanê de bûn, desthilatan ragîhand, ku hevalên wan, di hilbijartinê de, serketin.

Di roja sisyan de, ji maha 12 an, Dr. û Şêx berdan, piştî her tişt dawî bibû. Van jî, Dr. û şêx namek ji desthilatan re, li ser têkilî û ne dîmûkratî û xirabiyên wan, di vê hilbijartinê de, nivîsandin. Lê ew jî weke qîrek, li ber bayê bû, tu havil jê re ne bû (41).

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

# *Navbira sisyan*

*Hevrikî, di navbera serdariya Partî de*

Institut kurde de Paris

Ji vêdê û pêde, piştî em ji dû navbiran xilasbûn:

1-Navbira, damezrandina Partî.

2-Navbira, berçavkirina sedemên levnekirinê di Partî de.

Emê navbireke nû, ji pêveçûya partî vekolin. Ezê navê, navbira hevrikî, di hundirê serdariya partî de, çi eşkere an veşartî û kartekerên wê, di nav hevalan de, lê bikim.

Vêca, emê bûyerên di hundirê Partî de cêbûyîn, gora demê, yanî sal bi sal, weke berê jî me kirî, vekolîn. Û holê emê dest pêbikin:

### 1 - Bûyerên sala 1962 an

Sala 1962 an, di qunaxa yekê de, ji dîroka Partî, saleke ber çave û giringe. Çinku bûyerên wê gelekî giring bûn û kartekerên wan li ser paşeroja partî gelekî mezin bûn.

Bûyerên wê bûn kirinên pêşî, ji parçebûna Partî re, ya di destpêka sala 1966 an de, cihgirtî.

Heger zîndan bû sedemê peqandina girêka dagirtî hevrikî, ya di nav partî de, ta wê demê, bi hevre mayî, yê sala 1962 an, di vê qunaxê de, bibe sala hevrikiya eşkre an veşartî, di hundirê Partî de û berdewamkirina wê ta sala 1965 an, hişte gewdê partî, sist û lawaz bibê û zû jevbikevê.

Ji bo bûyerên sala 1962 an baş vekolin, me ew kirin cend mijar:

A - Konfiransa yekê.

B - Levnekirin di nav Şêx û Hemîd de û kartekerên wê.

C - Hilbijartina awarte.

### A -Konfiransa yekem, di şibata 1962 an de

Ji dema Partî hate damezrandin, 14. 6. 1957 an, ta destpêka sala 1962 an, gelek bûyer ser partî re çûn, hiştin çar ji pênca, ji endamên komîtiya navendî bi hin sedeman, dûrî Partî bibin.

Di peyîza 1958 an de, komîtiya navendî ji / 10 / deh, endaman bû: Dr. Nûredîn Zaza, serokê partî. Osman Sebrî, sekretêr. Reşîd

Hemo, Mihemed Elî Xoce, Şewket Henan, Xelîl Mihemed, Hemîdê Hacî Derwêş, şêx Mihemed Isa, Hemze Niwêran û Cegerxwîn endam bûn. Û di buhara 1959 an de, dema desthilatan li Partî şidandin, piştî girtina komonîstan, Mihemed Elî xoce û Xelîl Mihemed û Cegerxwîn, çûn Iraqê. Û berî wan, dema desthilatan, di dawiya sala 1958 an û destpêka sala 1959 an de, dest avêtin komonîstan, dû heval ji komîtiya navendî, Şewket Henan û Hemze Niwêran girtin û dûre, di partî de hatin rawestandin. Û di girtina tebaxa 196o î de, Dr. Zaza û Osman Sebrî û Reşîdê Hemo jî, hatin girtin. Û holê ji bilî Hemîdê Hacî Derwêş û şêx Mihemed Isa tu endamê komîtiya navendî, bê girtin nema. Lê di wê demê de, Hemze, piştî ji zîndanê derket û rawestandina demekê, vegereha xebatê.

Hember vê rewşa komîtiya navendî, ya ne serast û astengên gelek di zîndanê de, an derveyî wê peydabûyîn, divwa çarek, ji hemûwan re, yên hêjmara wan zêde dibûn, çi di serdariyê de, an nav komikan de, bihata dîtin. Lewre serdarî dît gereke kongirek bê lidarxistin, ji bo komîtiyeke navendî nû bê hilbijartin, da wan astengan çareser bikê. Nemaze yên di girtinên dawî de çêbûyîn û kartekerên xwe li ser hemû rêxistinê hişt û gelek piroblêm peydakirin û bûn sedemên parçebûnê.

Di dawiya 1961ê de, hemû girtî hatibûn berdan, ji bilî Reşîd Hemo, yê piştî ser salê bi çend rojan hate berdan û Osman Sebrî yê di nîvê şibata 1962 an de hat berdan, (yanî piştî konfiransê bi çend rojan).

Konfirans, di destpêka meha şibata 1962 an de, li bajarê Şamê hate lidarxistin. Ev konfiransa he, ya yekemîn bû, di jiyana partî de. Çinku di wan nîran de, nedikarîn kongirek lidarxin, lewre, ji dêla wê, konfirans hate lidarxistin. Yên amadeyî wê bûn: Şêx Mihemed Isa, Hemîdê Hacî Derwêş, Hemze Niwêran, Mihemed Elî Xoce, (ewê di gulana 1959 an de çûbû Kurdistana Iraqê û di peyîza 1961 ê de vegereha û bû serokê konfiransê). Û welê jî endamên komîtiyên deveran û kadroyên Partî û hinek ji endamên şaxan jî amadebûn (42).

Karê serekî ya vê konfiransê ew bû, ku endamên komîtiya navendî hilbijêrê. Tu kes, ji yên di zîndanê de hevbendên Dr. Zaza bûn, amadeyê konfiransê ne bûn.

Levnekirinên çêbûyîn, weke ya Hemîd û Hemze û Hemîd û şêx, roleke xwe li ser wan hiştibû, lewre yên hatibûn xuyakirin weke dijberan, di hibijartina komîtiya navendî de serneketin. Yên serketîn: Mihemed Elî Xoce, şêx Mihemed Isa, Hemîdê Hacî Derwêş, Mihemedê Mela Ehmed, Xalid Meşayix, Kemal Ebdê û Bilal Hesen. Hevalekî nerazî, (Mihemed Fexrî) li ser wan got: "lîsta leşkeran serket" .

Di civîna yekemîn de, biryar hate standin bi damezrandina komîtiyek, ji Xalid Meşayix, Kemal Ebdê û Bilal Hesen, ji bo bigirtiyên komîtiya navendî re, giftûgo û pirsan, li ser girtina wan û levnekirinên wan bikê. (berê, komîtiya navendî, evahe bi endamên, ne di komîtiya navendî de kiribû).

Hevalan hewildan, ku endamêm komîtiyê, yên ne meyldarbûn, hilbijêrin, (di gel ku ne meyldarî bi xwe, li cem yên ne hatîn girtin, tu jê nema bû).

Vê komîtiyê karê xwe, bi hewildana dîtina Dr. Zaza destpêkir. Lê wî bi gotinên giran û nexweş, ser wan de xureha û bi pozbilindîkî mezin û sergermî, berê xwe ji wan guhert (43) û ji cem xwe derxistin. Piştî vê, helwesta Dr. Zaza ji serdariyê hate guhertin, dest bi şerê wê kir û hevalbendiya dijberan, weke yên Dêrkê kir. Ev karê wî, hişte serdarî neçarbibê û biryar bi derxistina wî ji Partî, di meha hizêrana 1962 an de bigrê. Piştî vê, komîtiyê Reşîdê Hemô dît û pêre dan û standin û pirs jê kir û pêşniyar kir, ku wî, şeş mehan ji xebatê rawestînin. Çinku hin têbînî li ser helwesta wî, di girtinê de dîtin. Û li ser Osman, komîtî pêşniyarî vegera wî kir. Û dema vegereha bû sekretêrê Partî.

Serdariya Partî biryar bi damezrandina hevgirtina xwendekarên Kurd li Sûryê da. Û dest bi yên zanîngehan kir. Û di meha gulana 1962 an de hevgirtina xwendekarên zanîngehan, ên Kurd li Sûryê damezrand (44). Ji berpirsiyarên wê Mihemed Enwer Elî û Dr. Xelîl Ebdê bûn.

**B - Levnekirin, di navbera Hemîd û Şêx de û kartekerên wê**

Di çend mehên navbera konfiransa yekê, destpêka şibatê û meha hizêrana 1962 an de, Hemîd û şêx çalekiyên xurt, dijî hev kirin. Her yek li fersendekî digereha û çavê xwe li şaşiyeke biçûk digerand, ji bo yê dî bargomen bikê. Ku dijî wî, bi karan radibê.

Gelo ji kudê ev levnekirina he hatiye ?.

Gelo evahe, ji nişkave, piştî konfiransê peydabû ?.

Ez dibêjim na !!!...

Di nerîna min de, ev ne ya vê dema kurte. Ev levnekirina he ji dema bazdanê ve ye. Kirinên wan ketin serhev de û kom bûn, hêdî nema karîn bi hev re bimînin, lewre niha bi firehî peqehan.

Em ji şêx dipirsin, çine sedemên levnekirinê bi Hemîd re? dibêjê: Kû Hemîd hevbendê Dr. Zaza ye. Dixwest Dr. bi ramanên xwe yên ne serast û yên ne weke rêzanê, vegerê Partî.

Em ji Hemîd dipirsin, dibêjê: Şêx dixwest piroblêman di partî de peydabikê û bi saziya Partî nagrê, keseke serberedayî ye, dixwazê komgirêkan çêkê.

Emê dev jiwan berdin û hewlbidin li bûyerên salên 1960, 1961, 1962 an vegerin û wan bînin bîra xwe û binêrin peywendiyên wan bihevre çawa bûn? Ji bo vê emê vegerin cem hevalên serdariya wê demê û ji wan sedemên levnekirina wan bipirsin, belkî em bighên rastiyê. Di gotinên wan de, em dibihîsin: Ku ji destpêka hebûna şêx di Partiyê de û di nav hevalên komîtiya navendî de, bi sedema şêxîtiya wî, xwedî rewşeke taybet bû. Tu peywendiyên wî bi hevalan re, di çi pêpelûkên saziyê de, ne bûn. Vêca dema heval hatin girtin û hineke dî bazdan, ew jî hate xebatê û rola xwe di komîtiya navendî de leyist. Ev rengê xebatê û kar û peywendî, li wî, nû bûn. Lê hiştin, hevalan nas bikê û bizanê raman û helwestên wan ên siyasî, çi tebane. Weke berê me got, ew di vê demê de, bû sekretêrê Partî, lê bi rastî, Hemîd her kar dimeşand, di gel ku şêx sekretêr bû. Çinku Hemîd hê ji destpêka sala 1959 an ve bazdayî bû, xwe di nav malên hevalan de vedişart. Bi sedema vê, wî hemû hevalên komîtiya deverê û yên şaxan û yên navçeyan nas kiribûn û

dibê ku kartekereke xwe li ser wan, bêhtir ji ya şêxê nû hatî nav wan de, hiştibê.

Ev tiştên he roleke wan, di wê demê de hebû, dema levnekirinên zîndanê dighan hevalên derve û ji wan, helwest dihate xwestin.

Ji bo vê, di destpêka sala 1962 an de, hin kom, bêhtirê kesên wan ji olperestan bûn, doza piştevaniya raman û helwesta Osman Sebrî û şêx Mihemed Isa dikirin, dijî helwesta Hemîd û hevbendên wî. An a rastir dijî ramanên Dr. Zaza yên niha Hemîd bi wan bangdikê. Yanî levnekirinên zîndanê, niha rola xwe di nav hevalan de dileyizê.

Dûre, me dît levnekirin, di nav wan de, bi rojan, fireh dibû, ta giha buhara 1962 an, di nav hevalan de eşkere bû. Her yek li fersendekê digereha, ji bo êrîşî yêdî bikê û wî bi hin tiştan bargoman bikê. Li vêdê komîtiya navendî neçarb bû, çend civînan bikê, ji bo gotinên wan li ser hev bibihîsê. Hemîd di ya dawî de, Şêx bi serberedayetî û afrandina komgirêkan û levxistina saziya Partî bargomankir. Lê Şêx di civîna dawî de, tenê li ser Hemîd got ku ew (ne hişya re), piştî di civînên berê de, bi gelek tiştan Hemîd bargoman dikir. Lê hevalên komîtiya navendî, gotinên Şêx, nemaze gotina wî ya dawî, li ser Hemîd, ne serast dît û bi gotinên wî bawernekirin. Sebvê di meha Hizêrana 1962 an de, şeş meh, ew ji karê partîzanî rawestandin (45). Lê wî biryara komîtiya navendî nepijirand û êrîşî wê kir û komgirêk afirandin. Lewre komîtiya navendî neçar bû, di dawiya sala 1962 an de, wî ji Partî derêxê.

Lê gelo, ma ev hevrikî dawî bû ? ....Na !!!...

Çalekiyên hevrikî, weke berê hebûn. Hewildana çêkirna komgirêkan pirtir dibû. Lewre me dît, komîtiya navça bajarê Amûdê, bi tevdana hinekan û bê agehdariya komîtiya navendî, an ya deverê, ji cemxwe, daxuyaniyek partîzanî belav kir. Têde ji hevalên navça xwe dixwest, dan û standin û civîn bi Hemîd û hevbendên wî re, weke Xelîlê Ebdê (sor) endamê komîtiya deverê û Eliyê Şêxmûs û Mihdiyê Evdo, endamên şaxa Amûdê nekin û nehêlin ew di nav hevalên navçeyê de bigerin. Vê komîtiyê, bi sedema ku Hemîd û hevbendên wî di xwestin serberedayetî di nav saziya navçê de belav bibê, ev daxuyaniya he weşandin. Hemîd û

Institut kurde de Paris

hevalên xwe hiştibûn karên sazî, yên wê komîtiyê levbikevê û bersiva raporên komikan nedidan û hewildidan di hundirê saziya Partî de, komgirêkan amade bikin. Bi van hemûwan re jî, ramanên Dr. Zaza belav dikirin û êrîşî Osman û Şêx û ramanên wan dikirin.

Ji bo vê bûyerê, komîtiya navendî, komîtiyek ji Hemîdê Hacî Derwêş û Xalid Meşayix û Kemal Ebdê amadekir, da sedemên belavkirina vê belavôkê, eva dijî bendên rêxistina hundirê partiyê bû, bizanin. Vê komîtiyê, Piştî bihîstina gotinên wan, biryar bi rawestandina Mela Mihemedê Qorziyê û Sebrî Şêxmûs û Ebdilhelîm Yûsif, endamên navça Amûdê, şeş mehan û bi wan re jî, Usmetê Mela Fethulah, berpirsiyarê komikekê, sê mehan, dan. Lê komîtî sedemên serekî yên vê bûyerê çare nekirin û hiştin ji demeke dî re. Çinku wan dizanî û komîtiya navendî jî dizanî, sedemên serekî, bi levnekirina zîndanê ve girêdayî ne û ew niha ne amadene ji bo vê. Çinku derxistina Dr. Zaza û rawestandina Şêx û Hemze, gelek asteng ji wan re peydakirin. Sebvê, sere sere ev bûyera he çarekirin.

Di vê demê de, komgirêkeke dî me dît, ji vê mezintir û firehtir, ji nifşê kesên dostên Şêx, weke Mela Dawid, Mela Hadî, Mela Mihemedê Neyo û Mihemed Elî Heso û hin hevalên din bûn. Evên he dijî Hemîd û hevalên wî û serdariyê hemû, rawestan. Mela Hadî, Mela Dawid û Mela Mihemedê

Neyo dibêjin: ku Hemîd bi alîkariya hevalên xwe, weke Xelîlê sor û Eliyê Şêxmûs û Mihdiyê Evdo serberadayetî di nav Partî de belavdikirin û civîn levdixistin û nedihiştin herin serî. Û bi awakî veşartî, Hemîd xwe digihand hinek hevalên şaxan û navçeyan û komikan û bi wan re komgirêk çêdikir. Hember çalekiyên Hemîd û hevalên wî, ev melayên he, Mela Mihemed Neyo, ji komîtiya devera Qamişlo û Mela Dawid ji komîtiya devera rojavayê Qamişlo û Mela Hadî ji komîtiya şaxa gundên Amûdê û Mihemed Elî Heso ji komîtiya şaxa karkerên Qamişlo û gelek hevalên din, ji rojhilatê qamişlo, yên ji karê komîtiya navendî û ya deverê nerazî, xwe gihandin hev. Mela Hadî di domîne û dibêjê: ew nîzîkî 35 sih û pênc kesan bûn. Di peyîza 1962 an de, li Qamişlo gihanhev. Piştî dan û standineke berfireh, gihan ku bîrnamekê, ji serdariya Partî re binivîsin û jê bixwazin, di heftiyekê de, komîtiyekê damezrînin û

Institut kurde de Paris

wan bibînin. Û dûre yê li ser nedana bersiva raporan, û li ser serberedayetiya di nav partî de heyî û li ser gotina tê kirin, ku di nav komîtiya navendî de levnekirin heyî û di dawî de, dixwazin bizanin ka dirava partî, çawa tê xerckirin? Heger ev çênebê, ew, yên di wê civînê de gihayîn hev, nema wan (komîtiya navendî) ji xwe re dikin heval û serdar û nema bi wan re civînan dikin. Mela Hadî bîrnama wan, da Xalid Meşayix û jêre da xuyakirin, divê di heftiyekê de komîtî, wan bibînê, da daxwazên wan bizanê.

Lê hê heftî, ji dawiya sala 1962 an, dawî ne bibû, biryar bi derxistina Mela Hadî û Mihemed Elî Heso ji Partî û hetkandina wan. Û rawestandina Mela Dawid û xeynî wî derket bû. Lê Neyo ji toleyan xilas bû. Berî vê, di havîna 1962 an de, bi sedema derketina Hemze Niwêran ji rêza siyaseta Partî û piştevaniya komgirêka burjiwaza Kurdî dikir, komîtiya navendî biryar bi rawestandina wî standibû.

Û herwiha jî, di dawiya havîna 1962 an de, biryar di heqê endamê komîtiya devera Cizîrê Mihemed Fexrî de jî, hatibû girtin. Ew jî bisedema piştevaniya komgirêka burjiwaza Kurdî û ya Dêrkê re dikir.

Di vê demê de, komgirêkeke sisyan, dijî yên me dîtin, ewên hevbendiya Osman û Şêx dikirin, hate afirandin. Bêhtirê endamên vê komgirêkê ji rojhilatê Qamşlo bûn. Piştevaniya ramanên burjiwazan dikirin. Mihemed Fexrî, yê bi şêwra Mecîdê Haco (46) dikir, dibêjê: piştî serdariyê guhneda wî û hate dûrkirin, li mala xwe rûnenişt. Xwe gihand endamên dijber di şaxan de û dijî serdariyê ew dişarandin û bi hevre gihan levkirinekê, ji bo civîneke fireh lidarxin û hemû têde amadebibin. Armanca wê civînê, weke Mihemed Fexrî û Kin'anê Egîd dibêjin, guhertina serdariyê bû, ne çêkirina partiyeke dî bû. Ji bo vê Mihemedê Fexrî çû mala Xelîlê Sor û ew vexwendiyê civînê kir, ewa piştî çend rojan, li Qamişlo yê lidarxin. Û jêre da xuyakirin, ku hatina wî bi şêwra Mecîdê Haco ye. Xelîl razîbû amadeyê wê civînê bibê. Piştî Mihemed Fexrî çû, Xelîl çû Dirbêsiyê û ji Hemîd re, ser civînê got. Hemîd jî, çûna wî pijirand. Lê dema Xelîl hate Qamişlo ne got endamên komîtiya navendî, berpirsiyarên Qamişlo, Mihemedê Mela Ehmed û Xalid Meşayix, li ser amadebûna wî di wê civînê de Mihemedê Fexrî,

Mecîdê Haco, Kin'anê Egîd, Mihemedê Simaîl û Mela Beşîr, Ehmedê Fedîle û Ebdê Berekat û xeynî wan jî, endamên şaxan, yên dihatan naskirin bi helwesta wan ya dijî serdariya partî û bi peywendiyên wan bi burjiwaza Kurdî re, bi hevre civîn. Lê ew civîn têkçû û negiha tû armancan. Çinku ne karîn bigihin tu rêkeftinên hemûwan bike yek (47). Serdarî bi wan heseha, tol di heqê her yek ji wan de girt.

Bargoman li ser Xelîlê Sor (hevbendê Hemîd) zêde di bûn. Lewre komîtiya navendî di peyîza 1962 an de, biryar bi rawestandin û şelandina wî, ji berpirsiyariya endamîtiya deverê girt, ta pirs, li ser çalekiyên wî, jê bên kirin. Dema Hemîd, weke Xelîl dibêjê, xwe dît bê hevalekî xurt, weke Xelîl, biryarek ji xwe re, bi cemdandina çalekiyên xwe, di Partî de girt.

Bi vî rengî, me gelek biryarên hatîn girtin, di vê sala 1962 an de, derheqê hevalên di pêpelûkên ne wekhev de, dîtin. Ji komîtiya navendî Dr. Zaza û Şêx Mihemed Isa û Hemze Niwêran (digel ku, di wê demê de, ne endamê komîtiya navendî bû û tu karekî xuyakirî, jê re ne bû). Û Ji komîtiya deverê, Mihemed Fexrî (ji ya Qamişlo) Mela Dawid û Xelîlê Sor (ji ya rojava yê Qamişlo) û Mecîdê Haco, yê ma dûr û bê guhdan û bi wan re gelek endamên şaxan jî.

Yanî evên he, biryar der heqê wan de hate girtin, ji bo çêkirna komgirêkan, an hewildana çêkirna komgirêkan bû.

Em dikarin sedemên van karên wan vegerîn bal:

1- Peywendiyên wan bi burjiwaza Kurdî re, hişte ew bên dehfandin bal van karan ve. Bêhtirê van di rojhilatê Qamişlo de bûn.

2- Levnekirinên di nav Partî de, ji dema zîndana sala 1960 î de bûn. Bêhtirê van di rojavayê Qamişlo de digihan hev û hinek di rojhilatê Qamişlo de jî, ji van hevbendên Hemîd bûn, an yên Osman û Şêx bû:

**1 – Koma Qamişlo**

Di vê demê de, li Qamişlo komek ji endaman, weke hêzek giran û bi karteker, hate xuyakirin, dest danî ser rêxistina Partî li Cizîrê. Evên he hatin xuyakirin weke komek, bê ku tu rêkeftin, di

nav wan de çêbûyî. Ew kom ji van kesan bû: Mihemedê Mela Ehmed, Xalid Meşayix di komîtiya navendî de û Ebdila yê Mela Elî, Mihemed Mistefa, Ebdilsemed Mela Xelîl, Hesenê Bişar, Ebdilbaqî Elî Xan di komîtiya deverê de û gelek heval li dora wan bûn.

Lê çawa kartekera vê komê hate xuyakirin?

Ji destpêka damezrandina partî ve, kartekereke taybet ji qamişlo re, li ser rêxistina partî li Cizîrê hebû (Cizîr hêza xurt bû di Partî de, cemawerên Partî li Cizîrê, ji yên Heleb û Şamê bêhtirbûn).

Di Qamişlo de û ji xwendekarên wê, berî Partî bê avakirin "Civata Yekîtiya Xortên Dîmûkratên Kurd" avabibû. Û dema bi Partî re bû yek, tu endam di saziya Partî de, li Cizîrê tune bû, lê çend dost, ne zîdî, hêjmara tiliyên destekî (48) li Dirbêsiyê, amadeyê saziyê bûn. Holê berpirsiyarên Civata Xortan bûn berpirsiyarên Partiyê. Û hevalên wan yên komikan bûn komikên rêxistina Partî. Ji bo vê hevalên qamişlo ji destpêkê de, roleke wan mezin di Partiyê de hebû. Van bihevalên xwe yên din re, gelekî xebitîn, ta rêxistina Partî firehkirin. Û di dema girtinan de, gelek ji hevalên qamişlo xwe veşartin û xebat berdewam kirin û bi hevalên din re çalekiyên rêxistinî û ramyarî kirin û berpirsiyariya xebatê kirin û barekî giran, weke hevalên xwe, an zêdetir hilgirtin û gelek qurbanî dan û gelek hatin êşandin. Û xebitîn ji bo yekîtiya Partî û dûre ji bo rêya Partî ya siyasî û îdîolociya wê biparêsin. Ji bo van hemûwan, rola hevalên Qamişlo di Partî de berçav bû û kartekerê wan, li ser saziya Partî li Cizîrê mezin bû. Giraniya wan di hundirê Partî de hebû. Hevalên Qamişlo her û her berpirsiyarên bilind bûn. Di komîtiya deverê de, her û her ji xeynî xwe bêhtir bûn û kartekerê wan li ser şaxên din hebû. Ev rola he hişte hin heval xwedî dilbijok, weke hinek ji navdarên Dêrkê, yên endamitiya komîtiya deverê dixwestin, di rûyê wan de rabin û gelek astengan peydabikin.

Di konfiransa yekê de, şibata 1962 an, ji hevalên Qamişlo dido, Mihemedê Mela Ehmed (Tûj) û Xalid Meşayix bûn endamên komîtiya navendî. Û mekteba komîtiya devera Cizîrê, her û her di destê Ebdilayê Mela Elî û Mela Mihemedê Neyo û Ebdilsemedê Mela Xelîl û Mihemed Mistefa, Hesenê Bişar, Ezîzê Dawê, Ebdilferîd Ebdila, Mela Dawid de bû. Û dema komîtiya devera Cizîrê (ji bo hin sedemên xweyîtî) bû dû komîtî, yek li rojavayê

Qamişlo û ya dî, ji Qamişlo û rojhilatê wê bû. Ya li Qamişlo ji (Ebdilayê Mela Elî, Mela Mihemedê Neyo, Mihemed Fexrî, Ehmedê Elî û Mihemed Mistefa) bû. Ya dî ji Xelîlê Ebdê (Sor), Birahîmê Dawid û Ebdilferîd bûn. Yanî nîvê ya rojava (Mela Dawid û Ebdilferîd) hevalên Qamişlo bûn. Û dema levnekirnên zîndanê belav bûn, hevalên Qamişlo, bê dû dilî, bi helwesta Osman re bûn. Erîşî Dr. û hevalên wî dikirin. Çinku di nerîna wan de û di bawerya wan de, ku helwesta Osman rastbû. Û bivê re jî, biryarên serdariya partî, di wê demê de, ev helwesta he hildigirt. Sebvê bûn kelem di rêya piştevanên burjiwazan de û yên Dr. de jî.

Holê serdestiya hevalên Qamişlo, di sala 1961 ê de, li ser saziya partî li Cizîrê, hate xuyakirin. Hinekan xwestin vê kontirola wan kêmbikin, an hilînin, lewre kirin, ku komîtiya navendî biryar bidê bi pişkirina saziya Cizîrê, ser dû deverên sazî, şûna yekê (weke çawa berê bû). Devera rojavayê Qamişlo û ya rojhilatê wê. Di gomana wan de, belkî pişka rojavayê Qamişlo bikevê bin siha wan de û di paşerojê de roleka xwe bileyizê. Vêca hincet kirin ku Cizîr deverekî firehe û hevalên wê gelekin û guhdaneke bêhtir jêre divê.

Koma Qamişlo dijî vê xwestekê ranebû. Çinku wê dît ku heval û dostên wan têdigihîjin ku hevrikiya heyî ji bo çiye? levnekirin li ser çiye? Yanî ramanên levnekirnê ji wan re roj bi roj zelal dibûn. Û belavkirina ramanên Dr., ne di pijirandin Dema Cizîr bû dû deverên rêxistinî, dîtin nîvê endamên komîtiya rojavayê Qamişlo, hevbendên helwesta koma Qamişlo ne. Yanî, weke li cem miletê me dibêjin, hisabê sûkê û malê tev derneket. Sebvê dema hevbendên Hemîd di şaxa Amûdê de, hatin rawestandin û Xelîlê sor jî, berpirsiyarî jê hate kişandin, eva he bû derbeke mezin ji Hemîd re, çinku li meydanê ma tenê (weke Xelîlê sor dibêjê), lewre got ezê li mala xwe rûnim û nema çalekiyên siyasî bikim. Gomankir ku belkî hevalên din (yên Qamişlo û xeynî wan jî, ber bi wî ve herin û tiştê bixwazê jê re pêkbînin). Lê serdarî guhneda vê kirina wî û ew rawestand (çalekiyên wî ji bo demeke dirêj, ne xuya, cemidand). Ev rawestandina he domkir ta konfiransa sisyan, di Tebaxa 1964 an de.

Lê bi vê re jî, koma Qamişlo bi çalekiyên (Melan) razî ne di bû. Ewên hevbendiya Şêx dikirin. Çinku wan jî, di nerîna Koma qamişlo de, saziya partî levdixistin û komgirêk çêdikirin. Lewre

Institut kurde de Paris

koma Qamişlo dijî wan jî rawesta û piştevaniya biryaran kir, di gel ku koma Qamişlo û koma van Melan, di van xalan de digihan hev:

1- Dijî heryekî bêjê: Partî civateke çandiye, ne Partiyeke siyasiye.

2- Her dû alî dighinhev di gotina, ku Hemîd helwesta xwe, ji helwesta Osman û hevalên wî ya di zîndanê de, guhertiye, yanî ji helwesta xwe ya berê vegeraye.

Holê mirov sê koman dijî serdariyê dibînê, lê birastî, dijî yên Qamişlo bûn:

### 2- Koma Dêrkê:

An weke wan navê (dijber) li xwe kirin. Di serokatiya wan de, Kin'anê Egîd axa, yê ji destpêkê de, dijî hatina (Fetahê Hacî Ebdilkerîm, Ebdilezîzê Hecî Hisên û Newafê Nayifê Paşê) di partiyê de, bû. Lê dema serdarî bi hatina wan razî bû, wî jî nema dengkir. Û dema dan û standin bi began re çêbû, ew dijî hatina wan rabû û weke berpirsiyarê şaxa Dêrkê, xwest ew, weke komeke şêwirdar, ji serdariya partî re bin.

Lê di zîndanê de piştevaniya Dr. Kir û dûre, dijî serdariyê nemaze koma Qamişlo, rawesta û xwe digihand hevalan, ji bo bihevre bixebitin, da serdariyê bavêjin (yanî biguherin).

Koma Dêrkê, ji bo şerê serdariyê bikê, jevxistina saziya Dêrkê (ya berî girtinê, bi mehekî, çêbû yî), ji xwe re kiribû hincet, nemaze tu rêxistin li Dêrkê, piştî jevxistinê, nehat avakirin. Çinku dem gelekî teng bû, di navbera jevxistinê, di 14. 7. 1960 î û girtinan di 12.8. 1960 î de, yanî kêmî mehekî bû. Heval di vê demê de bigirtin û bazdanê mijûl bibûn. Lê dema jevxistina şaxa wan çêbû, hevalan destikeke nû, ji serdariya şaxa wan re, ji Ehmedê Mela Birahîm û Ebdilqadirê Gurî (Qadê) damezrandibû, lê ew jî hatin girtin. Vêca Dêrik ma vala bê rêxistin, Kin'an û hineke dî, têde weke dijberan diçûn û dihatin, bê tu kes di rûyê wan de bisekinê.

Dijberiya xwe ji serdariyê, nav bera 1963–1964 an de eşkerekirin û şerê Osman û Hemîd û Mihemedê Mela Ehmed, weke ser sebebên hemû astengên partiyê, dikirin.

Van, ji bo xwe bighîn dijberan, an hin kesên nû, yên dijî serdariyê, li fersendan digerehan. Kin'an dibêjê: "Em dijberên Dêrkê, ji bo guhertina serdariya partî dixebitîn.

Me dixwest di hundirê saziya partî de, dijberan payda bikin. Ji bo vê me xwe dighand endamên hemû şaxan". Gotina xwe didomîne: "ku Mecîdê Haco, bi rengekî veşartî piştevaniya me dikir. Me, Hemîd jî dît, wî dixwest me, bi aliyê xwe ve bikşînê, lê em pê bawer nebûn. Cegerxwîn jî xwest bi mere bikê, lê me ew qebûlnekir " .

**3- Koma burjiwaza Kurd (Beg)**

Ev koma yekemîn bû, derveyê saziya partî rawesta û Erîşî serdariyê kir (piştî, di peyîza 1958 an de, guftûgo, ji bo yekîtiyê bi wan re têkçû). Hinek di hundirê saziya partî de, bi wan re rawestan û piştevaniya ramanên wan kirin û dixwestin wan bînin nav rêxistinê de û bikin di serdariyê de. Û hinek derve yê saziyê jî, piştevaniya wan dikirin. Hevalbendên wan, di komîtiya deverê de, Mecîdê Haco û Mihemed Fexrî bûn û di şaxa Cerahê de, Ehmedê Fedîle û Ebdê Berakat û Hisênê Ehmed bûn. Van hemûwan piştevaniya burjiwazan dikirin.

Van, ji bo xwe bikin yek, xwe gihandin dijberên Dêrkê û Hemîd jî, da dijî serdariyê bi hev re rawestin û wê bavêjin û cihê wê bigrin.

**4- Koma Hemîdê Hacî Derwêş**

Berî her tiştî emê bipirsin, çima Hemîd ev helwesta he girt?

Çima xwest komgirêkek, dijî hevalên xwe di serdariyê de, nemaze yên Qamişlo damezrînê? Sedemên vê çine?

Bi sedema rola Hemîd ya giring, weke damezrevanekî

Partî û endamekî serdariyê û dûre kartekerên helwesta wî, ya siyasî û îdyûlojî di partî de, emê bi hûrî lê binêrin.

Gora nerîna min:

Hemîd di çend qunaxan de bûriye, di wan de ramana wî ber pêlên guhertinê ketye, ta giha, ya di rapora wî de, ji bo komîtiya

Institut kurde de Paris

navendî nivîsandî, lê ne dayê û di nav heval û dostên xwe de, bi rengekî vaşartî, dûre bi hinekî, eşkere belav kir. Têde ramanên xwe yên siyasiyên nû, ewên civateke (komeleke) çandî, ji bo kêm netewa Kurdî, a li Sûryê dixwest.

Hemîdê Silêmanê Hacî Derwêş, damezrevanê didwan ê Partî, piştî Osman Sebrî, xortekî netewî germ, di siyasetê de û di çanda siyasî de, kêm serpêhatî bû, (weke wî li ser xwe, ji min re gotî). Beşdariya wî, ta destpêka sala 1959 an, di çalekiyên Partî de, gelekî kêm bûn:

1- Di danîna rêzana Kurdî, bi Osman Sebrî re.

2- Di wergerandina rêzanê, bal Erebî ve, an danîna rêzaneke nû, dema Reşîd û hevalên wî hatin.

3- Di danîna rêzanê sala 1958 an de, dema komîtiya navendî (di nav wan de Dr. Zaza) xwestin bi burjiwaza Kurdî re yekîtiyê damezrînin. (ew rêzana kû hemûwan, di girtina sala 1960 î de, jê bazdan).

Lê rojên teng û berdewama xebatê û karên siyasî, Hemîd hînî gelek tiştan kirin û di dawî de ew gihandin ku ramanên Dr. Zaza yên di zîndanê de digotin, bi wan, di sala 1961-1962 bi awakî veşartî û di sala 1963 an de eşkere bangbikê û doza civateke (komeleke) çandî, ji dêlî partiyeke siyasî, ji bo kûrdên kêm netewe (eqeliye) li sûryê bikê, (yanî Kurd li Sûryê ne miletekî ser bixwe ye). Ev herdû xalên he, bûn sedemên levnekirina serdariyê bi Hemîd re.

Vêca em binêrin ka çawa Hemîd giha vê ramanê?

Di nerîna minde, pêveçûya xebata Hemîd di Partî de, weke min li jor da xuyakirin, welê bû, ta giha wê ramanê.

Weke min û hevalan, xwe nas dikir, welê jî, me Hemîd nas dikir, ku em hemû wekhev yek raman hildigrin. Ta em gihan girtina sala 1960 î. Di destpêkê de, wî piştevaniya raman û rêzana Partî kir. Û me dît, dema nûçeyên levnekirina zîndanê bihîst, çi di dema pirsan de, an li ber dadegehê, bi aliyê helwesta Osman û hevalên wî girt. Û me dît:

1-Digot ku benda (rizgarkirin û yekirina Kurdistanê) bendeke ji bendên rêzanê ye, ne raste jê bazdin. Lê di dawî de, hemûwan (û

ew jî yek ji wan) gotin ku hebûna wê bendê, ne raste di rêzanê de bê, divê bê guhertin.

2- Digot Partî, partiyeke siyasiye, dixebitê ji bo bidestxistina armancên netewî yên miletê Kurd, ewê naxwazê ji Sûryê cida bibê û na xebitê ji bo parçekî jê veqetînê. Lê dixebitê ji bo zor û zordariyê û newekheviyê, li ser kûrdan hilînê û dixebitê ji bo dîmûkratî di welêt de belavbibê.

Dema em di zîndanê de bûn, me ev tiştên he, li ser hevalên xwe yên derveyî zîndanê (di nav wan de Hemîd) bîhîstin. Ev Hemîdê he, endamê serdariyê, kir ku nûçeyên levnekirina girtiyan di zindanê de bighê serdariya Partî li Kurdistan Iraqê, ta wan jî, piştevaniya xwe ji helwesta Osman û hevalên wî re dan xuyakirin û navê Dr. ne anîn serlêvan û ser singê rojnama xwe "Azadî ji bo Osman Sebrî û hevalên wî re" nivîsandin. Ev bû rola Hemîd ya berê !!!.

Min holê Hemîd naskir. Lê hate guhertin, gelo çawa?

Dezgehê parastinê (el Mebahis) nekarî derba xwe li rêxsitina Partî li Cizîrê bidê û nekarî saziya wê eşkere bikê û jevbêxê, weke çawa li Helebê û çiyayê Kurdan kirî.

Bi xurtiya xebatkerê şoreşgêr, Hemîd hember hovîtiya wan rawesta û heval bizirav dikirin, da berdewamê xebatê bin û xwe nesipêrin mebahisan. Û bi hevalên xwe re xebitî, ji bo Partî bimînê biheve û jev nekevê.

Mebahisan ev helwesta wî, ji xwe re dîtin berberiyeke mezin. Ji dêlî Partî jevbikevê, yekîtiya wê xurtir bû. Û cemawerên milet, bi hestên neteweyên gurkirî, xwe li dora hevalên wê danhev. Û yên bazdayî hembêz kirin û di malên xwe de veşartin û xwedî kirin. Nehişt bikevin nav lepên Mebahisan, yên jehir dayî.

Hember vê rewşê, dezgehê parastinê, dest bi awakî dî, bi bazdayan re kir, ew jî hin kes ji malbata wan girtin û gelek ew êşandin, da bazdayî xwe bidin dest wan. Welê bi Hemîd û Xalid Meşayix re kirin. Bavên wan girtin û gelekî li wan dan û ew êşandin. Bavê Hemîd, Silêmanê Hacî Derwêş, yek ji serokên eşîra Kîkan bû, li dora Dirbêsiyê, girtin û gelekî êşandin, ji bo li Hemîd bê tengkirin da xwe bispêrê wan. Lê Hemîd xwe neda dest wan û xebta xwe berdewam kir.

Lê çawe bê, Hemîd jî miroveke, hestên malbatî û mirovantî di canê wî de dilivin. Dît ne ji erkê kure, bavê xwe bide kuştin. Jê tê xwestin wî xilasbikê.

Vêca ev êşandina bavê wî, kartekerek mezin li ser wî hişt û bi şîreta hin hevalan û bi gomana guhertina rewşê, ji Sûryê dûrket û çû Iraqê. Sê mehan li wê dê ma. Berî çûnê, hinekan, hember zordariya li malbata wî dihat kirin, gotnê eger razî bi bê, yê hinekan bikin navçî, nav wî û desthilatan de, ji bo rê bidnê, da xwendina xwe di zanîngehê de berdewam bikê û ji siyasetê dûr bikevê. Lê Hemîd bi vê şîretê razî ne bû û xebata xwe berdewam kir.

Di havîna 1961 ê de, ji Iraqê vegereha û gomana ku hikûmeta Iraqê (Ebdilkerîm Qasim) û Partî levbikevin û şerê hev bikin, bixwere anî. Û di nav gotinên xwe de got (weke Xalid Meşayix û Mela Mihemedê Neyô gotin, piştî bi wan re civî) ku Partî li Sûryê barekî giran hildigrê û ne gereke, wî barê hewqas giran, hilgirê, ji wan nayê ber wî barî de bidin (mebesta wî armancên siyasî yên rêzanê bû). Ev ramana wî, ne weke ya berê bû, hatibû guhertin. Weke yek bêjê, ku hin tişt jêre hatibûn gotin û hiştin ramana xwe ya berê bitemamî biguherê. Û berî herê Irqê jî, me dîtbû ji hin hevalên xwe re, bi veşartî digot: Divê hûn di levnekirina Dr. û Osman de, bi alîkî negrin. (weke Xelîlê Sor û Tahirê Sifûg û Ezîzê Dawê gotin). Xalid û Mela Mihemedê Neyo jî gotin, ku wî digot hevalan, êrîşî hevalên Dr. yên li Dêrkê nekin û dev jiwan berdin. Lê Xalid, hingê lê vegerand: ew (yanî xelkên Dêrkê) êrîşî me dikin, çawa em dengnekin? Û dîsa em wî dibînin, ji hevalên zîndanê (Osman û hevalên wî) dixwazê, bi Dr. re levwerin. Lê evên he, yanî Osman û hevalên wî, namekî bihevre dinivîsin, ji serdariya derveyî zîndanê re rêdikin, têde di bêjin: ji bo levhatinê, rê nav me de nemaye. Û têde sedemên levnekirinê didin xuyakirin. Reşîd dibêjê ku Osman, di wê demê de jêre got, ku ew di helwesta Hemîd, ji wan, bi şike?

Ev helwestên, li jor, me dan ber çavan, didin xuyakirin ku helwesta Hemîd hinûhinû ji helwesta Osman û hevalên wî di zîndanêde tê veqetandin. Yanî ji ramanên berê, yên digotin vedigerê û bal ramanên Dr. ve diçê. Yanî ji gotina ku Partî, partiyeke siyasiye, vedigerê bal Partî civateke çandiye, na xebitê ji

bo armancên siyasî, ji miletê Kurdê Sûryê re. Tenê ji bo armancên civakî dixebitê.

Di encama vê helwestê de, em dikarin roleke wî, di hilbijartina Dr. Zaza de, ji bo nûnerîtiya Kurdan, di perlemana Sûryê de, di 1.12.1961 ê de, goman bikin. Di vê helwesta bi Dr. re girtî, berjewendiyên wî û yên Şêx digihan hev. Lê her yek daxwazeka wî hebû. Şêx dixwest di vê hilbijartinê de, yekî bi nav û deng rex wî hebê, da bikarê bi serfirazî serbikevê. Vêca yekî weke Dr., xwedî pelgenameke mezin û bi nav û deng, wî cihî dadigrê, (weke Ebdilferîd gotî) lewre rola Hemîd bikeyfa Şêx bû û dengnekir. Ya Hemîd ew bû, ku kartekerên piropegenda mazin, ya dijî Dr. hatî kirin, di enacama helwesta wî, ya di dadegehê de û di dema pirsan de, winda bibê û Dr. serfiraz derkevê û ramanên wî cihê xwe bigrin.

De vêca, ev awayên he û helwestên Hemîd girtîn, hiştin ew ji destpêka sala 1963 an de, ta Tebaxa 1964 an, hinûhinû ji piştevaniya armancên miletê Kurd li Sûryê vegerê. Eva he hişte levnekirin di navbera wî û komîtiya navendî de eşkere bibê. Ew jî, ji xwe re hêdîhêdî dixebitî û heval didîtin û di nav wan de rapora xwe dixwend û têde ramanên xwe yên nû digotin, (weke Ebdilferîd û Tahir Sifûg, yên ew rapor dîtîn digotin). Û bi vê re jî, dan û standin bi dijberên serdariyê re, weke yên Dêrkê û yên Began re dikir.

Ji alîkî dî ve, serdariyê ev levnekirina he di nav hevalan de û di belavokên xwe de, belavnedikir û xalên levnekirinê ji hevalan re nedida xuyakirin, loma piraniya hevalan, man dûrî rastiya levnekirinê, ya, di qûnceka tarî de ma.

Hevalan dibihîstin ku levnekirin di nav serdariyê de heye lê çiye? çine sedemên wê ? ji wan re ne xuya bûn !!!..

Yên nîzîkî serdariyê, weke endamên komîtiya deverê, an hinek yên şaxan, dizanîn sedemên levnekirinê çine, lê hevalên komikan, ewên gelek, nedizanîn, an kêm ji wan dizanînin, an bi awakî guhertî û ne serast, ji dijberên serdariyê bihîst bûn, ewên vajiyê rastiyê ji wan re gotibûn. Kiribîn ku levnekirina heyî ji bo diravane (pere) û ji bo cihê bilind, di Partiyê de bû.

Û holê rastî, di nav bûyerên gelek û peyhev û serhev de kombûyîn, winda bû. Rê jêre ne bû, da eşkere bibê.

Institut kurde de Paris

Dûre hinek ji endaman, yên rastiya levnekirnê dinasîn pêgirtin û piştevaniya ramanên serdariyê, yên tiyorî û siyasî kirin, (nemaze dema serdarî jevket û tû kes, ji bilî Xalid Meşayix li Cizîrê û Mihemde Enwer li çiyayêKurdan û Helebê nema). Van kesan bi diruşmên serdariyê bangkirin û bergiriya wan kirin û li ber wan de dan. Û dema dîtin serdarî nema dikarê, Partiyê ji raman û serdestiya burjiwazan biparêzê, di rûyê wan de rabûn û xwestin çepitiya Partî, hember ramanên Dr. û Hemîd, yên dijî armancên milet biparêzin.

### C- Serjimara awarte, li Cizîrê

Di roja 22. 8. 1962 an de, serokê komara Sûryê (Nazim El Qudsî) bi wezîran re civî û bi wan re babeta serjimarê li parêzgeha Hisiça vekola û biryar pê standin. Serokê komarê fermana (mersûm teşrî'î hêjimara) / 93 / an, roja 23. 8. 1962 an, pê da. û rojnama dewletê, di hêjimara /41 / ê, ya sala 1962 an de, ew weşand. Têde dibêjê:

Fermaneke komarî, hêjimara / 93 / an. Dem / 23. 8. 1962. ji bo:
Li darxistina serjimara giştî ji welatiyên parêzgeha Hisiçe re
Serokê komarê.

Gora ferman, hêjimar/ 1 /,dem / 30. 4. 1962. û gora biryara ji encumena şalyaran a bin serokatiya wî de, hêjimar /106 / dem / 22. 8. 1962 an de, ferman didê bi:

Benda (1) - serjimareke giştî ji welatiyên parêzgeha Hisiçe re, di rojekî tenê de, bê çêkirin. Şalyarê pilanan gora pêşniyara şalyarê hundirê welêt, yê biryar bi wê bidê.

Benda(2) - Gora biryara encumena navendî ya serjimarê, dayira serjimaran di şalyara pilanan de, yê bi vî karî rabê û tiştên gerekin ji bo vê serjimarê yê pêkbînê.

Ev fermana serokê komarê, ji / 24 / bîst û çar bendan bû. Û ew serjimar di rojekî tenê de / 5. 10. 1962 / an de, lidarxistin.

Havila wê serjimarê (weke dibêjin: ya sitar) çiqas xirrab bû mejiyên wan nijadperestan di serê wan de fûrî û ev serjimara qirêj afirand. Bêhtirî 150 sed û pêncî hezar Kurd, bi xêzeke biçûk, ji serê pênûseke jehirdayî, ji nasnama wan hatin şelandin. Û di cih de, bûn

biyaniyê vî welatê, ku ew û bav û kalên xwe, li ser xaka wî, xwedê dayîn û mezin bûyîn.

Mixabin di defterên dayira nasnamê de, me dît, hinek zarok bûn bê dê, an bê bav. Mêr bûn bê jin an bê zarok. Bav bû bê nasname zarok bûn xwedî nasname. Mêr bû biyanî, jin bû welatî, an vajiyê wê.

Û holê jiyana wan levket. Bi rex dehên hezaran, yên navên wan di wan defterên serjimarê de, nehatîn nivîsandin, man bê nasname, bê nav, yanî ne biyanî û ne welatî, dewlet bi hebûna wan erênî nakê, kesayetiya wan a mafî, di dewletê de nema. Û defterên berê, yên navên jinan an navên zarokên nû, an yên miryan, nema peydadibûn, ew defter windabûn. Û bi hezaran nav hatin guhertin. Hinek li navê wan hate zêde kirin, an jê hate kêm kirin. Û holê mala Kurdan bi vê serjimarê wêran kirin.

Piştî dawîkirina roja serjimarê, bi gotina encûmena bilind ya serjimarê, encûmenên nû û piçûk, hatin damezrandin, ji bo navên di defteran de hatîn nivîsin, yên welatî ji yên biyanî, an goman li ser hebûna wan heyî, jev veqetînin. Bi vê riya he jî, ew karmendên ev kar dikirin, bikayfa xwe bûn, azad bûn, serê pênûsa xwe li kîj navî bidin, wî bikin biyanî, an navê wî yekcarî ji wê defterê hilînin, an navê wî biguherin, tîpan jê kêmbikin an lê zêdebikin. Tu yase nebû hember wan rawestê.

Paşeroja Kurdan, bi bextê wan karmendan û yê dewletê ve, ma bû girêdayî, ew bextê li cem herdû wan, tu jê nema bû. Bi vî awayî, Kurdên ser xaka bav û kalan, biyaniyan, ew ji wê xakê dûrkirin, cih ji wan re li wî welatî nehiştin. Hinek ji wan kirin biyanî û hinek kirin bê nav û nasname ji herdû celeban kişandin û hineke din ji Kurdan kirin welatî.

Holê dewletê serberadayetiyeke mezin kir di defterên nasnamên bajar û gundên Kurdan de. Havila vê serberadayetiyê li Kurdan tenê giran hat. Tu miletên din, ne ketin ber vê nijadperestiya hov de.

Ev serjimara he, diyariya ramana neteweyî ya şovên Ereb, ji Kurdan re bû.

Desthilatdarên wê demê, xwestin xirabiya bi serê erebên Sûryê kirîn, (herfandina komara Erebiya yekbûyî) veşêrin, lewre ev karê

qirêj bi serê Kurdan kirin, da xwe li ber çavên wan şîrîn bikin û qirêja xwe veşêrin. Û bi vê jî, xwestin dijminatiyê di dilê ereban de, dijî Kurdan bi afirînin. Ev Kurdên her û her digerehan ku bi aştî, birex birayên xwe yên ereb bijîn û li mafên xwe yên netewî dipirsin, da bi serfirazî û bi rûmet bi hev re bijîn.

Dîrok, van Kurdan nasdikê, ku her û her di biratiya xwe de bi ereban re rastbûn. Wan di dîroka kevin de, gelek kirin ta ala misilmanî bin siha ereban de bilind bibê û ber erdê ereban de gelekî qurbanî dan. Û di dîroka nû de jî kirin, ta gelek ji erebên bi wijdan, gotin biratiya wan raste. Em dikarin wê rastiyê di gelek cihan de bînin ber çavan, di şerê kolîdarê Firensî de, li Cizîrê û di şerên bakurê Sûryê de, di şerê Tel Kelex de û di şerê Xûte de (dora Şamê) dibînin.

Li parêzgeha Cizîrê, ya nijadperestan, berê xwe dan Kurdên wê û pilanên xwe, weke vê serjimara qirêj û kembera Erebî ya ji wê genîtir, di serê wan de birin serî.

Van Kurdan, li Cizîrê şerê firensizan kirin, serleşkerê wan, kaptên Rogan, bi qeymeqam û gelek leşkeran ve kuştin. Kurdan gelek pilanên Firensizan nepijirandin, weke: dema Firensizan gotin Kurdan, emê dewleteke Kurdî ji were li Cizîrê damezrînin, lê Kurdan, ev, ji wan nepijirandin û bi serhildana Amûdê dijî Firensizan rabûn. Di wê demê de, gelek Erebên bi nav û deng, xwe dikirin bin çengê firensizan de û zilamtiya wan dikirin.

Rastiya Kurdan evahe, erebên herfandivanên dewleta Erebî ya Yekbûyî, veşartin û xwestin pêre, rûçikî reş gemargirtî, ji dewleta erebî re û ji netewa erebî re deynin berçavan. Ew bê bextî li Kurdan dikin, dema dibêjin ku Kurd cida bûnê ji Sûryê dixwazin û rastiya dîrokî û ya berçav diguherin. Di gel vê jî, Kurd yê bimînin rast, di biratiya xwe de, bi ereban re û bi Sûryê re. Kurd dixwazin Sûrye dewleta dadegehiyê û dîmûkratiyê bê, tu cida bûn û newekhevî nav miletê Kûrd û Ereb û yên din de, ne bê.

Û holê wan nijadperestan, bêhtirî / 150 / sed û pêncî hezar Kurdên welatî, ji xwendin û zanebûnê dûrkirin (gora pilana wan: wan nedin xwendin, yê bibin ereb) û ji kar û karmendiya dewletê dûrkirin, ew jî, gora pilana wan (wan birçîbikin, yê bibin Ereb). Û Kurd ji nexweşxanên dewletê bê behir kirin û xizmeta welat li wan



Institut kurde de Paris

qedexe kirin û li xortên wan, leşkerî û karê polîsên dewletê, qedexekirin. Xwestin welatperweriya wan, bi nasnamêre ji wan bikşînin, lê ne karîn, çinku ew ji wan welatperwertir bûn.

Ev xirabiya wan hemû, weke gotina wan, ji bo "xwe ji xirabiya Kurdan biparêzin". Û ji bo "parastina wê devera Erebî "ji Kurdên bi dizî ve, ji Turkiyê hatin wê deverê.

Wan jibîrkir, an xwe didin jibîrkirin, ku eşîrên Kurdan yên niha li Cizîrê heyîn, weke Hesinan, Koçer, aliyan, Ebasan, Hevêrkan, Hacî Silêmanan, Dorikan , Kasikan, Temikan, Mêrsînan, Gabaran û Deqoran, Milan, Kîkan û Milanê Ibrahîm Paşa û gelek xeynî wan jî, ev hemû, gora gotina wan, piştî dewleta Sûryê hate avakirin, bi dizî ve hatin Sûryê. Lê mixabin ne rastiya berçav û ne jî ya dîrokî, bi ramana nijadperestî re feyde nakê, weke ya van cidakerên kevneperest, an bi ye kî weke (Mihemed Teleb Hilal) re, efserê dezgehê parastinê li parêzgeha Hisiçe, yê lêkolînek li ser Cizîrê nivîsand û da serdariya Partiya Be'is û di meha Eylûla 1963 an de hate weşandin. Û pilanek bi navê (kembera Erebî) di lêkolîna xwe de rêdixê û ji dewletê dixwazê wê li Kurdên Cizîrê bibe serî. Bi rêya wê kemberê, yê dewlet destê xwe deynê ser gundên Kurdan ên li ser sînorê Tirkiyê û Iraqê, bi dirêjahiya 375 km û pehnahiya 10 -15 km û Kurdan ji wan derêxin, bi xweşî an bi reşî be. Û Kurdan bibin dereke dî, ne nas û eşîra (Şemer) ya Ereb bînin cihê wan, gora pêşniyra wî, an xeynî wê eşîrê (9). Ji bo Kurdan jevbêxin û wan jevbelavbikin û di nav ereban de bibişivin û hinûhinû wan winda bikin.

Di wê pilanê de, M.T.Hilal, li ser Kurdan dibêjê "Kurd mileteke bê dîroke û bê bajarvanî û bê zimane û bê bingeheke nijadiye. Û tiştek li cem wî nîne ji bilî, kuştin û hêza herfandinê û hovîtî, ev sifetên li cem xelkên çiyan hemûwan heyî". Jibîr kirye an naynê bîra xwe, ân nexwendiye, tiştên rojhilatnasên biyanî, li ser Kurdan nivîsîne. Em gotinên wan birêzan (ewên ji miletê me biyanîne, lê dostên wî ne) yên li ser Kurdan nivîsîne, naynin berçavan, çinku yê bi me re dirêj bibê, emê tenê navên wan camêran bêjin belkî bikevê di dilê wî de û li nivîsandinên wan vegerê û li şaşîtiyên xwe poşman bibê !!. Weke: V. Mînoriskî, Sêr Sednî Smêth, Spayzir, Vilciviskî, Mar, Lerch, Lazarîv, Hesretyan, B. Nîkîtîn, Jab û xeynê

Institut kurde de Paris

wan. An ew jî, weke kur amê xwe, marşal Ebdilselam Erif, serokê berê yê komara Iraqê, nabînê xeynî ku (Kurd ji Kurd bin Emro bin Amir Maa el Semaa) yê ereb. An weke hinek dibêjin ku Kurd ji cina ne !!.

M.T.Hilal, pilanek ji / 12 / dwanzdeh bendan, dijî Kurdan li Cizîrê pêşniyar dikê û ji hikûmetê dixwazê wan bibe serî:

1-Siyaseta qutkirin: Kurdan mişxet bikê û jev belavbikê.
2- Siyaseta nezan kirina Kurdan: Kurdan ji her çandê, (ji ya Erebî jî), bê behir bikê.
3- Siyaseta Birçîkirin: Nehêlê Kurd tu karî bikin.
4- Gunehkaran bidin Tirkan: Hemû kesên ku beşdarên şoreşên dijî tirkan bûyîn û ji destê tirkan xilasbûyîn, wan careke dî bispêrin tirkan.
5- Afrandina bendîtiyê di nav Kurdan de û dijminatiyê di nav wan de gur bikê.
6- Kember: gundên Kurdan li ser sînorê Tirkiyê û Iraqê ji kurdan valekê.
7- Cihkirina Ereban di nav gundên Kurdan de.
8- Siyaseteke leşkerî: Cihkirina ordiyên leşkerî di devera kemberê de, karê wan ordiyan, gora pilanên dewletê, jevbelav kirina Kurdan û cih kirina ereban li wê dê.
9- Kar anîna sosyalizmê, bi avakirna zeviyên giştî ji Erebên nîştevanên deverê re û hînkirna wan li ser şerê çekdarî.
10- Her Kurdek nezanê bi zimanê Erebî biştexlê, mafên bajarvanî û peşdariya hilbijartinan, lê bê qedexekirin.
11-Guheztina şêx û melayên Kurdan ji deverê û ji dêlî wan, şêxên Ereb, bicih bikin.
12- Propegendekî xurt û fireh dijî Kurdan, di nav Ereban de, gur bikê.(10).

Ji bo hikûmet, pilana " kembera Erebî " bibe serî, dest danî ser erdên Kurdanên ber sînorê Tirkiye û Iraqê, bi dirêjahiya 375 km û pehnahiya 10-15 km (çêtirîn erdê cizîrê, ji bo çandinyê) û ji cotkarên Kurdan stand û ji wan xwest, malên xwe ji wan gundan barbikin û herin nav eşîrên Ereban û xwe li wê dê bicih bikin. Lê cotkarên Kurd daxwaza wê nebirin serî û bi gotina polîsan nekirin û biryara

Institut kurde de Paris

Partiya çep a Kurd, birin serî û dev ji erdên bav û kalan bernedan.(11) .

Û holê hinek ji pilana hikûmetê neçû serî û cotkarên Kurd dev ji gundên xwe bernedan, lê zarokên wan man birçî û pariyê nanê wan, ma di nav kêlbên hovan de. Nemaze piştî hikûmetê erd li cotkarên ereban tenê belavkir û neda cotkarên Kurd.

Hikûmetê hinûhinû bendên pilana M.T. Hilal, dibirin serî. Weke : tenê karmendên Kurd, ji parêzgeha Cizîrê guheztin bal parêzgehên din, di hundirê Sûryê de û ew ji devera wan dûrkirin. Û herwiha jî, her Kurdekî polîs an leşker bû, ew ji karê wî derxistin, an guheztin karekî dî, li cem şalyareke dî û ew kar (polîsîtî an leşkerî) li ser Kurdan hate qedexekirin. Bi vê re jî, desthilatan navên bajarokan û yên bajaran guhertin bi navê erebî, weke yê Dêrkê (qeza) kirin el Malikiye. yê navça Til Koçer kirin el Ya'irûbiye. û yê Çilaxa kirin el Cewadiye. û yê Tirbispî kirin el Qehtaniye. Û her wiha jî navê hemû gundan, guhertin kirin erebî. Û li Kurdan bi her awayî teng kirin û ew dehfandin bal bazdan û mişxetiyê ve, ji bo, bi bê dengî, deverê bikin devereke erebî.

Bi vêre jî, hineke dijî, ji biryarên zordar di heqê Kurdan de girtin, weke karê abûrî li wan qedexekirin, ta radekî ku kesê Kurd, eger dezgehê parastinê erêniya xwê nede xuyakirin, ne dikarî bi tu karên bazirganî rabê.

Ji Kurdan re çênedibû ku mekînên çandiniya zadan bikirin an bifroşin, herwiha erd û xanî jî. Eger xaniyek xirabibê û dezgehê parastinê, avakirina wê nepijirînê, çênabê bê avakirin. Û eger yek bixwazê jinekê bînê, navê wan nayên nivîsandin di defterên nasnamê de, eger dezgehê parastinê razînebê. Ev qedexe kirinên he hemû, pêşiya kesê Kurd bibûn asteng, nedihiştin ew bilivê an karekî, an xizmetekî ji welatê xwe re bikê. Evahe hişte dever, roj bi roj paş bikevê.

Gelekî zehmet bû ji yê Kurd re, eger bixwazê herê bejarekî dî, her gav polîsan dikarîn wî bigrin, çi di rêde, an di wan bajaran de, çinku ew bê nasname bû (ecnebî bû) an navê wî di defterên dewletê de nebû (mektûm bû), vêca divwa şeva xwe, di nav çûn û hatinan, di navbera binikên polîsan de biqedînê, ta bikarê li otêlkî razê. (çinku ew Kurde, biyaniye, an bê nave).

Weke me got, hikûmetê pilanên Mihemed Teleb Hîlal dibirin serî, weke çawa bi serê gundê (Kevrê Dena) kirî:

Çîroka Kevrê Dena, çîroka her gundekî Kurd, bi rex yên ereban de. Lê ya Kevrê Dena fireh bû, ta radekî, ereban / 4 / çar zilam ji gundiyan kuştin û sisê birîndarkirn, di nav wan de jinek.

Kevrê Dena, gundekî Kurdaye, bi rex gundên hoza Şemer a Ereb, di navça Çilexe (el Cewadiyê) de ye, bi qeza Dêrkê ve girêdayîye. Ev gundê he yê Ehmedê Hecî Hisên bû û gundê Xirbê Cuhuwan yê şêxê Şemeran bû. Herdû wan gundên xwe bihev guhertin. Xirbê Cuhuwan bû yê Ehmedê Hecî û Kevrê Dena, dan Mihemedê Ibrahîm, ji bo ew û mirovên xwe, wê derê avabikin û tê rûnin.

Çîroka destdanîna şêxê Erebên Şemer (Diham El Hadî) li ser erdên Kurdan çîroka paşvegera Kurdan, hember pêşveçûna ereban, di bakur de, di erdên Kurdan de.(12).

Kurdên niştevanên gundên nîzîkê eşîrên ereban, bi sedema levnekirina axên wan, yên xurt û yên lawaz, dihişt yên lawaz berê xwe bidin ereban, da xwe bi wan xurt bikin, bi rex, gelek kesên ereb dizîtiya gundên Kurdan dikirin, ev dizîtiya he dihişt Kurd doza malê xwe li wan bikin, an dizan bikujin û evahe jî, divwa heyf bê hilanîn. Ji van tiştan, gelek asteng peyda dibûn, barê vê jî, li ser milê Kurdên dêmanî, yên li gundan rûniştî giran bû. Vajiyê Ereban, yên koçer bûn, her roj li derekî bûn.

Da Kurd xwe ji vî barê giran xilaskin, ji şêxên ereban dixwestin, wan ji dizîtiya zilamên wan (yanî yên ereb) biparêzin, hember hinek ji erdan. Û holê û bi hin awayên din jî, erd ji destê Kurdan derdiketin.

Di wê demê de, şêxê Şemer (Diham El Hadî) ji serpêhatiyan, sûd wergirt û ji bûyerên salên şêstan, weke dema serok Cemal Ebdilnasir, xwest yasa serastkirina erdan (el îslah el zira'î) bi karbînê. Û holê jî, dema Ba'isî bûn desthilatên Sûryê û gotin yê erdan li cotkaran belav bikin. Vêca, berî erdan ji vî şêxî bistînin, xwest xwe bidê xuyakirin ku dilxwazê eşîra xwe ye. Û yê erdên ji Kurdan standî, li erebên xwe belav bikê.

Ji bo şêxê ereban daxwaza xwe bibê serî, dest bi kotekiyê kir. Zilamên xwe yên çekdar anîn gund û erdên Kurdan, ewên dexil tê

Institut kurde de Paris

çandibûn, quliband, da bibe yê wî û dûre ji xwe re biçinê. Lê hayê çotkarên Kurd, ji pilana wî hebû û pê razînebûn, lewre bi zilamên wî re levketin.

Desthilatên dewletê piştevaniya şêxê ereban kirin û ji Kurdan xwestin bihedinin û tiştek dijî zilamên şêx nekin. Eger deng bikin tifingên Şemeran û yên polîsan jî, yê di singa wan de bin û hingê yê polîs wan bigrin û bikin zîndanan de.

Weke çawa bi xelkê gundê (Şebek), berî niha kirîn, dem a ereban xwestin erdê wan ji wan bistînin. Lê gundî bi xurtî dijî wan rawestan û gelek nema bû, ku hevûdû bikujin û polîsan navçîtiya wan kirin. Lê bi rastî ne dihiştin Kurd ereban ji gund derêxin. Navçîtiya wan holê bû, ta erdê Kurdan, di gundê Şebek de, ji dest wan çû.

Û holê jî, dixwestin erdê (Kevrê Dena) jî, weke gundê dî, ji dest Kurdan derkevê. Lê van xwîna xwe danîn ser mista destê xwe û hember zilamên (Diham El Hadî) rawestan. Lê mixabin Şemer xurtir bûn û hikûmet jî, li pişta wan bû (13) .

Yek ji gundiyan derket ser erdê xwe, rojhilatê gund, ji aliyê gundê (Girê Pirê, yê Newafê Paşa, biraziyê şêx Diham El Hadî, lê rûdinişt). Ereban dîtin yê Kurd çû ser erdê xwe. Çend çekdarên ereban çûnê, ne hiştin erdê xwe rakê, nav wan de xirecir germ bû. Ereban çend fişek berdan, gundiyan gotin zilamê wan hate kuştin. Zilam, pîrek û zarok, bi çek an destvala, berê xwe dan wan. Ereban berê tifingên xwe dan singên wan û li wan reşandin. Çar zilam kuştin (Ebdilayê Ibrahîm kurê muxtar, Remezanê Evdo, Eliyê Ibrahîm û Silêmanê Sarê) û sisê birîndarkirin di nav wan de pîrekek (Yûsifê Mihemed û Ebasê Hisên û Eyşa Hisên).

Çekdarên ereb çûn gundê Girê Pirê, cem Newafê Paşa, biraziyê şêxê ereban Diham el Hadî û xwe li mala wî de veşartin.

Desthilatan tiştek nekirin, tenê çend zilam girtin û piştî çend rojan ew berdan. Şêxê wan Diham ew vegerandin gûnd û xaniyên nû ji wan re avakir û erdê yên hatîn kuştin ji xwe re çandin. Û sêwiyên Kurdan, li ber deryan hiştin, weke tiştek bi serê wan ne hatî.

Holê xwediyên pilana serjimara qirêj û kembera erebî ya genî, di xwestin bi serê Kurdan bê û rê dan derebegên xwe wê bikin.

Desthilatên dijminên biratiya Kurd û ereb, ew parastin û xwîna Kurdan û erdê wan ber talan hiştin.

**2 – Bûyerên sala / 1963 /**

Di meha şibata 1963 an de, kongira xwendekarên zanîngehan û yên dibistanên orte li Helebê hate lidarxistin. Encûmeneke ji Mihemed Enwer Elî, Ezîzê Dawê, Reşîdê Simo û Usmet Umer hilbijartin. (14)

Berî vê demê, di meha Gulana 1962 an de, hevgirtina xwendekarên zanîngehan hatibû damezrandin, Mihemed Enwer û Dr. Xelîl Ebdê, rêvebirên wê bûn.

Ji aliyê bûyerên hundirê Partî ve, Hemîd, sala nû bi neraz-îbûna xwe ji rewşa hundirê Partî destpêkir û li mana digereha, ji bo êrîşî hevalan bikê. Diyarbû ku ew di helwesteke taybet de difikirî, nemaze piştî hevalên wî weke Xelîlê sor, Eliyê Şêxmûs, Mihdiyê Evdo û Xelîlê Silêman hatibûn rawestandin. Helwesta wî evahe, hate xuyakirin, dema xwest li mala xwe rûnê û dev ji xebatê berdê.

Çend meh ser vê helwestê ve neçûn, eşkere got: "yê çalekiyên xwe, yên Partîzanî rawestînê û nema bi hevalan re beşdarê çalekiyên siyasî dibê." Dema hevalan jê pirsîn, çima vê helwestê digrê, tiştekî giring ne got. Û hevalan jî, dev jê berdan, da xwe ji westa çend salan rehet bikê. Lê serdariyê ji xwe re got, ku hin tişt di dilê wî de hene û ev rawestandina he kir man, da yên di dilê xwe de pêkbînê. Ewî goman dikir ku dema li mala xwe rûnê, yê heval lava jê bikin, da vegerê xebatê û tiştê bixwazê, jêre pêkbînin (15). Lê serdariyê dev jê berda, da xwe li mala xwe rehet bikê.

Gelek ser rawestandina wî re neçû, ya di dilê xwe de eşkerekir û dest bi leptê kir. Di destpêkê de, çû Hisiça û Amûdê, bi hinceta dîtina hin hevalan, ewên zêde nîzîkî wî bûn, ji bo, bi wan re rewşa xebatê vekûlê û çawa dest bikar, dijî serdariyê bikê. Di vê demê de û ew li malê, çend rûpel ser rewşa Partî û armancên wê, weke raporek ji komîtiya navendî re nivîsand. Yên ew rapor dîtîn, weke Ebdilferîd, Mela Mihemedê Neyô û Eliyê Şêxmûs, dibêjin ku wî têde doza civateke (komeleke) çandî, ji dêlî partiyeke siyasî, ji

Institut kurde de Paris

kûrdên Sûryê re dikir. Û ev çivata he tenê doza armancên çandî, ji Kurdên Sûryê re dikir.

Ev daxwaza he weke ya Dr. Zaza bû. Û bi vê re jî, dixwest xebata Kurdên Sûryê, bi ya Partiyên Kurdistanê ve girêbidê. Yanî Kurdên Sûryê ji xwe re ne xebitin, lê tenê Kurdên başûr û bakur, di çûn û hatinên wan de, di Sûryê re, xwedî bikin.

Dema dît serdariyê guhneda rûniştina wî li malê, dest bikar, dijî wê kir û hewilda ji xwe re hevalan di hundirê Partiyê de bibînê û ji wan komgirêkek çêkê û di rûyê serdariyê de rawestê, belkî ji wê, bitimamî, an ji hinek endamên wê xilas bibê û ramanên xwe yên siyasî bikarbînê. Bi sedema bizava wî, serdariyê biryar bi rawestandineke dirêj, bê dem, ta konfirans an kongir lidarbêxin, di heqê wî de stand. Hember vê biryarê, bizava xwe pirtir kir, xwe gihand Qamişlo û bi hinekan re weke Hesenê Bişar û Derwêşê Mela Silêman û xeynî wan re rûdinişt û hewilda xwe bighînê koma Began û ya Dêrkê jî (16) .

Û holê ji hemûwan re hate xuyakirin ku levnekirinek di nav serdariyê de heye. Vêca hemûwan, dijber û hevalan dipirsîn, ka çi heye? Ji bo çiye? çi sedemin? Di gel vêjî serdariyê di belavôkên xwe de sedemên levnekirinê, di nav hevalan de belav nekir. Lê komîtiya devera Cizîrê (piştî komîtî dîsa bû yek) û hin komîtiyên şaxan, nemaze yên Qamişlo, sedemên levnekirinê dizanîn. Çinku ew nîzîkî komîtiya navendî bûn û ji wan re hate xuyakirin, ku levnekirin li ser hebûna kûrdan li Sûryê ye. Gelo çine? An bi awakî dî, gelo ji mafên Kurdên Sûryê ye di Partiyeke siyasî de bixebitin, an di civateke (komeleke) çandî de bixebitin? Ev pirsa he, me dikişînê pirseke dî, gelo em li Sûryê çine? Em miletekin, bingihên me yên zanyarî û yên dîrokî, ji kevnare de, di vê erdê de hene, an ne? An em kêm netewe ne, ji bakur, me bazdaye û em hatine li ser erdê biyaniyan (yê ereban), me konvedaye?

Bersiva van pirsan dihêlê em bêjin, mafê me di xebateke siyasî de heye, an ne. Evahe jî me dikşînê, em bipirsin gelo yê awayên xebata me, ji bo bidestxistina mafên miletê me, yê çawa bin? Di partiyeke siyasî de, an di civateke çandî de, bê?

Vêca, eger Kurd li sûryê, ne miletekî serbixwe bin, ne diruste, di partiyekê siyasî de, ji bo mafên siyasî bixebitin, tenê, hingê ji

mafê wane, xebateke çandî, ji bo belavkirina çanda miletê xwe, di civateke çandî de (ne siyasî) bixebitê.

Ev doza dawî, ya Hemîd bû. Û pêre, dixwest rola Partî, tenê alîkariya endamên partiyên Kurdistanê, dema çûn û hatina wan di Sûryê re hebê.

Gelek ji hevalan, nemaze yên dûr, rastiya levnekirnê ne dizanîn. Ez dikarim bêjim ta niha jî nizanin.(17).

Ji bo van nerînên Hemîd yên biyanî, hevalên komîtiyan, nerînên wî ne pijirandin û dijî wî rabûn.

Di vê rewşa Partî ya levketî de û êrîşa xurt a li ser serdariya partî heyî, gelek hevalan, ji bo rastiya van tiştên dihatan gotin bizanin, xwestin kongir bê lidarxistin û çareyek ji wan re bê dîtin.

Hevalên komîtiya navendî, ji bo vê daxwaza hevalan, ne yek bûn. Osman Sebrî li Bêrûtê bû, dezgehê parastina Sûryê lê digereha û yê Libnanê lê tengkiribûn. Hevalên Cizîrê Mihemedê Mela Ehmed û Xalidê Meşayix, cinku di nav germiya hevrikiyê de bûn, dixwestin zû kongir pêk bê, da çarek ji astengan re bibînê. Lê hevalên Helebê û Kurdaxê, nemaze Reşîdê Hemô, ne dixwestin, bi hinceta, nîrên ne xweş yên wê demê û şovîniya desthilatên Sûryê, ya dijî Kurdan gurbibû, nemaze piştî hêzên leşkerî yên Sûryê bi yên Iraqê re beşdarê şer, dijî şoreşa Kurdî li Kurdistana Iraqê de bûn.

Dijberên partî û hevalên bi wan ve girêdayî, dixwestin kongir pêkbê û welê jî koma li (Aliyan), ewa ji berpirsiyarên wan, Mela Mihemed Emîn, Mela Şerîf, Mela Hacî û Mela Ehmed pêkdihat, wan jî dixwest gongir pêkbê, piştî hilbijartineke (bê destdirêjî û têkiliya serdariyrê) Dijberên serdariya Partî, dû tişt di xwestin:

1 – Eşkerekirina sedemên levnekirinê. Çinku di nerîna dijberên serdariyê de, ku hevrikiya di nav Hemîd û yên din de, ji serdariyê, ji bo cih û pileyên bilind bû û ji bo perên partî yên dihatin dizîn bû. Mixabin, evên he nedikarîn, an berjewendiyên wan nedihiştin, hûr û kûr li vê hevrikiyê binêrin û sedemên rastî yên siyasî û ramanî bibîn. Ji bo daxwazên wan yên ne paqij, dixwestin kongir pêk bê, da her dû pişk hevûdû kirêt bi kin û dizyên hev eşkere bikin û li ser hev tiştên veşartî bêjin (18).

2 – Tiştê didwan yên dijberan dixwestin, ew bû, ku divê serdarî helwesta xwe ji levnekirinê, di nav bera Mela Mistefayê

Barzanî de, ji alîkî û Ibrahîm Ehmed û Celal Talebanî ji alîkî dîve zelal bikê.

Ewan, jivê, dixwestin, serdarî bi rengekî eşkere bidehfînin da alîkî bigrê û êrîşî aliyê dî bikê û hê levnekrina wan di destpêkê de bû û dan û standin di nav wan de çê dibû. Ji bo vê, li her cihî belav dikrin, ku serdariya Partî bi koma Ibrahîm Ehmed û Celal Talebanî re ye û dijî Mela Mistefayê Barzaniye. (Ev Barzaniyê ku her û her, cihê herî bilind, di dilê Kurdan de, çi Partîzanî, an ne, jêre heyî).

Eva he dikirin ji bo hevalên Partî û cemawerên milet, ji serdariya Partî aciz bibê û wan ji serdariyê bavêjin. Ji bo vê gelekî xebitîn.

### *Konfiransa didwan, çirya pêşîn 1963*

Holê komîtiya navendî neçar bû konfiransekê, ji dêlî kongirê, di meha çirya pêşîn de, ji sala 1963 an, li bajarê Qamişlo pêkbînê. Ev konfiransa he ya didwan bû, di jiyana partî de, piştî ya yekem, ewa di şibata 1962 an de pêkhatibû.

Ev konfirans, hate lidarxistin bê ku Osman Sebrî û Hemîdê Hacî Derweş amade yê wê bibin. Çinku Osman li Libnanê bû, ne dikarî amade bibê û Hemîd, bi sedema çalekiyên wî yên xirab, serdariyê ew vexwendiyê wê nekir. Hevalên konfiransê (weke tê bîra wan), çend bend, piştî xwendina rapora siyasî, vekolan:

1-Rewşa sazî di Partî de û çalekiyên Hemîd yên xirab. Biryar standin bi dirêj kirina rawestandina Hemîd û kişandina berpirsiyariya Partî ji wî. Û namek jê re rêkirin, eger dev ji çalekiyên xwe yên xirab bernedê, yê hin biryarên girantir der heqê wî de bistînin. Çinku konfiransê dît, Hemîd ramanê Dr.Zaza yên, aliyê rastê hildigrê û di berwan de didê. Ev ramanên he dijî berjewendiyên miletin.(19)

2-Rewşa şoreşa Kurdî li Iraqê û levnekirina di navbera Mela Mistefayê Barzanî û Ibrahîm Ehmed û hevalên wî de. Ji bo vê konfiransê ji komîtiya navendî xwest xwe bighînê wan, da sedemên levnekirinê bizanê û bixebitê ji bo wan levbînê.

3- Konfiransê biryar stand, bi amadekirina rêzaneke nû ji Partiyê re, ji dêlî ya kevin.

4- Biryar da, bipêkanîna kongireke giştî, piştî demekê, ne zêdî salekî, ji bo astengên Partî vekolê û biryar bi rêzana nû bidê.

5–konfiransê komîtiyeke navendî nû ji: Osman Sebrî, Reşîd ê Hemo, Kemalê Ebdê, Xalid Meşayix, Mihemedê Mela Ehmed, Ebdila yê Mela Elî û Ezîzê Dawê hilbijart û Mela Mihemedê Neyo û Mihemed Mistefa, weke şûngiran hilbijartin.

### 3– *Bûyerên sala / 1964 / an*

Em dikarin bûyerên sala 1964 an, di van bendan de bidin xuyakirin:

1- Zêdebûna levnekirnê bi Hemîd û dijberan re.

2- Girtina cara didwan, ji mekteba siyasiya serdariya Partî re.

3- Konfiransa sisyan, a di meha Tebaxa 1964 an de pêkhatî.

4- Xuyakirina komek ji hevalan, dijî Hemîd û dijberan, bûn bingih, ji çepên piştî demekê hatin qada xebatê.

1- Ji aliyê levnekirinê ve, ew fireh dibû û hemûwan lev vedigerand. Hemîd dixwest hevalên komikan dijî serdariyê rak ê. Û komgirêkên din jî, weke wî, şerê serdariyê dikirin û dixebitîn jibo hevalên xwe pir bikin.

Lebta van kesan bi wan re diçû serî.Çinku awayê karê serdariyê hember wan şaş bû. Serdariyê, sedemên serekî yên levnekirinê ji hevalan re, bi awakî zelal û eşkere, ne digot. Evahe alîkariya dijberan dikir. Hişt heval bimînin şaş. Lewre sedemên serekî yên levnekirinê, ji hevalan re man nexuyakirî. Bi rex vê jî, bûyera herî giring û balkêş, levnekirina serdariya Partî li Kurdistana Iraqê, hişt her tişt, ji bilî wê winda bibê. Hemûwan pê girtin û xwe pêve girêdan, da cihê xwe xurtir bi kin û bikarin şerê serdariyê bikin.

Bi rastî, ev serdariya he, ne bi awayê Mela Mistefayê Barzanî re bû. Çinku diramand, ku wî dixwest rola Partî û serdariya wê kêmbikê, ji bo rola burjiwaz û derebegan bide xuyakirin. Lewre helwesta xwe ne dida xuya kirin, bi omîda levhatina wan.

2- Hember pilan û davik û paşgotinya dijberan komgirêka Dêrkê, komgirêka burjiwazan, komgirêka Hemîd û ya Melayên Aliyan, (ên bêhtirê wan, li cem ramanên Dr. Zaza yên siyasî, yên di

zîndanê de digotin, digihanhev. Û her yek, bi awayê xwe bergiriya wan dikir. Lê hemûwan dixwestin serdariyê bavêjin û li cihê wê rûnin, weke Kin'anê Egîd û Mihemed Fexrî û geleke din jî digotin). Ji bo vî karê wan, komek ji hevbendên serdariyê li Qamişlo, weke Mela Mihemedê Nayo, endamê cihgir ji komîtiya navendî re û Selah Bedridîn û Nûrî Hacî endamên şaxa xwendekarên Qamişlo û Mihemedê Botî endamê şaxa Cerahê, dijî wan rawestan û bixurtî şerî wan kirin. Nemaze şerê Hemîdê Hacî Derweş kirin. Û piştevaniya serdariya Partî kirin. Çend caran bi endamên komîtiya navendî re, yên li Qamişlo, nemaze bi Mihemedê Mela Ehmed re runiştin û bi hevre li ser rewşa partî diştexilîn. Ev hevalbend, ji rewşa partî ya jevketî ditirsehan. Lewre pêşniyar di kirn ku hin helwestan dijî dijberan bigrin, ji bo rê li wan qutbikin. Lê hevalên serdariyê dilê wan xweş dikirin, ku yê hemû bihev re dijî wan rawestin. Û holê van jî, heval li dora xwe di dan hev û çavnêriya bûyeran dikirin û xwe ji paşrojê re pêktanîn.

3- Di meha Adara 1964 an de, li Helebê, komîtiya navendî bi hemû endamên xwe ve, (hingê Osman Sebrî, ji Bêrûtê vegereha bû, piştî nîzîkî sal û nîvê li wê dê ma bû) civîn kir. Dinav bendên karê wan de, rêzana Partî ya nû bû. Li ser bendên wê yên serekî levkirin. Mixabin çinku rêzan di destê tu kesî de nîne, em neçar dibin vegerin bîra hevalan û li ser wê, ji wan bipirsin, nemaze daxwazên miletê me li Sûryê:

1- Hevalên komîtiya navendî levkirin ku benda (rizgarkirina Kurdistanê û yekirina wê) ji rêzanê hilînin. Çinku ev durişm ne bi dem û armancên tevgera siyasiya Kurdî, ya niha re bû.

2- Kurd di Sûryê de, netwekî serbixweye, pişkek ji miletekî ye, ne kêm neteweye. Bi hêjmara kesên xwe, dibin netewa didwan li Sûryê.

3- Mafên Kurdan li Sûryê, siyasî, civakî û çandî ne, doza wan dikê.

4- Ji Partî tê xwestin, peywendiyên biratî û partîzanî bi partiyên Kurdistanî re peydabikê.

Komîtiya navendî, ji mekteba siyasî (Osman, Reşîd û Kemal Ebdê) xwest rêzaneke nû binivîsê, da komîtiya navendî wê vekûlê. Dûre di nav hevalan de bide xwendin û têbîniyên wan li ser

bibhîsê. Dûre pêşkêşî gongirê bikê, ewa di demeke nîzîk de gereke pêkbê, da biryara dawî li ser wê bê dan. Reşîd dibêjê: piştî wan Piroja rêzana siyasî amadekirin, kopîk jê, ji partiya Kurdistana Iraqê re û yek dî, ji mekteba xwendekarên Kurdan re li ewrûpe û ya sisyan, ji bo Usmet Şerîf Wanlî re rêkirin. Da nerîna xwe li ser wê bidin. Hemûwan bersiva xwe, bi erênî, li ser dan.

Di vê demê de û komîtiya navendî bi karê xwe mijûl, dezgehê parastinê, di / 21. 5. 1964 an de, ser endamên mekteba siyasî de girt û bi wan re endamê komîtiya navandî Ebdila yê Mela Elî û hinek endamên komîtiya devera Helebê û şaxên wê, weke Midewer û Reşîd Simo û Hoşeng kurê Osman Sebrî û wan dikê zindanê de. Û dixwazê endamên din, yên komîtiy a navendî (Mihemedê Mela Ehmed, Xalid Meşayix û Ezîzê Dawê) bigrê, lê van (Mihemedê Mela Ehmed û Ezîzê Dawê) zû bazdan û Xalid, ji berî vê demê, xwevedişart. Û holê hemû endamên komîtiya navendî, girtî bûn an bazda yî bûn, weke cara berê, sala 1960 î. Lê rewşa Partî vî carê, ne weke ya berê bû.

Cara berê, dema girtin çêbû, di 12.8.1960 î de, Partî yek bû, tu komgirêk di nav de nebû. Tu dijber di hundir, an derveyê wê ne bûn (bê kû em dijberiya burjiwazan bêjin, çinku di wê demê de, ne xurt bû).

Lê ya niha, di 21.5.1964 an de, Partî di rewşeke gelekî xirab de bû, bi agirê hevrikiyê dişewitî. Dijber zêde dibûn û xurt dibûn. Weke komgirêka dijberên Dêrkê (Kin'anê Egîd û hevalên wî) û komgireka Mela yên aliyan (Mela Şerîf û hevalên wî) û komgirêka burjiwaza Kurd û bi wan re hevalên şaxa Cerahê û komgirêka Hemîd jî.

Vêca hevila herdû girtinan ne weke hev bûn. Di girtina pêşîn de, Hemîd û Şêx û bi wan re hemû heval dixebatê de bûn û cemawerê milet bi wan re bû, xwe li dora wan dabû hev û ew diparastin.

Lê di cara didwan de, Hemîd bi xwe dijberiya serdariyê dikir û hewildida bi dijberên din re bighin hev, ewên berê dijîtiya wî dikirin. Evahe dikir ji bo ramanên Dr. Zaza belav bikê û awayên xebatê, yên neserast, bi cih bînê.

Institut kurde de Paris

Di vê demê de, partî ne serhevde bû, beş beş bû, tû çare li ber çavan nebû, an hebûna wê gelekî zehmet bû. Û cemawerê milet, ewê Partî di parast û piştevaniya wî dikir, bi sedema komgirêkên gelek û astengên wan yên pir, jê dilteng bi bû, aciz bibû. Û serde, tolên gelek, yên serdariya Partî der heqê hevalên xwe de girtî, hiştin ew rewşa partî ya geş, di çavên wan de, hember bargomanên hemûwan yên li serhev digotin biçilmisê, ew ronahiya Partî vemirê.

Me got mekteba siyasî ya Partî di 21.5.1964 an de, hate girtin û bi wan re, hin pelik û dîkoment jî, weke:

1- Piroja rêzana nû ya Partî û rêzana kevin jî. Weke Reşîd û Ebdila yê Mela Elî dibêjin. Dezgehê parastinê, rêzana kevin danî berçavên wan, ku rêzana waye. Lê wan, li wê dan mandelayê û xwe lê nekirin xwedî û bi ya nû girtin, ku ew rêzana waye. Eva he hişte zordariya wan, li ser girtiyan, kêm bibê.

2- Lê dîkomenteke dî hebû, hişt desthilat gelekî bixeyidin, ew jî, namek mekteba siyasî ji serok Cemal Ebdil Nasir re rê kir bû, têde jê dixwset ku navçîtî, di nav Kurd û erebên Iraqê de bikê û bihêlê rijindina xwîna wan rawestê û desthilatên Iraqê helwesteke dîmûqrat û dadmend ji Kurdan û pirsa wan bigrê. Ev nama he hişte xeyda wan zêde bibê û kîna di dilê wan de bifûrê û li wan zêde bişdînin û wan bi êşînin.

Ev girtî, zêdî / 7 / heft mehan, di zîndanê de man û di destpêka sala nû de, 1965 an de ew berdan. Bê ku levnekirin di nav wan de çêbê.

### *A- Konfiransa sisyan di Tebaxa 1964 an de*

Me berê gotibû, ku biryar bi darxistina kongirê hebû û komîtiya navendî xwe jê re amade dikir.

Bi rex rewşa xirab a hebû, piştî girtina hevalên mekteba siyasî, rewş hê nexweştir bû, çinku dijberan êrîşa xwe zêdetir kirin û bargomanên nexweş û bê bext, bi hevalên serdariyê ve kirin, ta giha radekî şaxên rojhilatên Qamişlo, weke Dêrik, Koçer, Til Cemal û Aliyan, dan û standin bi serdariyêre qutkirin û nema bi tu endamên komîtiya devêrê re, an yên navendî re rûdiniştin, ta xwesteka wan (kongir) a giştî, bê lidarxistin.

Holê komîtiya deverê, ya hevbendên Hemîd, Eliyê Şêxmûs, Hesenê Bişar, Mela Beşîr û Ebdilqadir endamên wê bûn, ne dikarî karekî bihavil bikê. Çinku van kesan, ji bo çaran ji astengên heyîn re bibînin, rê nedidan hevalên din, wê bikin û alîkariya wan jî nedikirin, da rewşa Partî hemû levbikevê. Lewre civîn bi awayê hevaltî nediçû serî, destpêdikir, bi qîjevîj û dawî dibû bi xeyd, bê ku bighin tu çaran ji astengan re (20). Û gotinên nexweş ji hev re digotin, hevdû bi tiştên xirab bargoman dikirin.

Bi vî awayî, rewşa hundirê Partî roj bi roj xirabtir dibû, tu çare, bikarê vê rewşê, çi ji bo demeke dirêj, an kurt, serast bikê, liber çavan nebû. Û girtina tolan di heqê hinekan de, tu sûd jê nedihat wergirtin. çinku asteng nedihatan dawîkirin.

Di vê rewşa xirab û bê hêvî de, hinek heval, weke Mihemed Mistefa endamê cihgir, di komîtiya navedî de, biryar ji xwere stand ku ji partî, yek carê, dûr bikevê. Û Mela Mihemedê Neyo jî, endamê cihgir di komîtiya navendî de, ji bo debara zarokên xwe, xwest ji bo demekê, xwe ji xebatê dûr bikê û karekî bikê. Û bi wan re jî, Ebdilsemedê Mela Xelîl, endamê komîtiya deverê, wî jî, xwe ji xebatê dûrkir. Biryara van hevalan, di demekê de hat, ku êrîşa hevrikan di xurtiya wê de bû. Eliyê Şêxmûs û Mela Beşîr, hevalên komikan gurdikirin û ew didehfandin ji bo kongir bixwazin. Vêca hevalên komîtya navendî, neçar bûn, bi hevalên komitiya deverê re bigihin biryarekê ku konfiransê, ji dêlî kongirê, di demeke kurt de lidarxin.

Konfiransa sisyan di destpêka meha Tebaxa 1964 an de, li gundê (Cim'ayê) rex Qamişlo, hate lidarxistin. Hevalên komîtiya navendî û yên cihgir û endamên komîtiyên deveran û yên şaxan û kadroyên Partî amadeyê wê bûn. Civînên şer berdewambûn û bargomanên qirêj, di navbera hevalbendên Hemîd, Eliyê Şêxmûs û Mela Beşîr, ji alîkî û hevalên komîtiya navendî û yên deverê, ji alîkî dîve, dihat gotin. Hevalên Hemîd dixwestin Hemîd vegerê Partiyê.

Hevalên komîtiya navendî û hevalên dî dîtin, bivegera Hemîd, xwe ji hinek astengan xilasdikin û belkî rewşa Partî, di wê dema teng de xweştir bibê. Lewre biryar standin bi hilanîna rawestandinê li ser Hemîd û vegera wî, weke endamekî di komîtiya navendî de.

Lê berê wê, yê raporek binivîsê xwe têde rexne bikê. Lê wî ew rewşa levketî dît, rapora xwe neda û vegereha komîtiya navendî.

Di konfiransê de, ji komîtiya navendî hate xwestin ku bixebitê da Mela Mistefa yê Barzanî û yên mekteba siyasî nîzîkî hev bikê û piştevaniya cidabûnê di nav wan de nekê. Û nameyekê bi van tiştan rêkê ji wan re.

Dûre endamên komîtiya navendî, yên di zîndanêde Osman û Reşîd, Ebdila yê Mela Elî, kemal Ebdê û bi wan re jî, Mihemedê Mela Ehmed û Xalid Meşayix, Ezîzê Dawê, Mihemed Enwer û Eliyê Şêxmûs, ji bo komîtiya navendî ya nû, hatin hilbijartin (21). Û Hemîd jî vegereha komîtiya navendî, gora biryara konfiransê.

Hember vê rewşa nû û nebawerya dinav hevalan de belavbûyî û bargomanên hatîn gotin û hember ramanên bingihî yên zelal ne bûyîn. Û hate xuyakirin ku ramanên Dr. Zaza, yên Hemîd niha bi wan bangdikê serketin. Ji bo van tiştan û bi hinceta xwendina xwe li ewrûpe temam bikê, di dawiya sala 1964 an de endamê komîtiya navendî Mihemedê Mela Ehmed biryar girt, xwe ji Partî vekişînê û dev ji xebata Partîzanîyê berdê. Û bi wî re jî, endamê dî, Ezîzê Dawê, xwe kişand, ewjî bi hinceta xwendina xwe ya bilind berdewam bikê.

Hevalên komîtiya navendî yên din (Xalid, Hemîd, Eliyê Şêxmûs û Mihemed Enwer) biryar dan ku Xalid û Hemîd di dawiya 1964 an herin Iraqê, ji bo hevalên Partî li Iraqê, bi rewşa xwe bidin zanîn û ya wan jî nasbikin. Di wê demê de dihate gotin ku hinek di nav wan de diçin û tên, ji bo wan levbînin. Dema çûn, Hemîd, Hesenê Bişar, bê gotina hevalên xwe, bi xwere bir.

### 3- *Peywendiyên Partiya Dîmûkrata Kurdistana Sûryê, bi Partiya Dîmûkrata Kurdistanî re, li Iraqê*

Havila helwestên dîktatorî û siyasîyên şaş, ên Ebdilkerîm Qasim dijî pêşverûyan, li Iraqê digirtin, nemaze dijî Kurdan, serdariya Partî, ji bilî hilgirtina çek dijî wî, rê nedît. Lewre di 11.9.1961 ê de şer destpêkir.

Di levketina pêşî de, pêşmerge jevketin û di dest wan de têkçû, lewre Mela Mistefa yê Barzanî ew dan hev û serdariya şoreşê kir di

destê xwe de û desthiltdariya şoreşê, di dirjahiya 14 çardeh salan, li ser behreke ji Kurdistana Iraqê veda.

Ji destpêkê de, levnekirinek di nav bera Mela Mistefa û hinek ji endamên komîtiya navendî, (endamên mekteba siyasî) û sekretêrê wê Ibrahîm Ehmed de hebû.

Çawa şoreş destpêkir, serdariya Partî li Sûryê, xwe û her tiştên jê dihat, kir di bin xizmeta şoreşê de. Hewilda ku peywendiyên wê, her û her, bi serdariya şoreşê re hebê. Lê evahe di destpêka şoreşê de qutkirî bûn, ji bilî nûçeyên, bi rêyeke ne sazkirî. Hin kesên ber sînor, bi xwe re tanîn, bi sedema rewşa şoreşê, ya wê demê. Ev awayê he, ma ta Ehmed Tewfîq (Ebdula Îshaqî) di buhara 1962 an de hate Sûryê, weke nûnerê Mela Mistefa, ji bo piropegende ji şoreşêre bik ê û xwe bighînê hinekan.

Çawa giha Cizîrê belavokek derxist bin navê (dîsan Barzanî). Tê de nûçeyên şoreşê û serdarê wê Mela Mistefa û serketina wî di şeran de belav kir. Û têde piropegendek dijî serdariya Partî belav kir û da xuyakirin ku tu rola wê ne mayê (22). Gotinên wî (dawîkirina rola Partî di şoreşê de û têkçûna serdariya partî) weke derbên xenceran bûn, ji serdariya Partî re û ji hemû hevalên Partîzanên Sûryê re bû. Çinku Partîzanên Sûryê, hê nû, ji hevrikiya nav xwe de, jibo Partîzaniyê, xilasbibûn, li ser wan gelekî giran hat bû û ew gelekî êşandin, lê di dawî de ew ser ketin. Lewre gotinên Ehmed Tewfîq, li ser wan giran bûn. Çinku wî derb li bingihê partîzaniyê dida. Ewî cidabûnek dikir nav Mela Mistefa û Partî de.

Serdariya Partî li Sûryê bi vê cidabûnê nerazîbû. Di nerîna wê de, Mela Mistefa û Partî yekin, divê tu cida bûn di nav wan de nebê. Çinku serdariyek holê sazkirî û têgihiştî û hayê wê baş ji mafên milet heyî, hêviya milet bû. Partiya me li Sûryê, ev rengê serdariyê, ji dêlî serdariya kevin, ya hişte şoreşên miletê me têkbiçên, di xwest. Vêca ev şoreşa he jî, têkbiçê, çiqas xirabe. Yanî hêviya milet, di tu rengê serdariyan de nema dimînê. Lewre yek ji hevalan rêkir şoreşê, ji bo rewşa şoreşê nasbikê. Gelek necû, namek rêkir, hişt goman li ser gotinên Ehmed Tewfîq çêbin.

Evahe, destpêka levnekirnê bi Ehmed Tewfîq re bû, nemaze bi Hemîd re, dema, di meha gulana 1962 an de, pêre çû Libnanê ji bo

piropegendê ji şoreşêre bikin. Lê ev levnekirina he tû karteker li ser helwesta serdariya Partî li Sûryê, ji bo alîkariya şoreşê nehişt.

Serdariya Partî, ji bo alîkariya şoreşê, komîtiyên Partîzanî, ji hevalên Partî damezrandin, pere û tişt didanhev û ji şoreşê re rêdikirin. Bi vêre jî komîtiyên gelêrî ji endamên Partî û cemawerê milet amadekirin, alîkariya xelkê dan hev û ji şoreşê re rêkirin.

Hin kesên serbixwe, an yên dijberên Partîyê, alîkarî ji bo şoreşê didan hev û ji wan re rêdikirin. Û xwe dighandan hinekan serberedayî, ne endamên Partî li Iraqê, weke Hemîd li Tawûs û Mela Hemdî û Hacî Qado û xeynê wan jî, nûçeyên şorşê tanîn Sûryê û li nav xelkê belavdikirin. Dihiştin gelek piroblêm ji Partî re li Sûryê çêbin.

Nûçeyên şoreşê û şerên wê, ji serdariya Partî, an ji serdriya leqê wan, an ji yê leşkerî dihat Sûryê, lê ev jî ne her demî pey hev dihatin, nav wande demek bê nûçe hebû, di vê demê de, ev kesên serberedayî nûçe tanîn û didan van dijberên Partî, wan jî, gora keyfa xwe belavdikirin. û pêre êrîşî Partî dikirin.

Ji bo ev rê ya he, li ber dijberên partiya Sûryê bêgirtin û herwiha jî, li ber hinekan li Iraqê, ewên dixwestin tengî li Partiya Sûryê bikin, weke çawa li ya Iraqê dikirin, demeke dirêj xwest, ta bi Partî re, li Iraqê hate sazkirin.

Dema levnekirina Mela Mistefa bi Ibrahîm Ehmed û Celal re hate belavkirin, ev kesên serberedayî û yên ji Partî aciz, (çinku saziyeke gelêrî û pêşverû bû, dijî serbredayetiya eşîrtî û dijî revokan bû) van fersend dîtin. Nûçe tanîn ji bo dijberan, van jî belavdikirin, da bêjin ku serdariya Partî meyldarê Ibrahîm Ehmed û hevalên wî ne û dijî Mela Mistefa ne. Lê gelek caran serdariya Partî dihişt gotina wan, di gerya wan de bimînê û rê li piropegendên wan digirt.

Bi rastî, serdariya Partiya me, keyfa wê ne dihat û ditirseha ser paşeroja şoreşê, dema Mela Mistefa serokên eşîran, ewên ji Partî aciz, dida pêşiya hevalên serdariya Partî, yên xwedî serpêhatî û bawerî.

Lê ji alîkî dîve, serdariya Partî li cem me, di Mela Mistefa de, serdarê jêhatî ûqehreman û di pêşmergên wî yên leheng de, hêza xurt didît û hêviya serketina şoreşê, bi wan didît. Ji bo van tiştan,

Partî di wê hêviyê de bû, ku partî li Iraqê divê, weke saziyeke gelêrî û Mela Mistefa serokê wê, bê tu levnekirin, bi hev re bimînin û şoreş berdewam bikê, ta bighin mafên miletê Kurd li Iraqê.

Ji bo vê jî, keyfa serdariya me nedihat, dema serberedayên Kurdên Iraqê, dihiştin, hin tişt bikevin destên dijberên Partiya me, ya ji bo mafên milet, yên siyasî û çandî û civakî di xebitî û xirabiyê di heqê wê de bikin û wê ji qada xebatê dûrbikin.

Karê van dijberên dixwestin bidin xuyakirin ku serdariya Partî meyldarê alîkî ye (23), gelek asteng ji serdariyêre çêkirin. Lê serdariyê, levnekirina wêdê (li başûr) ne dixwest. Dixwest herdû alî bi hevre şoreşê bidomînin, ta mafên miletê xwe bidestê xwe xin. Serdarî ne dijî Mela Mistefa bû, lê dixwest cihekî bilind di şoreşê de, bidê serdariya Partî û ramanên wê, yên pêşverû. Mela Mistefa û Partî bi hevene, jev nayên qutkirin, hevdû timamdikin. Lê dijberên Partî di xwestin wan jev cida bikin. Dixwestin Mela Mistefa hebê, lê partî ne bê, ji bo rola hinek navdarên di şoreşê de, pêşde çûyîn, firehtir bibê.

Institut kurde de Paris

# *Navbira çaran*

*Parçebûna Partî*

Institut Kurde de Paris

Me got, hember, komgirêkên aliyê rast, ên peydabûyîn, û pîlanên hin endamên komîtiya deverê, weke Eliyê Şêxmûs û Mela Beşîr ên dijî serdariya partî dikirin, ji bo hevalan ji serdariyê dûrbikin, da wan bavêjin, hember vê êrîşê û karê wan û ji bo piştevaniya serdariyê, hinek endamên komikên xwar de û yên şaxan û yên deverê, xwe dan hev û komgirêkek damezrandin. Nemaze piştî hin endamên roleke xurt a wan di komîtiya navendî û ya deverê de hebû, dest ji xebatê kişandin, weke Mihemedê mela Ehmed û Ezîzê Dawê û Mihemed Mistefa û Ebdilsemedê Mela Xelîl.

Endamên berçav di komgirêka nû de, Mela Mihemedê Neyo cihgirê endamê komîtiya navendî û Selah Bedridîn û Nûrî Hacî endamên şaxa xwendekarên Qamişlo û Mihemêdê Botî endamê şaxa Cerahê û hinek dî bûn. Ji destpêka sala 1964 an ve, van, nemaze Mela Mihemedê Neyo, çend caran bi endamên komîtiya navendî li Cizîrê, Mihemedê Mela Ehmede û Xalid Meşayix re, nemaze Mihemed re civîn û bi hevre rewş li ser karên, gereke bên kirin, vedikolan. Hin pêşniyarên wan digihan radekî, ku di nav xwe û dijberan de qutbikin, nemaze dema hate xuyakirin, ku aliyê rastê, yê dest deynê ser partî, (Piştî girtin û bazdana hevalan, ya cara didwan) nemaze berî konfiransa Cim'ayê, ya 1964 an de. Lê hevalên serdariyê, li ser vê helwestê, ew gur ne dikirin û ji wan dixwestin xwe ragrin ta rewş bêhtir bête xuyakirin. Lê dema konfiransa / 3 / sisyan biryar da, bi vegera Hemîdê Hacî Derwêş li komîtiya navendî û pêre jî Eliyê Şêxmûs bû endamê komîtiyê û xwe vekişandina Mihemedê Mela Ehmed û Ezîzê Dawê, endamên komîtiya navendî ji Partî (24), tû kes, ji bilî Xalid Meşayix li Cizîrê û Mihemed Enwer li Helebê, di komîtiya navendî de nema, bi wan re Hemîdê Hacî Derwêş û Eliyê Şêxmûs, yên bihevre nelev.

### *1-Bûyerên sala 1965 an*

Hember vê rewşa nû, vê komgirêka nû, xwe da pêş û di rûyê pêla aliyê rast de, ya dixwast serdariyê bigrê xwe (an serdarî kete destê wê de) rawesta û dest bi gerekî fireh kir û piştî çend mehan konfiransa / 5 / Tebaxa 1965 an lidarxist.



Institut Kurde de Paris

Lê serdariya Partî, berî vê konfiransê û piştî devjêberdana Mihemêdê Mela Ehmed û Ezîzê Dawê, biyar dabû ku Xalid û Hemîd di dawiya sala 1964 an de herin Kurdistana Iraqê, da rewşa wan nasbikin û ya xwe ji wan re bêjin (25). Dema Xalid û Hemîd ji Kurdistana Iraqê vegerehan, levnekirin di nav wan de firehtir bibû. Di vê demê de, dezgehê parastinê Eliyê Şêxmûs di meha kanûna yekê de, sala 1964 an, girtibû Dû meh li cem xwe hiştin, dûre berdan (gora gotina wî). Hingê wî jî, dest ji xebatê kişand û li mala xwe rûnişt.

Hevalên Partî ji vê rewşê tengezar bibûn, dilteng bibûn, tû gav ji bo xweşkirna vê rweşa jevketî ne didîtin. Êrîşa dijberan zêde dibû û vegera Hemîd, tû feyde neda, rewş xirabtir bû. Çinku hevalên serdariyê, dengê xwe bi acizî, ji vegera Hemîd bilidkirin, nemaze wî rapora xwe, ya konfiransê pê gotî, ji bo xwe têde rexnebikê, neda. Vêca komgirêka Neyo û Selah, dest bi gera xwe di nav hevalên komikan de kir, nemaze di nav wan kesên ji Partî hatîn dûrkirin, weke Mela Dawid, Mela Hadî, Mihemed Elî Heso û xeynî wan jî û ewên dijî Hemîd, weke komgirêka Mela yên Aliyan, ji bo wan di aliyê xwe de bikşînin. Bi vêre jî, xwe ji bo civînek fireh amade dikirin.

Di vê demê de, ji destpêka sala 1965 an û piştî Hemîd û Xalid ji Iraqê vegerehan,(26), çalekiyên Hemîd sistbûn û gera wî kêmbû, ta dawiya sala 1965 an, (weke Xalid û Tahir Sifûg dibêjin) nemaze piştî ew hate girtin û dû meh di zîndanê de ma, (bisedema biryareke kevin, ya dadegehê der heqê wî de bû). Xalid tenê li meydanê mabû. Wî û hevalên komîtiya deverê, ne karîn tû çaran ji astengan re bibînin, nemaze komgirêkeke dî, li yên berê zêde bû.

### *A- Helwesta dijberan*

1- Helwesta komgirêka Dêrkê:

Calekiyên vê komgirêkê tu giraniyên mezin li ser Partî çênekirin, çinku derveyê rêxistina Partî bû. Wê hewildida xwe bighînê hevalên komikan an endamên şaxan, an xeynî wan jî, ji bo wan li ser serdariyê gurbikê. Wan xwe sazkirin û ji xwe re belavokek derdixistin û li nav hevalên xwe de belavdikirin. Hemîd



Institut kurde de Paris

hewilda wan bi aliyê xwe ve bikişînê, lê pê bawer ne bûn (gora gotina Kin'an).

2- Helwesta komgirêka Melan:

Li cem vê komgirêkê û hevalên wê, li şaxa Koçeran û Aliyan û li Til Cemalê, tu ramanê siyasiyên cida nebûn (weke çawa li cem yên Dêrkê an xeynî wan ji hevalbendên Dr. heyî). Ev komgirêka he, bi pêla dijberiyê re bû û ji bo hin tiştên xwesayetî û hin şaşiyên sazî, di heqê hinek ji wan de hatibû kirin, hiştin ev komgirêka he bête avakirin. Ev dijberên he dû tişt xwestin (xwestina tiştan li cem dijberan bi bû mode, weke çavlêkirin):

A- Eşkerekirina helwesta Partî ji levnekirina heyî di şoreşa Kurdistana Iraqê de û dixwestin piştevaniya Mela Mistefa yê Barzanî bê kirin.

B- Pêkanîna hilbijartinek (bê dest dirêjiya serdariyê), ji bo hilbijartina komîtiyeke navendî nû. Kin'anê Egîd xwe gihand wan û xwest yekîtiyekê bi wan re bikê, lê pê bawer ne bûn. Ji navdarên vê komgirêkê Mela Mihemed Emîn, Mihemed Xelîl û Xerbî bûn.

3- Komgirêka burjiwaza Kurdî:

Di wê demê de, hevalên vê komgirêkê gelekî kêm bibûn, wan bi helwesta xwe ya dijberî û ramanên xwe yên siyasî girtibûn, bê ku tû karteker li ser pêveçûya partî hebê. Mirov dikarê bêjê ku heval bendên wan, di nav dijberan de winda bibûn.

4- Komgirêka Hemîd:

Heval bendên wê, piştî hatina Hemîd devê xwe girtin. Lê Hemîd di vê demê de xwest, yên berê hevalbendên wî bûn û hin biryarên Partîzanî di heqê wan de hatibû girtin, wan vegerînê Partiyê (weke Neyo û Sebriyê Şêxmûs dibêjin). Ev karê Hemîd hişte komgirêka (Neyo Selah) bi xurtî çalekiyan bikê û helwesteke ji serdariya mayî bigrin. Çinku dîtin, Hemîd di xwazê roleke giring di siyaseta paşerojê de bileyizê.

5- Komgirêka Neyo û Selah:

Evên he dûre hatin naskirin bi Navê (Partiya Çep). Di destpêkê de hindik bûn (weke Xalid û Mela Mihemed Emîn û Tahir Sifûg dibêjin), lê jimara wan bi çalekiyên wan re zêde bûn û xwe gihandin heval û dijberan, weke komgirêka Melan, ji bo bi hevre dijî serdariyê, ewa Hemîd di nav de, bixebitin.

### *B–Konfiransa Çepan, 5 Tebaxa 1965 an*

Ji bo ev komgirêka he serdestê wext bê û bûyer jê nebûrin, biryar bi darxistina Konfiransê da. Lewre di / 5/ 8 / 1965 an de konfiransa xwe di gundê Cim'ayê de girêda, (ev konfiransa didwaye, di wî gundî de, tê lidarxistin).

Di wê konfiransê de, hinek hevalên partî û hinek, derheqê wan de, berê, biryar hatibû standin, weke: Mela Dawid û Mela Hadî û Mihemed Elî Heso û bi wan re hinek hevalên komgirêka Melan jî, amade yê wê bûn.

Ev konfiransa he kelpîça yekemîn di damezrandina partiya Çep de bû. Ya ji vê kêlîkê, bi rengê xwe yê sazî, çalekiyên xwe hember yên (aliyê rast) destpêkir. Û duruşmên serdariya Partî bilindkir û êrîşî ramanên Dr. û hevalbendên wî kir. Ew ramanên, ji dema zîndana sala 1960 î ve, bûn sedemên hevrikiya mezin di Partî de, yên di van xalan de tên berhevdan:

1- Kurd li Sûryê miletekî serbixweye, ne kêm neteweye.

2- Partî li Sûryê rêxistineke siyasiye, ne civateke çandiye.

Yanî kûrd li Sûryê mileteke kevne, rayên wî di zemin û dîroka wê de kûre. Ew ne kêm neteweye, ne biyaniyê vî welatiye, ew li ser erdê bav bapîrên xwe ye. Û di hêjmara xwe de netewa didwaye û mafên wî yên netewî, weke yên Erebane. Û Partî, partiyeke siyasiye û rêxistinek ji bo cemawerê Kurd di komikên xwe de bidê hev û dixebatê, ji bo mafên siyasî û civakî û çandî bi destê milet Kurd bêxe.

Ev çepên he di konfiransa xwe de, gihan hin biryaran. Neyo û Hilal, wan di van xalan de dijmêrin:

1- Rawestandina (tecmîd) serdariya Partî ya kevin.

2- Pêkanîna kongirek, piştî salekê.

Institut kurde de Paris

3- Damezrandina serdariyekê, ji bo demekê, ji Mela Mihemed Neyo, Selah Bedridîn û Hilal Xelef.

4- Damezrandina komîtiyekê, ji bo amadekirina kongira bê, ji hevalên serdariya demekê û bi wan re Mihemed Qado, Nûrî Hacî û Yûsif Sima'îl jî.

5- Amadekirina rêzaneke siyasî nû û yek dî, ji bo hundirê rêxistinê, da wan pêşkêşî kongirê bikin.

Dema Xalid Meşayix bi vê konfiransê heseha (27) xwe gihand wan û piştî dan û standineke dûvdirêj, gihan rêkeftinekê, ji van bendan:

1- Biryarên konfiransê, neyên belavkirin.

2- Hilbijartin ji bo kongir, di mehekê de destpêbikê û kongir di dawiya wê hilbijartinê de, bê lidarxistin.

3- Damezrandina komîtiyek, ji herdû aliyan, ji bo hilbijartin bibê serî. Ji (Tahir Sifûg û Ebdilletîf Elî Ebdê, (ji hevalên serdariya partî) û Nûrî Hacî û Yûsif Sima'îl (ji hevalên Neyo û Selah).

4- Serdariya Partî tu biryarên xirab derheqê hevalên Çep de nagirê.

Û holê çepan, gora vê rêkeftinê, biryarên konfiransa xwe belav nekirin, lê ne bawer bûn kû Xalid û hevalên wî, yê bendên rêkeftinê bibin serî. Hevalên çepan Neyo, Hilal û Nûrî Hacî digotin: ji bo aliyê dî rêkeftinê nebê serî û kongirê lidarnexin, yê pîlanan çêkin û astengan di rê de derêxin. Û didomînin ku ew bixwe, bi wê rêkeftinê razî bûn, da aliyê dî, pêk ne anîna kongirê, nekin stuhê wan de.

Piştî vê rêkeftinê bi çend rojan, Xalid çû Kurdistana Iraqê. Xalid sedemên çûnê, bi vî awayî dibêjê: Di wê demê de, Partiya Iraqê namek ji serdariyê re rêkir. Xwest amadebûna wan, di kongirêya wan de, ya piştî çendekî bin serokatiya Mela Mistefa de, yê lidarxistin. Xalid sê mehan li wê dê ma. Di dawiya 1965 an de vegereha û endamê komîtiya navendî ya Partiya dîmûkrata Kurdistana Iraqê Ni'man Isa bi wîre hat Ji bo li kongirê, weke nûnerê Partiya Iraqê amadebibê. Xalid didomînê û li ser karê xwe li Iraqê dibêjê: Piştî giha wê dê û endamên mekteba siyasî dîtin, rewşa Partî û ya welêt ji wan re got. Hebîb Mihemed Kerîm, sekretêrê Partiyê, jê xwest raporek binivîsê. Mekteba siyasî ew

rapor ji Mela Mistefa re rêkir. Ew û Hebîb Mihemed Kerîm çûn jem Mela Mistefa û li ser rewşê axaftin kirin. Xalid ji wan xwest nûnerekî xwe rêkin, ji bo amadeyê kongira wan bibê. Mela Mistefa navê Mela Hemdî got. Xalid ji wî navî veciniqî û ji Mela Mistefa re da xuyakirin ku evê he ne endameke Partîzaniye û li Sûryê jê ne xweşin, yê çawa, wî bi xwe re bibê kongirê? Mela Mistefa lê vegerand, ku divê wî bi xwe re bibê, weke nûnerê wî, (û ne xeme eger partîzanî bê, an ne). Xalid ji fihêtiya li Mela Mistefa venegerand û deng ne kir. Lê dema ew û Hebîb ji cem Mela Mistefa vegerehan, ji Hebîb hêvî kir, ku Mela Mistefa razîbikê, endamekî dî, xeynî vî zilamî rêkê. Çinku ew (yanî Xalid) yê Mela Hemdî bi xwere ne bê û eger vala, bê nûnerê Partiya wan jî vegerê. Dema Hebîb ji hevdîtineke dî, bi Mela Mistefa re vegereha, navê Ni'man Isa, endamê komîtiya navendî û berpirsiyarê liqê yekê got, weke nûnerê wan, ji kongira Partiya Sûryê re. Xalid pê razî bû û dema vegereha bi xwe re anî Sûryê. Xalid û hevalên xwe konfiransa / 4 / çaran, li gundê Berko, di dawiya sala 1965 an de girêdan, bê ku Çepan bixwazin wê konfiransê (28) .

Gelo rewşa partî û çepan, di vê dema ku Xalid li Iraqê bû, çawa bû? Çep, Nûrî Hacî, Mihemedê botî û Ezîzê Omerî û xeynî wan jî dibêjin: ku piştî damezrandina komîtiyek ji çar kesan, (Tahir Sifûg, Ebdil letîf Elî Ebdê, Yûsif Simail û Nûrî Hacî) ji bo çavnêriya hilbijartina nûnerên kongirê bikê, asteng hatin xuyakirin, nehiştin hilbijartin herê serî. Nûrî Hacî dibêjê: ku aliyê dî (Tahir û Ebdilletîf) nexwestin hilbijartin, weke me levkirî, here serî, lewre asteng derxistin. Wan (Tahir û hevalê xwe) gotin ku berê niha, di kofiransa sisyan de, Tebaxa 1964 an, hilbijartin çêbû û endamên wê xuyane, tu pêwîstî, ji bo hilbijartineke nû nîne. Tahir Sifûg jî, weke Nûrî li ser vê babetê, dibêjê. Nûrî didomînê, ku wî û hevalê wî Yûsif Sima'îl xwestin hilbijartin dinav şaxên: Alyan, Til Cemal û koçeran, (ewên piştevaniya Melan dikirin) çêkin. Lê Tahir û Ebdilletîf razînebûn. Lê di dawî de gotin, emê hinekan ji wan hersê şaxan bibin kongirê. Lê van herdûwan (Nûrî û Yûsif) bi vê razînebûn û xwestin hilbijartin di her sê şaxan de cêbê.

Holê mirov dikarê bighê helwesta her alîkî. Tahir û Ebdilletîf ne dixwestin hilbijartin di wan her sê şaxan de çêkin, da hevalên

Institut kurde de Paris

Çepan di kongirê de zêde nebin. Çinku yên berê hatîn hilbijartin (di konfiransa sisyan de), bêhtirê wan hevalên serdariyê bûn. Lê Nûrî û yûsif, dizanîn ku hêjmara wan hindike, çêkirna hilbijartinê di nav van hersê şaxan de, piştî bûn piştevanên wan, yê hevalên wan zêdebibin û belkî di kongirê de serbikevin. Ev bû sedema levnekirna wan û nehişt hilbijartin bê lidarxistin. Tahir (endamê mekteba komîtiya deverê) dibêjê: ku ew, yanî Çep, çalekiyên xwe, weke levkirina me, ranewestandin, li nav hevalên komikan digerehan, dikirin ku wan bi xwe re bikin heval, ev karê wan hişt em li wan bişikê bikevin, ku ev levkirina me û wan, pilaneke ji bo dem bi wan re çêbê, da bikarin hevalan ji me bidizin.

Ya rast, Çepan, çalekiyên xwe nesekinendin, xwe gihandin endamên serdariya kevin,(29) û ji wan xwestin bi wan re bikin, an piştevaniya wan bikin û welê jî, xwe gihandin hevalên komikan.

Gora gotina hinek berpirsiyarên wan, weke Neyo, Hilal, Nûrî û xeynî wan jî, ku Selah xwe gihand Osman, Reşîd, Mihemedê Mela Ehmed, Ebdilayê mela Elî, Ezîzê Dawê û Mihemed Enwer û ji wan xwest vegerin xebatê, da di rûyê Hemîd de rawestin. Selah ji hevalên xwe re got ku evên he piştevaniya wan dikin. Lewre di nav hevalên komikan de û piştevanên xwe de, digotin ku serdariya kevin, hevalbendiya wan dikê.

Xuyakir ku Osman Sebrî soz dabû Selah, ku bi wan re bixebitê, lê bi şertê ku tû kes ji endamên serdariya kevin bi wan re nexebitê. Bi rastî ev xwesteka Osman, ew kirin tengahiyeke mezin de û hişte hinek ji hevalên serdariya kevin, weke Reşîd Hemo û Ezîzê Dawê, yên di xwestin bi wan re bixebitin dûr bikevin. Osman bû sebebê dûrkirna wan.

Neyo û Selah û hevalên wan, neçar bûn û ew di destpêka çalekiyên xwe de, bi Osman bigrin û dev ji yên dîn berdin, ji bo, ji nav û dengê Osman sûdekî ji partiya xwe re bigrin.

Û holê ji hevalên serdariya kevin, bi wan re, di partiya wan de Osman tenê ma û Mihemedê Mela Ehmed jî, ji derve yê rêxistina wan, piştevanî û alîkariya wan dikir.

Ji alîkî dî, di vê demê de, Hemîd ji bo bawerya hevalan bi xwe bînê, di nav hevalên komikan de digereha. Ji wan re dida xuyakirin ku levnekirina berê, di nav wî û hevalan de ne maye Ji bo vê Mela

Mihemedê Neyo bixwe re bir çend civînan, di rojhilat û rojava ye Qamişlo de. Lê hevalên komikan û yên dijber weke Kin'anê Egîd û Mela Mihemed Emîn gotîn, ku bi gotinên wan bawer nedibûn, bi helwesta wan bi şik bûn. Ku dema fersend bikevê destê wan de, yê lev bi qulibin.

### *A-Konfiransa çaran, di dawiya sala 1965 an de*

Dema Xalid ji Kurdistana Iraqê vegereha, dît levkirina wan û Selah û Neyo tiştek jê pêk ne hatibû, lewre hevlên komîtiya deverê û yên şaxan û hinek ji komikan û hevalên serdariya kevin, yên di dawiya sala 1965 an de, dev ji xebatê berdayîn, xwestin civîna konfiransa çaran, bê ku Çepan bixwazê wê. Lê ji endamên serdariya kevin kesek amade nebûn tenê Hemîd dixwest amadeyê wê bibê, lê komîta amadeker, rê ne dayê, bi hinceta endamên serdariya kevin tu kes amade nebûye.

Konfiransa çaran bi beşdariya Ni'man Isa, endamê komîtiya navendî ya Partiya Kurdistana Iraqê, li gundê Berko, hate lidarxistin (30). Û bi hebûna dijberên Dêrikê, Kin'anê Egîd û Ebdilqadirê Gurî jî.

Di wê civînê de Kin'an gotina wan xwend, lê di dawî de, bi helwesta xwe ya berê, weke dijber, girt. Çinku wan dixwest hemû endamên serdariya berê amadebibin, ji bo hemû astengan bidin xuyakirin û gotinên wan yên li ser hev heyîn bêjin. Lê eva he çênebû, lewre man weke berê. Ji aliyê dî ve komgirêka Melan bûn piştevanên Çepan û bi wan re xebitîn.

Konfirans giha gelek biryaran, weke Tahir Sifûg dibêjê, ji wan:

1-Derxistina Mela Mihemedê Neyô û Selah Bedridîn û Nûrî Hacî, ji partî û hetkandina wan.

2-Durkirina endamên Çepên mayîn.

3-Serdariyeke nû, ji Tahir Sifûg, Derwêşê Mela Silêman û Midewer hate hilbijartin. Û biryar dan, bi dan û standinê bi endmên serdariya kevin re, ji bo naskirna nerînên wan, li ser vegera wan di komîtiya navendiya nû de.

Ji bo vegerê Reşîdê Hemo û Ezîzê Dawê, xwestin vegerin xebatê û di sala 1966 an de bûn endamên serdariyê û bi wan re Hemîd jî vegereha serdariyê.

Konfiransê, komîtiyeke ji sê endaman: Hesen Şêxo, Ehmed Berzencî û Xelîl Hacî Silêman amadekir, jibo xwe bighînê hevalên serdariya kevin û ji wan sê pirsan bikê û bersivê nivîsandî bidin:

1- Di nerîna wan de çine sedemên levnekirinê, di hundirê Partî de?

2- Di nerîna wan de, çine çareyên rast ji bo van levnekirinan?

3- Gelo dixwazin vegerin xebatê, di Partiyê de? Ehmedê Berzencî dibêjê: Gora biryara komîtiyê, wî xwe gihand Osman Sebrî û hewilda wî vegerînê Partiyê û serokatiya wê bikê û dev ji Neyo û Selah berdê û daxwaza Reşîd û Hemîd jêre got, ku ji bo Partî bimîne yek, ew amadene daxwazên wî hemûwan bibin serî.

Lê Osman bi gotinên wî razî nebû û got min gotina xwe bi wan re daye, ez ji gotina xwe venagerim û ezê bi wan re xebatê bikim.

Û holê di encama van dan û standinan de, Reşîd û Ezîz û Hemîd vegerehan komîtiya navendî û xebatê.

Berî konfirans lidarbêxin, Xalid Meşayix ji hevalên xwe re, da bû xuyakirin, ku ew xwe pêşkêşî hilbijartina komîtiya navendî nakê û yê dev ji xebatê berdê. Û dema konfirans dawî bû, wî jî xwe ji xebatê, di hundirê Partiyê de vekişand û xwe gihand karwanê endamên xwe ji xebatê dûrkirîn.

## *Gotina Dawî*

Me dît, Partî rêxistineke neteweyî giştî bû. Ji destpêkê de, bû qada hevrikiyeke mezin, navbera çîn û tîjên jevcida, nav bera burjiwaz û pêşverûyan de. Bi wêre jî, me dît keysdarî û serberedayetî jî, roleke xirab leyist, alîkariya parcebûnê kir.

Me burjiwaza xwe dît ji:

1- Serdariya kevin ya tevgera Kurdî, (ya Xoybûnê) bû. Û

2- Ya nû (biçûk û navîn), a bi serokên eşîran ve girêdayî.

Burjiwaza Kurdî, serdariya kevin a tevgera Kurdî, ewa di rastiya xwe de erûstukratiya Kurdî bû, ji malbatên paşan û began û axan bûn. Daketin meydana nû ya siyasetê, bi ramanên xwe yên kevin ve. Lê zû bi bûyerên nexewş re xwe eşkerekirin.

Hin heval di serdariyê de û di komikan de, ewên xwedî nerîna nû ji xebatê re û bi rola burjiwazan, di tevgerê de razînedibûn, hember hebûna wan di serdariya partî de rawestan.

Hemûwan dîtin ku gereke wan ji xebatê dûrbikin, lewre bi hevre sekinîn û hebûna wan di komîtiya navendî de û di mekteba siyasî de ne pijirandi. Çinku ew têgihiştin, ku ev çîna he, ya demekê serdariya tevgera Kurdî dikir, gihaye radekê ku xebata wê bi xweşiyê ve girêdayî ye.

Lê digel vê jî, serdariya Partî xwest wê razîbikê û nav û dengê wê, yê civakî biparêzê. Lewre pileyeke bi navê (komîtiya şêwirdar ji serdariya Partî re) dayê. Lê burjiwaza me bi vê razî ne bû û xwest di serdariyê de karbikê. Ev nerazîbûna wan ji wê biryara serdariya Partî, bû sedemê levnekirineke dirêj û dijberiya wan û hevbendiya hinek ji endamên Partî, bi wan re.

Lê berdewamiya xebatê û hebûna bûyeran, bûn sedemên hevrikiyeke nû, di nav hevalên serdariyê, bi xwe de. Hê serdarî ji hevrikiya xwe bi burjiwaza kevin re xilas ne bibû, bi tîjekî ji wê (xurtir û cengewetir û kartekerê wê firehtir) di hundirê Partî de, kete di hevrikiyeke dî de. Evahe ji zîndana sala 1960 î, destpêkir. Sîmpûla wan Dr. Nûredîn Zaza bû, dû wî re, Hemîd û Kin'an, bûn serdarên wê. Vê xwest ramnên xwe yên siyasî, di nav hevalan de belavbikê, lê bi firehî nekarî. Lê karî bi firehî hevbendan di nav

Institut kurde de Paris

dewlemendan û zengînên gundan û hinek ji burjiwaza biçûk ya bajarî de, ji xwere bibînê.

Bi rex van jî, Partî bû qada sûd û mafiran, ji bo hin keysdar û serberedayan re. Lewre levnekirin fireh bû, asteng pirbûn, komgirêk bûn gelek, di ser hevde gurbûn, ta radekî sedemên levnekirnê yên serekî, hember pirbûna pirsgirêkên bêhûde, yên hebûna Partî dan ber parçebûnê, windabûn.

Rola serdariya Partî, di van bûyeran de û di komkirina astengan û neçarekirna wan de, gelekî mezin bû. Çinku ew bi xwe ne têgihiştî bû û ne yê van hevrikiyên siyasî û îdîolojî bû. Nekarî bizanebûn û huşmendî hember van bûyer û astengan rawestê û binerîneke kûr wan çare bikê û koka wan vemirînê. Çinku wan, ne xwe û ne hevalên xwe yên komikan, ji bo holê bûyer û asteng û hevrikî amadekiribûn. Û bê kûrbînî gav tavêtin û biryar digirtin. Ev tiştên he hemû, bûn sedemên belavbûna serberedayetî û keysdariyeke mezin di nav Partî de. Û hin tiştên biçûk, di vê dema dawî de, berî parçebûnê, cihê tiştên giring di levnekirnê de girtin û yên bingihî windakirin û nehiştin bên xuyakirin. Eger eva he neb wa dikarîn nehêlin parçebûn çêbê, an çend salên din dereng bikevê. Lê mixabin yên bingihî û rastî, hatin veşartin û parçebûn cihê xwe girt.

Lê..hebûna vê levnekirinê û pirbûna astengan û firehbûn wan, ne wata wê ew bû, ku serdariya Partî, erkên xwe yên netewî û armancên milet jibîrkirin û ji wan dûrket. Ew armanc di serê her karî de bûn û berî her tiştî bûn. Hayê milet û hişyar bûna wî û pêzanîna wî bi wan, li cem serdariyê, erkê bingihî bû.

Ev qunaxa he, ne tenê ya astengan bû, lê ya bingihkirina armancên netewî û nîştimanî bû.

Eger di destpêkê de şaşîtiya serdariyê, di nezelalkirina armancan û ne baş xuyakirina awayên xebatê bû, ew bixwe, bû sedemê peyda bûna levnekirinê di nav serdariyê de. Lê hember wê, di vê qunaxê hemû yê de, yekîtiyek di nav wan de, li ser hin armancên din hebû, weke belavkirina xwendin û nivîsandina ziman û belavkirina folkilora gelêrî, di nav milet de û xebat ji bo, bi destxistina dîmûkratiyê û biratiya Kurd ereban di welêt de.



Institut kurde de Paris

Bi van astengên mezin yên me dîtin, partî dihat şewitandin Lê di vê qunaxê de, gelek tiştên giring pêkhatin. Weke, bi xwendin û nivîsandina ziman girtin û ji hevalan dihat xwestin xwe hînî wî bikin û raporên xwe bi kûrdî binivîsin û jêderên Kurdî ji xwe re peydabikin û wan bixwînin. Ji bo vê, belavokên Partî bi zimanê kûrdî dihatan nivîsandin, yên weke Dr. Zaza û Osman Sebrî û xeynî wan jî dinivîsandin. Ta radekî mirov dikarê bêjê ku ew qunax, weke qunaxa kovara Hewarê bû, bi belavkirina zimanê Kurdî, di nav Kurdên Sûryê de.

Bi rex wê jî, me dît partî kevnşopên Kurdan, di her warî de di vejinandin û vedigerehan folkilorê milet û di cejnan de, didan xuyakirin, digel zor û zordariya desthilatan li ser wan heyî. Me didît cilên lixwekirina Kurdan (weke şal û şapik) di her malî de hebû û di rojên weke newrozê de li xwedikirin. Û navên zarokan bi Kurdî bibû nîşana wê demê. Ev tiştên he hemû, dida xuyakirin ku Kurd mafên xwe yên netewî dinasin û bê ku nijadperestî serê wan dagrê dixwestin. Ew nijad perestiya desthilatên Sûryê, bi her awayî didan xuyakirin û her demî zora xwe li milet dikirin, ne dihiştin cilên xwe yê kurmancî li xwekin, an navên Kurdî li zarokên xwekin.

Bi rex van jî, me dît, partî di xebata xwe de, gelekî li ser mafên milet û nasbûna wan û armancên din, disekinî. Li ser van, heval dihatan hişyar kirin û hewildidan ruhê nijadperestî çi ya Kurdî, an ya Erebî, di dilê wan de reşbibê û vemrê, ew jî bi rêya naskirina ramanên dîmûkratî û wekhevî û dadmendî. Û hewldida wan ji ramanên civakiyên kevin dûrbikê û wan bi nerînên nûjen û çanda zanistî ve girêbidê û bi awakî zanistî li bûyeran binêrin û wan şirovbikin.

Holê jî, me dît, Partî di nerînên xwe de, li ser yekîtiya niştimanî, weke armanceke serekî rawesta û dida xuyakirin ku tu cidabûn di nav wê û yên Kurdayetî de nînin. Evahe hişte gelek ji ereban bi xebatkerên Kurdan re, yên di zîndanê de, rawestin û piştevaniya wan bikin û bi bargoman kirina wan bi (veqetandina parçek ji Sûryê) ji aliyên desthilatan ve, bi nerastiyê ve girêbidin. Çînku wan Ereban dîtin ku Kurd, bi rastî biratiya Ereban dixwazin

û hez welat dikin, lê li ber mafên xwe yên netewî de didin û doza wan dikin.

Partî di xebata xwe de, karî hezkirina gelek kesan, ji dîmûkrat û pêşverûyên ereb û xeynî ereb, ji dervêyî welêt jî, ji armancên miletê xwe re bike piştevan. Weke rêxistina mafên mirovan û xwendekarên cîhanê û hin kesên navdar. û gelek parêzer di cîhanê de, xwestin bergiriya girtiyan û piştevaniya wan di dadegehê de bikin. Eva he jî, nîşana piştevaniya wan ji mafên netewî yên Kurdan re bû.

Bi vî awayî, em dibînin ku xebata partî li cem asteng û hevrikiyê ne rawesta, lê xebitî ji bo armancên xwe, di her warî de bihêlê.

Weke berê jî me got, ku astengên partî gelekbûn û rayên xwe kûr kiribûn û rola xwe di parçebûnê de leyistbûn, ta cihê xwe di rêxistinê de girt. Em sedemê wê di sê bendan de dibînin:

1- Di hevrikiya nav burjiwaza Kurdî û pêşverûyên gelêrî de.

2- Di belavbûna serberedayitî û ruhê komgirêkî û keysdarî, di nav hevalan de.

3- Rola lawaz, ya serdariyê, beramber bûyerên di hundirê Partî de çêdibûn û peydanekirina tu çaran ji wan re.

4- Û holê di dawî de, piştî hevrikiyeke dirêj, çend salan domkir, Partî bû dû beş, bû dû partî (Rast û Çep), gora nav li wan hat kirin.

Di serdariya aliyê rastê (Partî dîmûkratî Kurdî, li sûryê) de, Hemîdê Hacî Derwêş, Reşîdê Hemo û Ezîzê Dawê û hineke din. Û di ya Çepan (Partî dîmûkratî Kurdî Cep, li sûryê) de, Osman Sebrî, Mela Mihemedê Neyo û Selah Bedridîn û hineke din.

Lê çawa Partî bû dû beş, ji van kesan bi xwe û bi vî awayê ku tû kesî goman ne dikir?

Eger mrov baş li rewşa dawî ya Partî binêrê, yê bibînê ku her tişt levketbû, ew levnekirina berê di nav hevalan de, hate guhertin. Piştî cidabûnê, me dît Hemîd bi Reşîd û Ezîz û Tahir Sifûg re kardikê, evên berê rêya çûkê, di nav wan re ne diçû. Ji aliyê dî ve, me dît Osman û Selah û Neyo, hevaltiya komgirêka Melan dikin, ewên berê dijî serdariyê bûn.

## Gelo çawa ev guhertina he çêbû?

Hevalên komikan û xeynî wan jî, yên niha bi aliyê rast re dixebitin, berê, ji Hemîd gelek ne razîbûn. Dema Hemîd vegereha Partiyê nerazîbûna xwe bi xurtî dan xuyakirin. Pêy wê re, me dît Reşîd û Ezîz, ên dijî ramanên wî yên siyasî û îdîolojî bûn û di destpêkê de, piştevaniya çepan kirin (gora gotina Neyo û Nûrî Hacî û xeynî wan jî), lê piştî çend mehan, wan û Hemîd bi hevre karkirin (31). Ji bilî van herdû endamên serdariyê, me dît helwesta gelekan ji hevalên komikan û yên koma deverê û yê şaxan jî, hate guhertin, weke ya van herdû kesan, ta radekî hinek ji wan kesên berê bi serdariya kevin re bûn, di destpêkê de bi çepan re man, piştî demeke kurt, bûn bi aliyê rast re û dev ji çepan berdan, an dev ji xebatê, bi her dû aliyan re berdan.

Gelo ew guhertin, di helwestan de, çima çêbû?

Hevbendiya Osman Sebrî û xebata wî bi Çepan re, ser bingehê ku bi tu kesên serdariya kevin re nexebitin, hişte bizava çepan tengbibê. Ne karîn tu kesên berê, yên xwestin vegerin xebatê, weke Reşîd û Ezîz, bi xwe re bikin heval û bi hevre bixebitin, ta radekî Mela Mihemedê Neyo bi xwe, ket ber vî şartê Osman de, di gel ku Mela Mihemedê Neyo, yek ji damezrevanên aliyê çep bû, berî Osman bibê hevalê wan, lê di dawî de Osman dev ji şertê xwe, bi wî re berda û Mela Mihemedê Neyo ma bi wan re di komîtiya navendî de. Çepan bi Osman girtin û xwestin ji nav û dengê wî sûdekî bigrin. Çinku hê wan, nû dest bi avakirina rêxistina xwe dikirin û hevalên wan kêm bûn, lewre bi Osman girtin û dev ji hevalên din, weke Reşîd û Ezîz berdan û cihê wan li cem xwe nekirin.

Reşîd û Ezîz jî, ji xwe re hinceta xebatê bi Hemîd re, di biryara konfiransa Sisyan û ya çaran de dîtin, ew biryarên ew vegerandin serdariya Partî. Û bihev re di serdariya Partiya aliyê rast de xebitîn. Û levnekirina wan a berê, li ser nerînên siyasî û îdîolojî, yê di paşerojê de bên çarekirin. Lê hevalên din, di komîtiya devarê û yên şaxan de, ewên hevalên Hemîd, di nav wan de gelekî kêmbûn, piştî parçe bûnê, bûn bi aliyê rast re, digel ku evên he û yên çep, berî

parçebûnê hevbendên serdariyê bûn, dijî Hemîd û komgirêka Melan bûn, ev serdariya di destpêka sala 1965 an de jevket, çinku Mihemedê Mela Ehmed û Ezîzê Dawê bi hinceta xwendina xwe ya bilind ber dewam bikin û Eliyê Şêxmûs piştî girtina wî û Mihemed Enwer bi sedema rewşa partî ya xirab, dev ji xebatê berdan. Û holê jî Osman Sebrî, Reşid Hemo, Ebdila yê Mela Elî û Kemal Ebdê, dema ji zîndanê, di destpêka sala 1965 an de der ketin, wan jî, bi sedema rwewşa partî ya xirab, dev ji xebatê berdan. Tû kes ji serdariyê li meydanê, ji bilî Xalid Meşayix û Hemîdê Hacî Derwêş (ewê berî çend mehan vegereha partî) nema û di nav wî û Xalid de, levkirin ne bû û gelekî jev dûrbûn. Di wê demê de lebta Xalid di nav hevalan de, fireh bû, heval pêre bûn û piştevaniya wî di kirin, bêhtir ji ya Hemîd, yê cihê wî di nav wan de sist bû. Di vê demê de Xalid şerê çepankir, ewên berê bihevre bûn, cinku hin tişt çêbûn, weke dûrkirina Mela Mihemedê Neyo ji komîtiya navendî, di konfiransa sisyan de, hişte jev dûr bikevin û dûre şerê hev bikin, bê ku tu kes ji hevalên kevin hebin, bikarin wan nîzîkî hev bikin.

Û dema çepan komgirêka xwe damezrandin, Xalid tenê ji serdariyê, li meydanê bû û serê wî di sed gêjiyan de bû, agirê şer gurbû. Xalid eva he dît weke ku şerê wî bixwe dikin û di xwazin navê wî di nav milet de kêmbikin. Lewre bi xurtî şerê wan kir. Vêca wan jî (çepan) konfiransa xwe di / 5 / Tebaxa / 1965 an de, li darxistin.

Hevalên bi Xalid re, dîtin ku Osman tenê bi çepan re, ne bese, ku bi wan re bibin heval û hevbendiya wan bikin û bibin cihê baweriyê. Û bi vê re jî, Neyo û Selah ne ew kes bûn ku cihê baweryê bin, bi sedema:

1-Mela Mihemedê Neyo, Endamê cihgir, di komîtiya navendî de bû, lê navê wî her û her di nav yên dixwestin komgirêkan û astengan peydabikin. Ev wêna wî, dihişt keyfa hevalan jêre neyê.

2- Selah Bedridîn û Nûrî Hacî û yên din, ew li qamişlo di komîtiya şaxa xwendekaran de bûn, an di xeynî wê de bûn, tu kes ew nas ne dikirin, da wan ji xwe re bikin serdar, ji bo vê, kesî piştevaniya wan ne kir. Di dawî de, yên di destpêkê de bi wan re bûn, dema parçebûn, di destpêka sala 1966 an de cihê xwe girt, dev ji wan berdan û dijî wan rawestan û di partiya xwe ya kevin de, bi

Reşîd û Ezîz û Hemîd re xebitîn û levnekirnên xwe, yên berê jibîrkirin.

Lê di nerîna min de, ya hişt karê partî ji destê serdariyê der kevê û pey wê re, jevbikevê, ev bû, ku:

Bi rex tiştên berê me gotin, weke hebûna hevrikiya siyasî û îdîolojî, ji sala 1958 an ve, bi burjiwazan re, çi di hundirê partî de, an derveyê wê û hebûna:

1- Dijberiya komgirêka Began.

2- Dijberiya komgireka Dêrkê.

3- Dijberiya komgirêka Hemîd û hevalên wî.

Evên he, birastî, li meydanê hebûn û xebat, dijî serdariya partî dikirin, lê ne dikarîn bighin hev û hember serdariya partî bibin yek.

Çinku hin tişt di dilê endamên her komgirêkekî de hebûn. Ji bo xwe dikirin, digel ku hin caran xwe nîzîkî hev dikirin, lê bi wan re ne diçû serî. Çinku:

1- Evên he, bi hev ne bawer bûn.

2- Her komgirêk dixwest serdarî ji wê tenê re bibê.

Ji bo vê, komgirêkên dijberan, man jev cida.

Lê ev komgirêkên he bihevre bûn, li ser:

1- Avêtina serdariya Partî û girtina cihê wê.

2- Bawerya wan bi ramanên Dr. Zaza yên siyasî hebû, ewên di zîndana sala 1960 î de, gotin.

Lê dijberên burjiwaz, tû kartekerên mezin, yê wan li ser xebata serdariya Partî ne bû, ne karîn xebata partî rawestînin lewre pêveçûya xebatê ber dewam bû. Cinkû:

A- Beg, Ji zû de kartekerên wan li ser milet çûbû û mabûn bê piştevan.

B- komgirêka Dêrkê, hevalbendên wan ji xelkê Dêrkê tenê bûn, kartekerê wan li ser derveyê Dêrkê kêm bû. Ew ji dest pêkê de, xwedî asteng û dilbijokbûn û serdarî ji wan nerazîbû, lewre gelekî guhnedida wan. Lê hebûna wan li ser sînorê Kurdisatana Iraqê, dihişt nûçeyên şoreşê zû bighin wan. û van jî, ew nûçe di nav xelkê de belav dikirin û pêre jî, didan xuyakirin ku dan û standina partî bi şoreşê re nîne, ji bo dilê xelkê ji Partiyê reşbikin.

C – Hevalbendên Hemîd di nav şaxan de kêm bûn û belavkirî bûn, tû kartekerên mezin ji wan ne bû. Lê hevalên wî di komîtiya deverê de, xirabî dikirin, ne dihiştin komîtiya deverê karekî bibe serî, an astngan çare bikê.

Vêca di nerîna min de, ya bû sedemê jevketina dawî, komgirêka Melan bû, (wan ev giringiya rola xwe ne dizanîn). Çinku ew sê şax nîzîkî hev bûn (şaxa Aliyan û ya Tilcemalê û ya Koçeran) hemû bi hev re bûn û endamên wan gelek bûn û cîranên dijberên Dêrkê ji alîkî û dijberên Cerahê (Tirbispî) ji aliyê dî ve. Ev komgirêka Melan, ji hemûwan bêhtir bûn, xirabiya wan bêhtir bû, lê ne xwedî kûrbîn bûn. Bi vî rengî, rojhilatê Qamişlo, hemû bû bin destê dijberan de, bi rex yên heyîn di rojavayê Qamişlo de. Lewre çalekiyên Partî rawestan, serdarî nema karî tiştkî bikê. Wan eşkere nebaweriya xwe bi serdariyê dan xuyakirin. Û rewş bal herfandinê ve diçû, ji bo vê, parçebûn çêbû.

Holê em tên dawiya qûnaxa yekê, ji pêveçûya xebata Partiya Dîmûkrata Kurdistana Sûryê, ya dixebitî ji bo mafên netewî, yên miletê Kurd li Sûryê, da bi destbêxê, ev mafên bûn sedemên levnekirinê di nav hevalên serdariyê de. Çinku her alîk dixwest wan mafan weke ramanên xwe şirûv bikê û eva he dihişt awayê xebatê, gora berjewendiyên wan bê.

Gelo ma hemû levnekirin û hevrikiyên heyîn, di bingihên xwe de, vedigerehan bal ramanên siyasî û îdîolojî? Na... Gelek levnekirinên kesan bûn, an yên malbatan bûn, an eşîran bûn, dûvkên wan, di nav rêxistinên Partî de belû dibûn û dibûn barek li ser milê serdariyê, divwa zû bên çarekirin, an ser hevde tirş bibin, weke nav bera Hemîd û Hemze, an Hemîd û Şêx, an weke yên di nav hevalên şaxan de.

Birastî pêveçûyeke dilêş bû, lê bê wê jî nedibû. Bê cidabûn di saziya Partî de çênedibû. Çinku cidabûna siyasî û îdîolojî, kartekerên xwe di nav hevalan de hiştibû. Lê hê, bi sedema nîrên xweyîtî û babetî û yên hundir û derveyî Partî û yên di nav hevalên serdariyê de û yên komikan de, ne gihabûn dawî.

***Dawî bû***

# Têbînî:

1- Serdariya Xoybûnê di wê demê de, ji van kesan bû: Dr. Ehmed Nafiz, serokê wê bû û yên din Ekrem Cemîl paşa, Qedrî Cemîl paşa, Hesen Haco axa, Cemîl Haco axa, Arif beg Ebas, Ebdilrihman Elî Yûnis axa, Mela Ehmed Zivingî (miftiyê qamişlo) Cegerxwîn endam bûn.

2- Rojnama (Wijdan û dûre, bû el Huriye) li Bêrûtê derdiket, ser nivîsarê wê Yûsif Melekê Aşûrî bû. Meyldarê Yûnanistanê bû. Bi sedema levnekirina wan û tirkan, li Kîbrûs (Qubris) ê. Hinek ji Kurdan weke, Rewşen Bedirxan li Şamê û Dr. Nûrî Dêrsimî û hin axên çiyayê Kurdan li Helebê û li Cizîrê Mela Hesen Hişyar alîkariya wê rojnamê dikirin û di nav Kurdan de belav dikirin. Di wê demê de, hinek ji xortên Kurdan goman dikirin ku ew rojname dengê Kurdên netewî ye, cinku wê ser Kurdan gotar dinivîsî.

3- Rojnama El we'î El Erebî, li Şamê derdiket, ser nivîsarê wê Fethî Kerkûtlî bû, bergiriya Sûryê dikir. Hinek ji Kurdan, weke Reşîdê Hemo û xeynê wî tê de gotar nivîsandin.

4- Em gotina komgirêk, li wan dikin, çinku serdariya Partî ew nav li wan kir.

5- Eva he nayê bi wê watê, ku Kurd hemû ji bo armancên neteweyî bûn komonîst, çinku me dît gelek ji wan, pirsa netewî ya kûrdî, li cem wan dûv ya çînî û ya navnetewî dihat. Û hinek ji wan pirsên netewî, berî ya çînî dihat, lewre cihê wan di nav wê Parti yê de nebû, weke Mihemed Fexrî û Cegerxwîn û endamên Hizba Azadî. Û her wiha jî weke Reşîd Hemo û Mihemed Elî Xoce û Şewket Henan û Xelîl Mihemed, ji damezrevanên Partiyê.

6- Yaqûb Gero, endamê mekteba siyasî ya partiya komonîst, di kovara el Nehic de, hêjmara 23 - 24 an, gotarek nivîsiye têde dibêjê: Di demekê de, di nav partiyên me komonîstan de, sermeznatî belav bibû û xwe ser her hêzan re didîtin û ji her helwesteke netewî ditengijîn, şûna dan û standineke nerm û babetî, bi xwediyê wan ramanan re, bihata kirin, helwestek dijî wan dihat girtin. Evahe arîkariya ne xweşî di nav me û hêzên netewî de, dikir.

7- Şewket Henan dibêjê: Wî xwe gihand Cegerxwîn û ew razîkir ji bo bibê hevalê Partî.

8- Xuyadikê ev daxwaza he, di demê ya Cizîrê de bû.

9- Taxa Kurdan li Şamê, niha navê wê Ruknidîn e.



Institut kurde de Paris

10- Mecîdê Hacî Derwêş dibêjê yek ji Kurdaxê jî, navê wî Adil, bi wan re bû.

11- Di meha çirya paşîn ji sala 1988 an, min ji Osman, li ser van tiştan pirsî, got ev hemû ne rastin û domand û got ku tiştek nayê bîra wî.

12- Ew bû sedema levnekirina wî û Reşîd Hemo û bi sedema wê, Şewket sala 1959 an de, hate girtin.

13- Hemze Niwêran, yek ji damezrevanên Partiyê ye û di demekê de, endamê komîtiya navendî bû. Min xwe hilgirt û çûm bajarê wî, Serê Keniyê, ji bo rola wî di damezrandina Partî de û çi nûçeyên din, li ser bûyeran, li cem wî heyîn bizanim. Lê mixabin devê xwe girt û tiştek ne got, bi hinceta ku ew bi vî karê ez pê radibim ne bawere. Cinku tû sûd û feyde nadê û domand ku ezê bipirsim çima ev bûyera he çê bûye û çine sedemên wê û kîne sersebeb. Û wî, yanî Hemze ji xwe re biryar girtiye, ku tu tiştek, ji tu kesî re, li ser partî, ne bêjê û yê neştexilê, lewre ji minre jî, tiştek li ser astengên partî nabêjê. Ji wê gotina xwe ne hat xwar. Lê mixabin dûre ez pê heseham ku Hemze, ji min tenê re welê kir. Çinku nexweşiyên kevin, yên di nav mede çêbûyîn, dema em bihevre dixebitîn, hê di dilê wî de mane. Vêca ji bo wan nexwest alîkariya min bikê. Bi vî awayî, nûçeyên cem wî heyîn, ji me û miletê me veşartin.

Endamekî dî, ji damezrevanan, Xelîl Mihemed, mixabin min nekarî wî bibînim, çinku ew derveyê welat bû.

14- Hemîdê Hecî Derwêş dibêjê, ku Dr. Zaza di wê demê de nebû hevalê Partî, çinku Began (serdarên Xoybûna kevin) dema dîtin Partî hate damezrandin, jê xwestin bihevre partiyekê damezrînin û wî bikin serokê wê. Lê wî ev daxwaza wan ne pijirand, lewre ya hevalên Partî jî ne pijirand.

15- Di wê demê de, Cegerxwîn jî, bû endamê komîtiya navendî.

16- Em wan bi gotina "Began" bi nav dikin, çinku me welê nav li wan dikir.

17- Baş tê bîramin, ku di wê demê de, digotin ku rêkeftinek di nav serdariya Partî û Began de çêbûye, ser bingihê ku serdarî, Partî jevbêxê û beg jî partiya xwe (yanî Xoybûn, an Partî, ya di sala 1946 an de, ew nav lê kirîn û hingê jî jevket), jevbêxin û ji nûve, Partiyek û serdariyek, ji herdû aliyan damezrînin.

18- Cemîlê Haco, dibêjê tû civîn û tû rêkeftin di nav wan û serdariya Partî de çênebûye.

19- Di nerîna min de, ku hinek ji endamên komîtiya navendî di dilên xwe de, bi began re bûn, digel ku di gotinên xwe de, ji wan dûr bûn, lewre me dû rûyî ji wan didît.

20- Şêx dibêjê: Di wê demê de, min ji Mecîdê Haco pirsî, çima te hin kes ji şaxa Cerahê dehfandin, ji bo piştevaniya Began bikin? Mecîd di

bersiva xwe de got: ez weke ewên li desthilatan diqulibê, eger çû serî, bû serok û eger pêre ne çû serî, ciza pêşiya wiye. Tu ciza jêre ne bû, lê helwesta wî û Mihemed Fexrî ber çavê serdariyê bû.

**21-** Baş tê bîra min, di wê demê de, Mecîd got min ku Beg ji civîna xwe bi komîtiya navendî re vegerehan, ka em bibînin çi bi wan re çêbûye? Di mala Dr. Nafiz de, me Dr. Nafiz, Qedrî beg, Ekrem beg, Hesenê Haco, Cemîlê haco û Arif beg bihevre rûniştî dîtin. Me ji wan pirsî, ka çi bi we re çêbû ye û gihan çi biryaran? Tê bîra min Qedrî beg bersiv da û got: Mercên siyasî gelekî nexweşin, em bal rewşeke xirab ve diçin û gomana girtinê heye. Ji bo vê, divê çalekiyên siyasî yên Partî bên rawestandin, xebata rêxistinî bê seknandin û tû rojname û belavok dernekevin. Me got, em ji cem xwe agirê dijberiyê gurnakin û çalekiyên me, yên di sînorê çalekiyên Partîzanî de bimînin û em tu belavokan di bajaran û kolanan de belav nakin, yê tenê rojnama me û belavokên me derkevin û di hundirê partiyê de bin. Û em van naseknînin, Çinku ew dihêlin heval bi heve bên girêdan. Lê wan nerîna me ne pijirandin, lewre em rabûn û her yek li alîkî.

**22-** Piyêr Badanûva, Hevrikî li ser Sûryê, 1945 – 1966. çapa Dar el Me'rîfe.

**23-** Kovara El Wihde, ya li Rebat derdiket, hêjmar 48. Eylûla 1988 an.

**24-** Em navê Partiya komonîst tenê, di nav hevrikên Partiyê de, tînin ser ziman, çinku ew ji xeynê xwe, Partiya Ba is, Qewmî Sûrî, Ixwan Muslimîn û xeynî wan jî, bêhtir di nav Kurdan de, dikarî bizavê bikê, digel Ixwan jî, hinek hevalên wan, ji Kurdan hebûn, lê zêde kêm bûn.

**25-** Serdariya Partî ji bilî dû belavokên çandî, belav ne kir. Yek sala 1959 an de, bin ser navê, Serberedayîtî, ya Dr. Zaza bû. Ya didwan, sala 1962 an de ya Reşîd Hemo bû, bin ser navê (li dora astengên me) .

**26-** Weke me got, sala 1959 an belevoka Dr. bi kurmancî bû, bin ser navê Serberedayîtî, ji pirtûka Mao Tisî Tong, wergerand bû. Û ya Reşîd jî, bi kurmancî bû.

**27-** Dema em dizîndane de bûn, Osman ji min re got û her wiha Hemîd jî, ji minre got: Dema rêzan bi hevalên xwere vekolan, Osman razînebû, bi hebûna vê benda he,(rizgarkirin û yekirina Kurdistanê) di nav bendên rêzanê de bê, çinku, di nerîna wî de, dem û nîr nexweşbûn, ji bo hebûna wê bendê di rêzanê de. Lê hevalên din hemû wan xwestin ew bend di rêzanê de hebê. Û Ji bo xatirê wan, Osman jî, bi hebûna wê bendê, di rêzanê de, razîbû. Lê Reşîd di bêjê tu kesî, ne got bila ev benda he di rêzanê de, nebê.

Lê çima Osman, di zîndanê de, bi gotina Dr. Zaza ne kir? û li ber dadegehê, ne got ku ew ne rêzana waye. Osman dît, çênabê li ber dadegehê û ji tirsa hikmê qazî, ji rêzana xwe bazbidin û xwe jê bişûn.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Ebdula yê Mela Elî, Xelîlê Ebdê (sor), Mihemed Fexrî, Kemal Ebdê, Bilal Hesen, Seydo Ersilan û Kemal Cemîl Seydo. Û bi van re jî hinek kadir weke Mela Mihemed Neyô. Yê amadeyê vê konfiransê ne bûn: Dr. Nûredîn Zaza û Osman Sebrî, Reşîd Hemo û Mecîdê Haco.

43- Kin'anê Egîd (yek ji hevbendê Dr. bû. Ji destpêka levnekirnê, ta dawiya sala 1965 an, dijberê serdariyê bû) dibêjê: Ew û hevalekê xwe (Diyaa el Mela) çûn Şamê cem Dr. Zaza (berî komîtiya pirsan, wî bibînê) û jê xwestin, bê acizbûn û bê xeyd komîtiyê bibînê, jibo vegerê Partiyê û bi hevre dijî serdariya Osman û Hemîd û yên din bixebitin. Dr. dilê wan xweşkir ku yê komîtiyê bi bêhin firehî û bê acizbûn bibînê û yê hêviya wan bi cih bikê. Lê dûre, li wan, bidev ken vegereha û ji wanre got ku wî, gotinên nexweş li wan vegerand û berda wan. Van (Kin'an û Diya) bawerkirin ku tû hêvî di vegera Dr. de, li Partî nîne. Lewre dev ji wî berdan û dest vala vegerehan mala xwe li Cizîrê. Berê vê Dr. digot: ew venagerê Partiyê eger hertişt, ne didestê wî de bê, weke bixwazê yê bikê û razî nabê eger saziya Partî ne bi rengê Serokatî bê (weke yê serok komaran, di hinek dewletan de. M.).

44- Weke Mihemed Enwer (berpisiyarê hevgirtina xwendekaran û endamê komîtiya navendî), gotî.

45- Ji bo em kûrbûna levnekirina wan nasbikin, emê li zêde kirina dû endaman (ji bo demekî) li komîtiya navendî, di dawiya sala 1960 î de binêrin. Her yek ji wan dostekî nîzîkî xwe anî. Yek ji wan Se'doyê Iybô ji Dirbêsiyê, dostekî Hemîd, ji berî partî bê damezrandin. Endamê didwan, Ebdil-ferîd Ebdula, dostekî Şêx, ji berî partî bê damezrandin.

46- Mecîdê Haco, li ser gera xwe û dan û standinên xwe bi Hemîd û xeynê wî re, dibêjê: Ew û Mihemed Fexrî bi hevre bûn û bişêwir dixebitîn û wî di nîvê sala 1962 an de, dû caran xwe gihand Hemîd, (berî civîna mezin ya dijberan li Qamişlo). Carekî li Tirbispî û ya dî li Qamişlo, bi amadebûna Xelîlê Sor. Di her dû caran de rewşa partî vedikolîn û li ser tiştên gerek, ji bo serastkirina rewşa partî û vegerandina hevalên hatîn dûrxistin diştexilîn. Û didomînê ku li ser civîneke fireh, ji hemû dijberan girêbidin, levkirin û Hemîd jî yê amadeyê wê bibê. Di wê demê de / 8 / heşt şaxên partî, ji / 13 / sêzdehan, piştevaniya wan dikirin. Dema roja civînê hate nîşankirin, Mihemedê Fexrî çû gundê Çaxirbazar û ji Xelîlê Sor (endamê komitiya devera rojavayê Qamişlo) xwest amadeyê civînê bibê, Xelîl razî bû. Û di roja civînê de, Hemîd amadenebû, lê Xelîl şûna wî amade bû, (Mecîd li ser vê di bêjê: wî gomankir ku Hemîd bi hevalên xwe, yên komîtiya navendî re gihaye levkirinekê, lewre ne hat civînê û Xelîl şûna xwe rêkir). Di wê civînê de, Xelîlê Sor helwesteke xirab dijî wan girt. Ew hember, her tiştên me, yên dijî serdariyê me amadekirbûn rawesta. Beramber vê rewşê, me dev ji her pilan û davikên xwe berdan. Ji bo em ber



Institut Kurde de Paris

çavên, yên rûniştî, endamên şaxan, bên xuyakirin ku em yekin, bihevre ne, ne jevketîne, me hin biryarên sist û jevketî girtin.

47- Serdariyê biryara rawestandinê der heqê Xelîlê Sor de girt. Rola wî di wê civînê de, ya ne hiştî ew bighin hev û biryarên xurt, dijî serdariyê bigrin, ne bû jêre mehder.

48- Ez vê gotinê dibêjim, weke yekî agahdarê hemû tiştan, çinku ez endamê serdariya Çivata Xortan bûm û endamê komîtiya devera Cizîrê bûm û ber pirsiyarê saziyê bûm û dan û standina min bi hemû wan re hebû.

49- Ebdil Ferîd dibêjê: Em di gomanê de bûn, ku tiştek li paş kirna devera Cizîrê dû parçe hebû, lê çiye? me ne dizanî. Xelîlê Sor dibêjê: mebesta wan ji parcekirina komîtiya deverê, ew bû ku li hevalên Hemîd (Eliyê Şêxmûs û Xelîlê Sor) û xeynê wan jî teng bikin.

50- Eşîra Şemer a Ereb, bi pêşniyara desthilatên dewletê (ewa di pirtûka M. Teleb Hilal de hatî) ne kir û eşîra xwe ne guhezt gundên Kurdan. Lewre hikûmetê ereb ji dora Helebê û Reqeyê û Tebqe anîn û di gundên Kurdan de, dan rûniştandin piştî erd bi zora xwe, ji cotkarên Kurdan stand.

51- Me eva he ji vekolîna Mistefa Nazdar wergirtiye.

52- Mixabin, hinek hêzên Kurdî û hinek pêşverû, ji cotkarên Kurdan re xweş dikirin û feydên paşerojê ji wan re didan xuyakirin, ji bo dev ji erdê bav û kalan berdin û herin nav ereban bijîn. Weke çawa berê jî, ew dehfandin, da dev ji mefên xwe yên netewî berdin.

53- Ji bo nemûne, kuştina (Bineyan) kurmamê Diham El Hadî û (Milêhan) birayê Diham El Hadî, serdestê Nayifê Paşê, serokê koçeran, sala 1930 î de, dema eşîra Şemerên ereb ji Iraqê berê xwe dan bakûr û hatin Cizîra me û dizya koçeran dikirin, xwestin destê xwe deynin ser erdên wan, lew re li cem gundê Rimêlan levketin û ew herdû zilam kuştin . Ev bûyera he piştevaniya nerîna min dikê.

54- Sitandina erdan ji cotkaran tiştekî mezine. Dibê yê cotkar ji gund, bê derxistin, lê erdê wî, nayê standin.

55- Weke çawa Ezîzê Dawê û Mihemed Enwer dibêjin.

56- Ezîzê Dawê dibêjê: Hemîd xwe rawestand (xwe cemidand) çinku ketibu bin kartekerê nerînên Dr. Zaza de û doza civateke çandî, ji dêlî Partiyeke siyasî dikir û bi sedema ser darî dijî wî rawesta û rê lê tengkir, çalekiyên xwe rawestandin.

57- Kin'anê Egîd, serokê dijberên Dêrkê, dibêjê: Ku Hemîd, ji bo wan bikşînê aliyê xwe ve û bihevre bikin, çend caran xwe gihand wan, lê ew bi wî bawer ne dibûn, lewre pêre ne kirin.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



*Cigerxwîn*



*Derwêşê Mela Silêman*



*Nûredîn Zaza*



*Evdilayê Mela Elî*



*Ebdilezîzê Eliyê Ebdê*



*Ezîzê Dawê*



*Hemîdê Hecî Derwêş*



*Mecîdê Haco*



*Mela Ehmedê Namî*



*Mela Mihemed Neyo*



*Mihemed Mistefa*



*Mihemedê Faxrî*

Institut kurde de Paris



Osman Sebrî



Reşîdê Hemo



Mihemedê Mela Ehmed



Salah Bedredîn



Şêx Mihemed
Îsa Mela Mehmûd



Xalid Meşayix



Ebdilsemedê
Mela Xelîl

Institut kurde de Paris



***Zîndana Kelha Şamê, 1961.***

***Ji rast :** Ehmed Heman, Mihemedê Mela Ehmed, Kemal Cemîl Seydo*
*Osman Sebrî, Hesen Osman, Mecîd Haco, Reşîd Hemo*



***Zîndana Qamişlo, 1962.***

***Ji rast:** Ebdilmûtelib Mîro, Mihemed Mistefa, Mihemed Mela Ehmed,*
*Ebdilayê Mela Elî, Mihemedê Cemîlê Seydo, Diyabê Mîro,*
***yê rûnîştî:** Xalidê Mûşayix*

***Damezrevanên Partiya Demokrata Kurdistana Sûryê:***

1. Osman Sebrî
2. Hemîd Hecî Derwêş
3. Hemze Niwêran
4. Şêx Mihemed Îsa Mela Mehmûd
5. Reşîd Hemo
6. Mihemed Elî Xoce
7. Xelîl Mihemed
8. Şewket Heman

***Damerevanên Civata Yekîtiya Xortên Demokrat a Kurd***

1. Mihemedê Mela Ehmed
2. Ebdilezîzê Eliyê Ebdê
3. Derwêşê Mela Silêman
4. Samiyê Mela Ehmed Namî



Institut Kurde de Paris

***Damezrevanên Hizba Azadî***

1. Cîgerxwîn
2. Mihemed Fexrî

***Çend Berpirsiyarên Partî***

1. Dr. Nûredîn Zaza (Serokê Partî)
2. Xalid Meşayix
3. Mihemed Mistefa
4. Ebdilsemed Mela Xelîl
5. Ezîzê Dawê
6. Mecîdê Haco
7. Ebdilayê Mela Elî

***Damezrevanên Partiya Çep***

1. Mela Mihemed Neya
2. Salah Bedredîn

Institut kurde de Paris

*Ji nav çap û weşanên*

# EVRA VERLAG

**Roman**

1- ***Memê Zirav*** 12,- €
*(Yaşar Kemal, Werger Zeynel Abidîn)*
2- ***Sîmyager*** 8,- €
*(Paulo Coelho, Werger Zeynel Abidîn)*
3- ***Binefşên Tariyê*** (Çapa 2.) 8,- €
*(Zeynel Abidîn)*
4- ***Peyman -1 Girava Stêrkên Vemirî*** 8,- €
Çapa 2. *(Zeynel Abidîn)*

**Helbest**

1- ***Min ji bêriya te paywend kevin kirin*** 5,- €
Çapa 2. *(Ahmed Arif, Werger Zeynel Abidîn)*
2- ***Panzêr radibin ser me*** 5,- €
*(Enver Gökçe, Werger Zeynel Abidîn)*
3- ***Pîr Sûltan Evdal im Ez bi peyman im*** 5,- €
*(Pîr Sûltan Evdal, Werger Zeynel Abidîn)*
4- ***Dûr û bê qesem*** 5,- €
Çapa 2. *(Zeynel Abidîn)*
5- ***Destana Kerîm Elvanî*** 5,- €
*(Alî Koçak, Werger Zagros Baran)*
6- ***Gulbijêrek ji helbestên wergerî*** 5,- €
*(Nazim Hîkmet, Ahmed Arif, Orhan Kotan, Enver Gökçe, Sînan Sabrî, Necatî Siyahkan; Werger Zagros Baran)*

**Felsefe**

1. ***Xweparêziya Sokratesî-Platon*** 5,- €
*(Werger Zeynel Abidîn)*

Institut kurde de Paris

## *Çîrok*

1. ***Barova Befrê*** *(Zekî Silêvanî)* **7,- €**
2. ***Rexê din yê Xabûrî*** *(Zekî Silêvanî)* **7,- €**
3. ***Êsê û Bilodo*** *(Keça Kurd)* **4,- €**
4. ***Berxa mi*** *(Memê Koêkorta-Kirmanckî)* **4,- €**

## *Ziman*

1. ***Kurdiya Nûjen*** - *Çapa 2. (Çeto Özel)* 12,- €

## *Lêkolîn-Kurdî*

1- ***Dîroka Partî li Sûryê*** *(Mihemed Mela Ehmed)* 6,- €

## *Pirtûkên Almanî*

1. ***Der Aufstand des Scheich Bedreddin Mahmud Isra`i l-*** Band I 12,- €
   *Mesut Keskin*
2. ***Der Aufstand des Scheich Bedreddin Mahmud Isra`il*** - Band II 12,- €
   *Mesut Keskin*

## *Pirtûkên Tirkî*

1. ***Yüreğimin Susturulmuş Mabedi (Şiir)*** 5,- €
   (Zeynel Abidîn)
2. ***İnsan Doğanın Aç Onurudur (Deneme)*** 5,- €
   (Zeynel Abidîn)
3. ***Hüznün Maviye Akar (Roman)*** 2.Baskı 5,- €
   (Zeynel Abidîn)
4. ***MHP-Dış Örgüt – (İnceleme)*** *İsmet Siverekli* 8,- €
5. ***Esterin Çocukları*** (Kürdistanlı Yahudiler) – ***(İnceleme)*** *İsmet Siverekli* 8,- €
6. ***Sözlü Gelenekten Yazılı Dile Kürt Dili*** 3,- €
   Jemal Nebez

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

ISBN : 3-937716-21-1

KL